
CELAL TALEBANÎ

VEKIRINA
ÇEND RÛPELÊN DÎROKÊ



Hevpeyvîn
Xesan Şirbil

Wergêr û Edîtor
Emîr Hesen

Deng
Emîr Hesen
Melek Ehmed

Silêmanî
2025

Gotara Wergêr

Xwendevanên Hêja:

Berî xwendina vê pirtûkê ku ji hevpeyvîna rojnamevanekî ereb digel xwedê jê razî **“Celal Talebanî”** pêk tê, pêwîst e, ez bala we bikişînim ser çend mijaran ku dibe ji bo we cihê pirsê bin.

Di wergerandina vê pirtûkê ya ji soranî bo kurmancî de, tevî ku min hewl da tu nezelalî di naverokê de nemîne, lê ji ber parastina naver-oka sereke, di hûnandina hevokan de ez sînordar bûm.

Her wisa dibe ku di hinek cihan de, ev yek bala we bikişîne ku par-agraf bi hev re negirêdayî ye; sedema vê yekê pirtûka sereke ya erebî ye ku bi wî awayî hatiye amadekirin.

Li aliyekî din, ji ber hebûna hejmareke mezin a navên erebî û ji bo parastina awayê bilêvkirina wan, ez neçar bûm di nivîsîna wan de rêzikên rastnivîsa kurmancî berçav negrim û hinekan li gorî rêzikên gramera îngilîzî binivîsim, çimkî di astsa navdewletî de navên wan kesatiyan bi rênivîsa îngilîzî hatine nivîsandin û bi wî awayî jî tên naskirin.

Di nivîsîna navên erebî de, ji ber nebûna şûngira tîpa erebiya “**eyn =** ع” ê di kurmancî de, min li hinek cihan tîpa kurdî ya “**i**”yê û li hinek cihan jî “**dabir**” (**’**) bi kar aniye, da ku bi awayekî navînî ew kêmasî were çareserkirin, mînak:

Seidûn(سعدون), Beis (بعث), El-Mezre’e (المزرعه), Es’ed (ئەسعەد/ اسعد).

Ji bo ku şaşî di navbera “**heta**” ya kurdî û “**hetta** (**حتى**)” ya erebî de çênebe, ya erebî wek xwe bi tîpa dubare “tt”yê (he**tt**a) hatiye nivîsandin.

Her wisa ji bilî hejmarek kêm navên biyanî, min ên din li gorî rênivîsa kurmanciya latînî nivîsandine, ne bi rênivîsa tirkî, îngilîzî yan her zimanekî din ê latînî.

Hevalên hêja, bêguman tu berhemek bê kêmasî nabe; lewma ez ri-ca dikim eger her şaşî yan kêmasiyekê bala we kişand, an her pêşni-yarek we hebû, hûn bi rêya **e-maila** jêrîn dikarin ji min re bişînin.

emirmilan2016@gmail.com
Vekolê ziman û rojnamevan
Emîr Hesen (Amir Milan)
Cotmeha 2025’an

Naverok

- Şiroveya Pêwîst 05
- Pêşgotin 06
- Dosya Iraqê û Kurdan 10

Hevpeyvîn

Başa Yekem

- Hatina Beisiyan li ser desthilatê 12

Başa Duyem

- YNK û pirsên navxweyî û navdewletî 36

Başa Sêyem

- Çîroka peydakirina Mela Mistefa Barzanî 70

Başa Çarem

- Barzanî û Ebdul Kerîm Qasim, nakokiyên navxwe yên PDK'ê 96

Parvekirina Pirtûkê li Gorî Xelekên Dengî

Xelek	Rûpel	Xelek	Rûpel
Pêşgotin	05	Xeleka-7	70
Xeleka-1	12	Xeleka-8	79
Xeleka-2	20	Xeleka-9	86
Xeleka-3	29	Xeleka-10	99
Xeleka-4	38	Xeleka-11	109
Xeleka-5	48		
Xeleka-6	59		

Şiroveya Pêwîst

Destpêka karkirina li ser vê hevpeyvîna "**Mam Celal**", vedigere civînekê ku tê de Rêzdar Cîhangîr Dizeyî diyar kir: **"Sala 1998'an, rojnamevanê ereb ê navdar Xesan Şirbil hevpeyvîneke girîng bi Mam Celal re kiriye, ku di Kovara 'el-Weset' ê de bi rêya çar beşan û bi zimanê erebî hatiye weşandin."**

Min jê daxwaza şandinê kir. Piştî nirxandinê, derket ku naveroka hevpeyvînê girîng e, **ji ber ku Mam Celal gelek eşkere li ser çendîn qonaxên dîrokî yên Iraqê û "tevgera rizgariya neteweyî ya gelê Kurd" axivîbû.** Lewma me biryar da, naveroka hevpeyvînê wergerînin ser zimanê kurdî û piştre wê çap bikin.

Ji bo wergerandinê, me hevpeyvîn da **Şanaz Hîranî**, wê jî bi zimanekî zelal, hevpeyvîn wergerand ser **zaravê kurdî yê soranî**. Piştre Rêzdar Hesen Yasîn tê de pêdaçûn kir.

Ji bo zanistîkirinê, me ji pisporê dîroka hemdem **Rêzdar Prof. Dr. Ehmed Hemedemîn** xwest ku erka pêdaçûn û nivîsandina dîpnotan û pêşgotina pirtûkê bigire stûyê xwe. Di dawiyê de bû berhem. Em hêvî dikin ku me karîbe xizmetekê pêşkêş bikin.

Masûd Mela Hemze
1'ê Tîrmeha 2023'an
Hewlêr – Kurdistan

Pêşgotin

Celal Talebanî di jiyana xwe de gelekî bi rojnamevanan re peyîviye û eşkere bersiva wan daye. Yek ji wan, hevpeyvîna Talebanî û rojnamevanê lubnanî Xesan Şirbil e, ku di sala 1998'an de li Silêmaniyê hatiye kirin.

Naveroka hevpeyvînê ji **çar beşan** pêk tê, ku di hejmara 355'an a 16'ê Mijdarê, 356'an a 23'ê Mijdarê, 357'an a 30'ê Mijdarê û 358'an a 7'ê Kanûna 1998'an de, di kovara "**el-Weset**"ê de hatiye weşandin[1].

Xesan Şirbil, destpêkê bi kurtî behsa girîngiya dosyeya Iraqê û Kurdan, piştî "**Şerê Kendavê yê Duyemîn"** li deverê û cîhanê dike û balê dikişîne ser rol û kesatiya "**Celal Talebanî"**, ku çawa wek karakterekî diyar di bûyeran de, roleke berçav dîtiye. Bêguman ew rol sedema sereke ya wê hevpeyvînê bûye.

Çawa ku me pêştir jî got: Ew hevpeyvîn di çar beşan de hatiye weşandin. Di beşa yekem de, Celal Talebanî behsa haydarbûna xwe ji hatina Beisiyan a ser desthilatê di sala 1968'an de dike.

Paş hingê, li ser lihevhatina baskê Barzanî û baskê polîtburoyê piştî 11'ê Adara 1970'yan diaxive.

Di heman beşê de, Talebanî bersiva çend pirsan li ser têkiliyên Kurd û Îsraîlê di serdema Şoreşa Îlonê de dide, lê hevdem behsa

……

[1] Naveroka hevpeyvînê hevdem di **rojnameya** "**el-Heyat**" de hatiye weşandin, û Xesan Şirbil beşek ji hevpeyvînê **bi hevpeyvîneke din a bi Celal Talebanî re girê daye**, ku wî piştî **sala 2005'an** li Bexdayê pêk aniye û piştre di du cildên pirtûkekê de bi navê "**Ziyarat li curûh el-Iraq**" sala 2021'ê hatiye weşandin.

derketina Îdrîs Barzanî û Mesûd Barzanî di serokatiya Partiya Demokrat a Kurdistanê de jî dike.
Celal Talebanî behsa helwesta Yekîtiya Sovyetê ya li hember herifîna Şoreşa Îlonê ya 1975'an jî dike.

Li aliyekî din, balê dikişîne ser destpêka damezrandina Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistanê (YNK) û destpêbûna têkiliyên navbera YNK'ê û Serokê Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) Abdullah Ocalan.
Di wê çarçoveyê de, behsa hewlên xwe yên desteberkirina aştiyê di sala 1993'an de li Tirkiyeyê dike.

Di beşa duyem a hevpeyvînê de, Celal Talebanî, bersiva hejmareke pirsan dide ji wan; helwesta YNK'ê hember şerê Îran-Iraqê, danûstandinên YNK'ê û rejîma Beis di salên (1983-1985)'an de, şerê navxwe yê çiyan, têkiliyên derve yên YNK'ê bi taybetî digel Lîbyayê, lihevhatin û damezrandina "Eniya Kurdistanî" li sala 1987'an, kîmyabarana Helebceyê ya 16'ê Adara 1988'ê, dagirkirina Kuweytê li Tebaxa 1990'an ji aliyê Iraqê ve û agahdariya pêşwext a Talebanî, serhildana mezin a Başûrê Kurdistanê ya sala 1991'an û rola YNK'ê, danûstandinên 1991'an bi rejîmê re, hilbijartinên 1992'an û damezrandina Hikûmeta Herêma Kurdistanê, destpêkirina şerê navxwe û girtina Hewlêrê di 31'ê Tebaxa 1996'an de .

Di beşa sêyem de, Celal Talebanî behsa serdana xwe ya duyem a Yekîtiya Sovyetê ya sala 1957'an û hewlên xwe yên dîtina Mela Mistefa Barzanî û serdana xwe ya yekem bi wî re dike.

Paşê behsa têkiliyên xwe bi serkirde û kesatiyên navdar ên Sûriyeyê re dike. Li aliyekî din behsa rola Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK), nakokiyên wê yên navxwe û têkiliyên wê bi hêzên iraqî bi giştî û bi Partiya Komunîst a Iraqê re bi taybetî berî 14'ê Tîrmeha 1958'an dike.

Derbarê serdema piştî 14'ê Tîrmeha 1958'an, balê dikişîne ser helwest û hewldanên wan ji bo vegera Mela Mistefa Barzanî. Paş hingê li ser têkiliya di navbera Ebdul Kerîm Qasim û Mela Mistefa Barzanî û nakokiyên navxwe yên Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) diaxive.

Di beşa çarem û dawî ya hevpeyvînê de, Celal Talebanî behsa helwesta Mela Mistefa Barzanî û Şêx Ehmed Barzanî li ser destpêkirina **Şoreşa Îlonê** dike. Piştre li ser têkilîkirina Beisiyan û hewldanên wan ên ji bo darbeyê diaxive.

Her wisa balê dikişîne ser qonaxa piştî darbeya 8'ê Sibata 1963'yan û danûstandinên di navbera hikûmeta Iraqê û serokatiya Şoreşa Îlonê de. Ji bilî wê yekê, behsa serdana xwe ya Misrê, Cezayîr û hevdîtinên xwe yên bi Cemal Ebdul Nasir û Ehmed Bên Bêlla re dike.

Talebanî di wê beşê de behsa têkiliyên xwe bi Sovyetê re dike, eşkere dibêje, wî li ser gavên xwe bi Sovyetiyan re şêwiriye.

Rawestgeha dawî ya Celal Talebanî, di vê beşê de nakokiyên navxwe yên di navbera Mela Mistefa Barzanî û Polîtburoya Partiya Demokrat a Kurdistanê di sala 1964'an de ye, ku ji ber wê yekê baskê polîtburoyê neçar dibe berê xwe bide Îranê.

Di wê çarçoveyê de, Celal Talebanî behsa helwesta xwe di bûyeran de dike. Piştre balê dikişîne ser çawaniya vegera baskê polîtburoyê, şaşiyên wan ên lihevhatina bi Barzanî re û sedemên vegera wan a bajaran di sala 1966'an de.

Her çend di naveroka hevpeyvînê de, bi dû hev behsa bûyerên dîrokî nehatine kirin, lê dîsa jî xwedî girîngiya xwe ya dîrokî ne. Çimkî heta wê demê, ango sala 1998'an, hevpeyvîneke Celal Talebanî bi wî rengî nehatibû kirin, ku eşkere li ser bûyeran axivî be.

Ji ber girîngiya dîrokî ya naveroka hevpeyvînê, piştî nirxandinê û piştrastbûna ji awayê wergêranê, me biryar da li ser bingeha çavkaniyan û hevpeyvînên din ên Celal Talebanî, ji wan cihan re ku pêwîstî bi zelalkirin û rastvekirinê hebin, dîpnotan daynin.

Prof. Dr. Ehmed Hemedemîn
25'ê Hezîrana 2023'an

Dosya Iraqê û Kurdan

Piştî bidawîbûna **Şerê Kendavê yê Duyemîn** di sala 1991'an de, Kurdistana Iraqê ket derveyî desthilata hikûmeta Bexdayê. **Hilbijartin hatin lidarxistin û sazî li Kurdistanê hatin avakirin.**

Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) bi serokatiya Mesûd Barzanî û Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistanê (YNK) bi serokatiya Celal Talebanî bi hev re beşdarî hikûmetê bûn.

Lê di sala 1994'an de şerekî giran di navbera her du aliyên hikûmetê de dest pê kir û nêzîkî sê hezar kes bûn qurbanî ku dûr nebû ji mudaxileyên Bexda, Tehran û Enqereyê .

Di meha Îlonê de, Talebanî û Barzanî di bin çavdêriya Amerîkayê de ji bo pêkanîna parlamentoyeke herêmî li bakurê Iraqê, **li ser lidarxistina hilbijartinan di sala bê de, li hev kirin**[2].

Her du aliyan, piştrastî dan Tirkiyeyê ku naxwazin dewleteke serbixwe ya kurdî ava bikin.

Paş çend rojan, dîsa dosya Iraqê ket rojevê, piştî ku Bexdayê derî bi ser tîma vekolên navdewletî de girt. Washingtonê ji bo lêdaneke leşkerî, hêzên xwe yên leşkerî xist rewşa awarte. Lewma pirsa ast û bandora wê lêdanê li ser deverê û encamên wê li ser hêza leşkerî ya Iraqê, dubare ket ber şirove û nirxandinan. **Gelo Iraq dikeve nav kabûsê? Gelo serhildaneke din li başûr çê bibe? Tirkiyeyê çi bike? Helwesta Îranê çawa dibe?**

……

[2] Mebest **Peymana Washingtonê** ye, ku di **17'ê Îlona 1998'an** de ji aliyê **Celal Talebanî** û **Mesûd Barzanî** ve hat îmzekirin.

Li hember guhertineke wiha, dever dikare li ber xwe bide? Ev yek dê çawa bandorê li hevsengiya hêzê yan guhertina nexşeya siyasî ya deverê bike?

Di çarçoveya dosya Kurd û Iraqê de, roleke Celal Talebanî ya girîng hebûye.

Cihê baweriya Mela Mistefa Barzanî bûye, wan bi hev re şerê rejîmên Iraqê kirine, paşê cuda bûye.

Talebanî carna şerê rejîma Beisî kiriye û carna jî pê re danûstandin kiriye, her tim kesekî çeleng û diyar di asta erebî û deverê de bûye.

Di çarçoveya şopandina her du dosyan de, Kovara "**el-Weset**"ê serdana Celal Talebanî kiriye, ku tê de vegera Beisiyan ji bo desthilatê, ezmûna tevgera Kurd bi Sedam Hisên û têkiliyên wê bi Îran, Sûriye û Lîbyayê re hatine gengeşekirin.

Derbarê Mela Mistefa Barzanî, Mesûd Barzanî, têkiliyên Celal Talebanî, digel Rêberê Partiya Karkerên Kurdistanê Abdullah Ocalan, kîmyabarana Helebceyê, serhildana Kurdistanê û gelek mijarên din, pirs ji Talebanî hatine kirin.

Di bersivan de, Talebanî hejmarek mijarên nepenî eşkere kirine û bal kişandiye ser nepeniyên wan her du dosya yên aloz. Kovara "el-Weset"ê jî bi dû hev, ew hevpeyvîn weşandiye.

Beşa Yekem

Hatina Beisiyan li Ser Desthilatê

Pêşgotin

Di vê beşê de, Celal Talebanî behsa haydarbûna xwe ji hatina Beisiyan a ser desthilatdariyê di sala 1968'an de dike. Paş hingê li ser lihevhatina baskê Barzanî û baskê polîtburoyê, piştî 11'ê Adara 1970'yan diaxive. Talebanî tevî ku bersiva pirsên derbarê têkiliyên Kurd û Îsraîlê di dema Şoreşa Îlonê de dide, balê jî dikişîne ser helwesta Yekîtiya Sovyetê ya li hember hilweşîna Şoreşa Îlonê di 1975'an de.

Li aliyekî din, behsa destpêka damezrandina Yekîtiya Nişimanî ya Kurdistanê (YNK) û destpêbûna têkiliyên wan digel Serokê Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) Abdullah Ocalan dike. Di wê çarçoveyê de, li ser hewlên xwe yên desteberkirina aştiyê di sala 1993'an de li Tirkiyeyê diaxive.

Celal Talebanî balê dikşîne ser axaftina **Turgut Ozal**, **Dr. Erdal Înono** û **Suleyman Demîrêl** û dibêje: **"Ez vê ji dîrokê re dibêjim"** wan gotin: **"Em danûstandinê bi terorîstan re nakin, lê pêşwaziya vê pêngava pozîtîf dikin."**

Talebanî dibêje: "**Min ji Ocalan xwest bi daxuyaniyekê kiryara girtin û kuştina 33 leşkeran protesto bike, sûçdar jî radestî dadgehê bike, lê Ocalan red kir, di dawiyê de li ser wê yekê têkiliyên me qut bûn."**

Naveroka
Beşa Yekem a Hevpeyvînê

❖ Sala 1968’an Beis vegeriya desthilatê, gelo te Sedam Hisên nas dikir?

Belê, têkiliya min bi Beisiyan re vedigere nifşa wan a yekem, ji wan Elî Salih Seidî, Hanî Fekîkî, Hazim Cewad û Fuad Rikabî. Ew li zanîngehê bal min bûn. Sedam Hisên wê demê kesatiyekî naskirî nebû.

Cara yekem min ew di sala 1967’an de, li Bexdayê li mala Ehmed Hesen Bekir dît. Ji axaftina Hazim Cewad min zanî ku ew (Sedam) kesatiyekî xurt e di nav Partiya Beis de[3].

Berî hatina rejîma Beis, me bi Şehîd Ebdul Xalîq Samerayî û Abdulîla Selûm Samerayî re têkilî danîbûn. Piştî 1963’yan, Partiya Beis bû du baskan, baskê rastgir û baskê efleqî.

……

[3] Derbarê koka **Partiya Beis a Erebî ya Sosyalîst**, nêrînên cuda hene. Hinek ji wan ve-digerin sedsala 20’an û wekî berdewamiya “**Koma Xebatê ya Neteweyî**” dizanin, ku di **sala 1933’yan** de, li Lubnanê hatiye damezrandin.
Hinekên din damezrandina Partiya Beis vedigerînin destpêka salên 1940’yan, dema ku yekem daxuyanî bi navê “**Tevgera Vejîn a Erebî**” weşand. Hinek jî di vê baweriyê de ne, ku **Zekî Ersûzî** damezrênerê wê bûye, hinekên din jî dibêjin; Mîşêl Efleq bûye.
Partiya Beis ji destpêkê ve ji du baskan pêk dihat, lê piştî îstifaya Zekî Ersûzî di sala **1944’an** de, her du baskên wê bi serokatiya **Mîşêl Efleq** bûne yek.
Partiya Beis 4-6’ê Nîsana **1947’an** kongreya xwe ya yekem li dar xist û Mîşêl Efleq wekî sekreterê giştî yê partiyê hat hilbijartin.
Di sala **1953’yan** de, bi “Partiya Sosyalîst a Erebî” bi serokatiya Ekrem Horanî re bûne yek, navê wê bû “**Partiya Beis a Erebî ya Sosyalîst**”.

Hinek ji wan, wek Elî Salih Seidî, Hemîd Xelxal û çendîn kesên din, nûnertiya rastgiran li Sûriyeyê dikirin.

Beşê duyem careke din, di sala 1966'an de, piştî "Tevgera Serrastkirinê" bû du beşan[4]**.** Nûredîn Etasî û Yûsif Zueyîn li Sûriyeyê bûn du baskan.

Di wê cudabûnê de, gelek ji wan çûn Sûriyeyê, lê hejmareke biçûk di bin serokatiya **Ehmed Hesen Bekir, Sedam Hisên, Ebdul Xalîq Samerayî û Salih Mehdî Emaş** de man, ku partiyeke biçûk bû û kesî girîngî nedidayê, bi awayekî ku ji bo Kongreya Sosyalîstên Ereb nehatin vexwendin, ku sala 1967'an li Cezayîrê hat lidarxistin.

Ya rast, ji bilî me kesî bi wan partiyên biçûk ên Iraqê re serederî nedikir, lê em di vê baweriyê de bûn, ku divê eniya nîştimanî her kesî di nav xwe de bigire.

Di sala 1968'an de, Ehmed Hesen Bekir ji min re got:

"Beisî plana darbeyekê dikin û hewl dan, min razî bikin, ku ez û Ezîz Mihemed û kesatiyên Komunîst tê de beşdar bibin û em alîkariya wan bikin."

Piştre min, ew daxwaza Ehmed Hesen Bekir gihande Ezîz Mihemed.

……

[4] Di nîvê salên **1960'yan** de, **nakokî ket nav Partiya Beis a Erebî ya Sosyalîst**. Di encama darbeya Sibata **1966'an** a baskê ciwanan de, ku tê de leşker serdest bûn, karîn li Sûriyeyê desthilatê bixin destê xwe.

Her çend nakokî demekê hat tepeserkirin, lê **di 11'ê Mijdara 1970'yan de**, Wezîrê Berevaniyê **Hafiz Esed**, bi alîkariya Serfermandarê Artêşê **Mistefa Telas**, desthilat bi dest xist û Hesen Xetîb ji bo demekê wek serok hat danîn.

Ew pêngav bi navê "**Serrastkirinê**" hat binavkirin, ku paşê him rê li ber hatina Hafiz Esed ser desthilatê vekir û him jî dawî bi darbe û nakokiyên navxwe yên Partiya Beis a Sûriyeyê anî.

❖ Ezîz Mihemed gotiye el-Wesetê Beisiyan jê xwestine, di darbeyê de alîkariya wan bike?

Ew rast e, wan bi rêya yên din hewl dabûn, lê ez yekem kes bûm ku ji min xwestin jê re bêjim. Rêzdar Ezîz Mihemed[5] ji min re got:

“Hîn xwîna hevkarên me hişk nebûye, çawa alîkariyê ji me dixwazin?” Ezîz Mihemed got:

“Em ê li bendê bin û siyaseta wan bibînin, paşê em ê biryarê bidin.”

Hejmarek ji wan efseran yên ku plana darbeyekê dikirin, yên wekî Ebdul Rezaq Nayîf, Îbrahîm Dawûd û Beşîr Talîb, bi Ebdul Setar[6] re têkilî danîbûn, ku pêştir têkiliya wî bi me re hebû û di mala wî de, me hevdu dîtibû.

Ji bilî min û Ebdul Setar, Fuad Rikabî û Ebdul Rezaq Nayîf jî amade bûn. Wan ji Şehîd Fuad Rikabî xwest tevlî tevgera sosyalîst bibe û pêşniyar kirin, ku piştre bibe serokwezîr, lê wî qebûl nekir.

Piştre wan projeya xwe pêşkêşî hinek Beisiyan kirin. Di wê navberê de, Beşîr Talîb, ku wê demê ataşeyekî leşkerî li balyozxaneya Iraqê ya li Beyrûtê bû, di wê barê de bi hevpîşeyên xwe yên Îranî û Brîtanî re hevdîtin kiribû.

……

[5] Ezîz Mihemed di hevpeyvîna xwe de destnîşan dike, ku di meha Hezîranê de Ehmed Hesen Bekir bi rêya Mukerm Talebanî ji wan re gotiye, **xwe ji bo dest bi ser de girtina desthilatê amade bikin.**

Ji ber wê yekê, wan ji Partiya Komunîst a Iraqê alîkarî xwestine, **lê Partiya Komunîst ji ber zêdebûna nakokiyên berê û parçebûna partiyê di sala 1967’an de, nekarî wê alîkariyê** qebûl bike, lewma bersiva wan nedaye.

[6] Mebest ji Ebdul Setar Ebdul Letîf e, ku ji 10’ê Gulana 1967’an heta 19’ê Tîrmeha 1967’an wezîrê navxwe bûye.

Wan biryar da, tevlî koma Ebdul Rezaq Nayîf û Îbrahîm Dawûd bibin, da ku li Iraqê darbeyekê bikin.

Ji ber vê yekê, me nexwest bi wê komê re serederiyê bikin. Ez çûm cem Ebdul Rehman Arif û min gotê: "Çi qewimiye!"

Wî jî got: **"Hevalên te yên nasirî ew gotine te?!"**

Min jî bersiv da û got: **"Cenabê serok, agahiyên min bi xwe ne."**

Ebdul Rehman Arif got: **"Min gazî Fermandarê Parêzvanên Komarê, Îbrahîm Dawûd, Fermandarê Tabûra Zirêhdaran Seidûn Xeydan û Cîgirê Serokê Îstixbarata Leşkerî Ebdul Rezaq Nayîf kir û wan sond xwarin ku li dijî min komployê nakin."**

Di 17'ê Tîrmeha 1968'an de, darbeya leşkerî hat kirin. Roja 21'ê mehê ez li cadeya Cumhûrî digel Îbrahîm Ehmed û Omer Mistefa di rê de bûm. Otomobîlek li pey me bû, dema min lê nihêrî, Sedam Hisên bû, em sekinîn.

Min ew bi hevalan da naskirin û min jê pirsî: Diçî ku derê? Wî bersiv da û got: **"Ez diçim bal duxtor."**

Me jê pirsî çima? Got: **"Ji roja ku me alîkariya wê koma sîxur û gumanbaran kiriye, ez nikarim razêm û bifikirim ka dê çi biqewime? Eger ew bikarin me ji desthilatê derxînin. Wê demê navê me dê çawa bikeve nav dîrokê."**

Min gotê: **Yanî nakok in?**

Wî bersiv da:**"Na, bi Xwedê, her yek li dijî yê din komployê dike, lê Xwedê mezin e."**

Roja paştir em bi serokwezîrê nû, Ebdul Rezaq Nayîf re civiyan, li dijî Beisiyan axivî û got: **“Ehmed Hesen Bekir, Salih Mehdî Emmaş û Herdan Tikrîtî sond xwarine ne Beisî ne û wekî kes beşdar bûne.”**

Wê demê me û Tevgera Sosyalîstiya Erebî û Beisiyên Sûriyeyê dixwest rejîmê biguherin. Me têkilî bi Lîwa Kolonel Mihemed Elî Sîbahî efserî îstixbarata firqeya pêncan danî, ku baregeha wê li Silêmaniyê bû. Her wisa Ednan Ehmed Ebdul Celîl li Kerkûkê, ku ew jî efserekî navdar ê Firqeya duyan bû.

Ez hatim erkdarkirin ku bi wan re biaxivim û ji wan bixwazim da ku beşdar bibin. Wî ji min re got:

“Birayê Celal, ez di rêxistinê de beşdar im û divê bi Arif Ebdul Rezaq re biaxivim, paşê bersiva te bidim.”

Di 30’ê Tîrmehê de, duyemîn darbeya Beisiyan pêk hat. Wan Îbrahîm Dawûd şandin serî li yekîneyên leşkerî li Urdinê bide. Ebdul Rezaq Nayîf jî vexwendin, da ku Ehmed Hesen Bekir wî bibîne, lê wan çek jê standin û piştre şandin derveyî welêt.

Ehmed Hesen Bekir ji mala Îbrahîm Ehmed bi min re têkilî danî û ji me xwest, di hikûmetê de beşdar bibin.

Min bersiv da: “**Sipas dikim bavê Heysem, lê biryareke kongreya me heye, rê nade em di hikûmetek hevpeyman[7] de beşdar bibin.”**

Wî got: **“Mela Mistefa Barzanî navê du kesan wek wezîr ji bo tevlîbûna me destnîşan kiriye.”**

……

[7] Li gorî wê yekê ku di “Hevpeyvîna Temen” de hatiye, baskê polîtburoyê di **kongreya Kelarê** de biryar dabû, di hikûmeta hevpeymaniyê de b eşdar nebin.

Piştre bi Îbrahîm Ehmed re axivî û lêbihurîn xwest û got:
“Nabe du partî bi hev re beşdar bibin û du hevkarên me hene.”

Wî navên Teha Mihêyedîn û Fewzî Sayîbî[8] pêşniyar kir. Yê yekem hat qebûlkirin û yê duyem hat redkirin, ji ber ku kêfa Ehmed Hesen Bekir jê re nedihat.

Ya rast, wekî ku Hemad Şehab ji min re got; ez wek wezîrê reformên çandiniyê û Omer Mistefa jî wek wezîrê dadê hatibûn danîn.

Tevî ku di qonaxa yekem de hikûmetê hinek karên baş kirin, wekî mînak rê dan, em rojnameya **el-Nûr**[9] biweşînin, girtiyên siyasî azad kirin û bi Partiya Komunîst a Iraqê re dest bi danûstandinan kirin, ji bo çareserkirina pirsa Kurd li ser bingeha xweseriyê gav avêtin û dest bi têkiliyan bi Yekîtiya Sovyetê re kirin.

Li ser du mijaran, nakokî di navbera me û wan de hebû: **Yek iraqî û ya din jî erebî bû.**
Di mijara Iraqê de, em rijdbûn li ser vê yekê, ku divê Kerkûk bikev nav herêma kurdî.
Di mijara erebî de jî, li ser helwesta me ya serdema şerê xwînîn bû, li hember Ebdul Nasir, ku di rojnameya el-Nûr de hat weşandin[10]**.**

……

[8] Behsa Fewzî Cemîl Sayîb dike, ku di serdema Ebdul Kerîm Qasim de **parêzgarê Nasiriyê** bûye.
[9] Rojnameya **el-Nûr** wek yekem rojnameya siyasiya rojane **li Bexdayê di 12’ê Cotmeha 1968’an de dest bi weşandinê kir**, ku heta 29’ê Adara 1970’yan berdewam bû.
432 hejmarên rojnameyê hatin weşandin ku xwedan îmtiyazê wê Hîlmî Elî Şerîf û sernivîskarê wê jî Omer Mistefa bû.
[10] Rojnameya **el-Nûr** ji destpêkê ve li ser bûyerên Misrê û hewldanên Îsraîl û Amerîkayê ji bo dagirkirina deverê, bi weşandina babetan helwesta xwe diyar kiribû.

Bi taybetî piştî pejirandina pêşniyara Rogers[11] ew yek mîna xiyanet hat wesifkirin.

Li ser wê bingehê, em ji danûstandinên xweseriyê hatin derxistin, ku di encama Peymana 11'ê Adara 1970'yan a di navbera wan û Barzanî de ketibû rojevê. Piştî girtina rojnameya el-Nûr, ji me xwestin da ku em bibin balyoz, lê me red kir.

❖ Kengê bi Mela Mistefa re li hev hatî û bûyî nûner li Beyrûtê?

Heyamekê paş Peymana 11'ê Adarê, zilamekî bi navê Faxîr Mêrgesorî[12] li Bexdayê gazî min kir û got:

"Silava Barzanî ji te re heye û dizane ku tu kesatiyekî neteweyî yî û divê tu amade bî û netirsî."

Min jî got: **"Ez ê bi hevalên xwe re bişêwirim û bersiva te bidim."**

Ew pêşniyareke baş bû ji aliyê Barzanî ve, piştre ez çûm Gelaleyê da ku pê re hevdîtinê bikim.

Di rê de ez rastî tîma nûnertiya hikûmeta Iraqê hatim, ku di nav wan de, Seidûn Xeydan, Murteza Hedîsî û Ebdulîla Selûm Samerayî hebûn, ku ji baregeha Mela Mistefa Barzanî vedigeriyan.

Barzanî pêşwaziya min kir û em tenê rûniştin. Wî dest bi êrişê li ser me kir û gelek nîqaş çêbûn.

……

[11] Çileya **1969'an** Wezîrê Derve yê Amerîkayê **William Rogers pêşniyara agirbesteke** demkî di navbera Misr û Îsraîlê de kir, lê Cemal Ebdul Nasir bersiv neda û piştre Îsraîlê jî red kir. Di 19'ê Hezîrana **1970'yan** de, Rogers carek din pêşniyara xwe di çarçoveya biryara 242'an a **Konseya Ewlekarya Navdewletî** de pêşkêş kir û daxwaz kir **90 rojan** şer bê rawestandin. Vê carê, Abdul Nasir razî bû, lê Îsraîl pêbend nebû.

[12] Her Barzanî bi xwe paşê di girtîgehê de ew ji nav bir, ku ji eşîra Barzan û komunîst bû, gelekê jî cihê baweriya Barzanî bû.

Min berpirsyariya pirsgirêkan xist stûyê wî û jê re got: “**Em ê navê partiya xwe biguherin û tevlî te xebatê bikin.”**

Lê wî qebûl nekir. Wî dixwest, her du partî wekî berê bibin yek. Barzanî berpirsyariya bûyeran xiste stûyê min û ji min xwest, yên din razî bikim da ku vegerin. Wî soz da di nav salekê de konferansek bê sazkirin û got: **“Hûn ê vegerin ser erkên xwe yên berê.”**

Min got: **“Ev ne karê min tenê ye. Divê ez bi yên din re şêwirê bikim.”** Wî bersiv da û got: **“Ez ji bo razîkirina wan, xwe dispêrime te”.**

Ez vegeriyam û me civîneke partiyê li dar xist. Piranî alîgirê yekbûn û guhertina navê partiyê ji bo “**Partiya Şoreşger a Kurdistanê**” bûn[13].

Piştî gengeşeyan, me li hev kir, ku nûnertiya me di tevahiya komîteyan de, divê ji %40 heta ji %60 be û ev rêje ji bo rêxistinên pîşeyî jî were bicihkirin. Daxuyaniya yekbûnê hate weşandin û em vegeriyan cem Mela Mistefa Barzanî[14].

Salek derbas bû, tiştek neguherî. Em çûne cem Mela Mistefa Barzanî, lê bi vê hincetê ku rewş xirab e, em rawestandin. Me sebir kir û şeş mehên din jî derbas bûn. Wê demê min nûçeya hatina Serokê Amerîkayê Richard Nixon ji bo Tehranê bihîst.

……

[13] Di sala **1971’an** de, **baskê polîtburoyê** di kongreya xwe ya heftemîn de, navê xwe diguhere “**Partiya Şoreşger a Kurdistanê**” piştre biryara hilweşandina xwe dide û tevlî Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) dibe.Hejmarek ji kadro û endamên wan bi wê biryarê razî nabin û di **Mijdara 1973’yan** de, di bin serokatiya **Ebdul Star Tahîr Şerîf** de, kongreyekê li dar dixin û di bin navê Partiya Şoreşger a Kurdistanê de, dest bi têkoşîna xwe ya siyasî dikin.

[14] Baskê polîtburoyê di bin navê Partiya Şoreşger a Kurdistanê de, li **2’ê Sibata 1971’an** bi baskê Barzanî re **bû yek.**

Paşê eşkere bû ku hevdîtinek çêbûye û têkiliyên bi Îranê re ji nû ve hatine destpêkirin.

Min betlaneyek stand û çûm Beyrûtê, piştre ji bo temamkirina xwendina xwe çûm Fransayê, lê dubare vegeriyam Beyrûtê û bi Eniya Neteweyî ya Rizgariya Filistînê re xebitîm, heta pêş destpêkirina şerê 1974'an ê di navbera rejîma Beis û Barzanî de, li wê derê bûm.

Min hewl da ku dubare şer dest pê neke, bi wê meremê çûm cem **Kemal Junblat** da ku navbeynkariyê bike, lê tevî wê yekê şer dest pê kir.

❖ Çîroka hevkariya malbata Barzanî bi Îsraîlê re çi ye û jê haydar bûn?

Ya rast, derbarê têkiliya di navbera Mistefa Barzanî û Îsraîlê de bi hûrî tu agahiyên min nîne. Di sala 1963'yan de, pêşniyara hevdîtina bi Şîmon Peres re ji min re hat kirin, lê piştî hevşêwirînê bi Sovyetiyan re, min lêbihurîn xwest[15].

Di salên 1970'yan de çend gotar ji aliyê Rêxistina Rizgariya Filistînê ve, ji zarê rojnameyên îsraîlî, derbarê wê mijarê hatin weşandin.

Pêştir jî çend gotar ji aliyê belavoka "**Eswar Îsraîl**" di sala 1969'an de hatibûn weşandin. Cara dawî jî di pirtûka "**Boldan el- Cewar**" de behsa wê mijarê hat kirin.

……

[15] Di hevpeyvîna bi **Îrfan Qaneî Ferd** re, her wisa di Hevpeyvîna Temen de, bi **Selah Reşîd** re, Celal Talebanî tekez kiriye, Kamran Bedir-Xan pêşniyara hevdîtinê bi Cîgirê Wezîrê Berevaniya Îsraîlê yê wê demê **Şîmon Peres**, ji wî re kiriye, lê piştî hevşêwirînê bi Sovyetiyan re, ew hevdîtin red kiriye.

Tevî hevpeyvînek Dr. Mehmûd Osman bi Kovara “**el-Wesetê**” re, ku tê de behsa têkiliya navbera Barzanî û Îsraîl dikir[16].
Tenê me dibihîst, lê haya me ji wan hûrgiliyan nebû ku piştre hatin weşandin.

❖ Yanî hûn haj pê nebûn?

Belê, em haj pê nebûn.

❖ Ecêb e Celal Talebanî nezane Îsraîl hevkarî yan pisporên xwe pêşkêş kiribin?

Ez wek Celal Talebanî bi guman bûm ji wan cure mijaran, lê me tenê dibhîst û belgeyên me nebûn.

❖ Li ser wê mijarê we tu tiştek ji Mistefa Barzanî nepirsî?

Dema em bi Mela Mistefa Barzanî re bûn, behsa wan têkiliyan nedihat kirin, eger em bala xwe bidin dîroka têkiliyan, diyar dibe ku piştî cudabûna me yanî piştî sala 1964’an ew agahî belav bûne.

❖ Bi nêrîna te têkiliyên wiha di navbera Mela Mistefa û Îsraîlê de şaşiyeke mezin e?

Ya rast xeta karkirina min diyar e, ku xeta hevkariya Ereb-Kurd e. Her wisa ez alîgirê hevpeymaniya Abdul Nasir bûm. Di vê baweriyê de me, hebûna her hevkariyekê di navbera Kurdan û Îsraîlê de şaşiyek mezin e.

……

[16] Fayîq Şêx Elî ew hevpeyvîn bi **Dr. Mehmûd Osman** re kiriye ku di hejmarên 298 û 299’an yên Kovara el-Wesetê de û di rojên 13 û 20’ê Cotmeha 1997’an de hatiye weşandin.

❖ Niha çi cure hevkariyek heye?

Bawer nakim ku hebe, her wisa bawer nakim birayê Rêzdar Mesûd Barzanî jî, têkiliyek wî bi wî rengî hebe.

❖ Yanî têkiliya Mesûd Barzanî bi Îsraîlê re nîne?

Li gor agahiyên min têkilî bi Îsraîlê re nemaye, çimkî ew têkilî ya serdema bavê wî bûye, ku Kekê Mesûd jê berpirsyar nîne.

❖ Kengê Mela Mistefa neçar bû, baweriyê li her du kurên xwe yên xort (Îdrîs û Mesûd) bîne?

Ji sala 1965'an ve di hevdîtin û poste şandinan de, kar dispart wan, lê heta sala 1970'yan endamên partiyê nebûn, heta wê demê ku Rêzdar Elî Şerîf, wek hevalekî Mela Mistefa pêşniyara endamtiya wan kir.

Ew yek, ji bo çareserkirina pirsgirêka du alî ya serokatiyê, di nav Şoreşa Kurd de bû, ku di navbera polîtburoyê û Ofîsa Barzanî de hebû.Li ser wê bingehê, biryareke cuda ji bo pejirandin û hilbijartina wan ji bo komîteya navendî û polîtburoyê hat dayîn.

❖ Tu tiştekî diyar derbarê kuştina kurên Barzanî heye?

Sê kurên Barzanî, ji wan **Ubeydullah** ku wezîrê dewletê bû, **Loqman** û **Sabîr**

ê birayê wan yê biçûk, ji dayikekê bûn. Piştî ku di navbera wî û bavê wî de, nakokî derket Ubeydullah sala 1971'an çû navçeya Barzan û piştre çû Bexdayê.

Destpêkê li balyozxaneya Iraqê li Cezayîrê kar kir, lê dema ku nakokî navbera Barzanî û hikûmeta Iraqê de derket di sala 1974'an de hat

vegerandin û bû wezîrê dewletê. Ubeydullah gelek eşkere bavê xwe gumanbar dikir û digot: **“Têkiliyên wî bi Îsraîl û Amerîkayê re heye.”**

Hejmarek zaf ji Barzaniyan nexwestin digel Barzanî bimînin. Wê demê hejmarek zaf ji wan bi serokatiya Şêx Osman û Şêx Xorşîd ku wek şûngirê Şêx Ehmed dihatin zanîn, çûn bal hikûmeta Iraqê[17].
Hikûmetê bi hezaran malbatên Barzanî li navçeya Qûştepeya nêzîkî Hewlêrê bi cih kirin, ku di bin kontrola Hêzên Berevaniya Neteweyî de bûn û çekên hikûmetê hilgirtibûn.

Hikûmeta Îranê jî li sala 1982’yan bi alîkariya beşek ji Barzaniyan êrişî navçeya Hacî Omeranê[18] kir. Di demekê de ku Mesûd Barzanî û Îdrîs Barzanî bi hikûmeta Iraqê re di danûstandinê de bûn û pêşveçûn jî hebû, lê ji ber wan gumanan hat rawestandin[19].

Sedam Hisên tore bû û fermana girtina Barzaniyên xwe verşartî da. Piştî wê yekê tu agahî li ser wan belav nebû, lê paş heyamekê eşkere bû ku piraniyan wan hatine kuştin. Min li sal 1983’yan dema civîna bi Îzet Dûrî re behsa wê mijarê kir, lê wî bi vê hincetê ku ew Barzanî ne, bersiva min neda.

……

[17] Şêx Xorşîd, kurê Xorşîdê xwarziyê Şêx Ehmed bû.

[18] Ew êrişa Îranê di **22’ê Tîrmeha 1983’yan** de pêk hat ne 1982’yan. Her wisa Mesûd Barzanî red dike, bi wî awayî ku hikûmeta Iraqê dibêje, wan di wê êrişê de beşdarî kiribin. Bi gotina Barzanî, tometa beşdariya PDK’ê di wê êrişê de, **Bexdayê wekî hincetekê bi kar aniye da ku Barzaniyan ji nav bibe.**

[19] Îzet Silêman Begê Dergeleyî, wek navbeynkarê destpêkirina danûstandinên navbera rejîma Beis û PDK’ê, di bîranînên xwe de, dibêje: “Danûstandinê di **1’ê Gulana 1982’yan** de dest pê kir û di **1’ê Tebaxa 1982’yan** de, di navbera Mesûd Barzanî û nûnerên hikûmetê de civîn hatin lidarxistin, lê ji ber êrişa Hacî Omeranê dawî bi danûstandinan hat”.

Paşê derket ku Ubeydullah bi gumana têkiliya bi Amerîkayê re hatiye kuştin[20].

Bi gotina xwedê jê razî Fazîl Berak, ku wê demê berpirsê îstixbarata Iraqê bû, xwedêgiravî sala 1979'an Ubeydullah serdana Konsulxaneya Amerîkayê kiriye da ku pişka xwe ji mîrata bavê xwe werbigre.

Sedemek din jî danîna Muqedemê Rukn Erşed Zêbarî bû, di postekê de, ew jî bû sedem ku Ubeydullah heqaretê li wî bike. Ew heqaretkirin jî hatibû qeydkirin û cara dawiyê, wan gotinan serê wî xwar.

Piştî windabûna Ubeydullah, nêzîkî şeş hezar[21] Barzaniyên navçeya **Quştepeyê** hatin bê ser û beratekirin.

Sedam jî bi gotina "**çûn dojexê**" dawî bi wê mijarê anî û careke din kes ji wan nehatin dîtin.

❖ Fazîl Berak îtiraf li kuştina Ubeydullah Barzanî kiriye?

Piştî ku ez gelekî rijd bûm li ser sedema windabûnê, wê demê ku min Fazîl Berak li Rêveberiya Giştî ya Îstixbarata Iraqê dît û derbarê

……

[20] Derbarê sedema hatin kuştina **Ubeydullah** Barzanî, **Mihemed Pêncwênî** di bîranînên xwe de dibêje: "Di yek ji civînên Meclisa Neteweyî de li Bexdayê, Sedam Hisên êrişî Şoreşa Kurd û serkirdatiya wê dike û wan tometbar dike ku dest xistine nav destê biyaniyan wek Amerîka û Îsraîlê. Di axaftina xwe de **êrişî Mela Mistefa Barzanî** dike. Ji ber wê yekê Ubeydullah Barzanî, ku beşdarî civînê bûye, **radibe û bersiva Sedam Hisên dide** û parêzvaniyê ji Mela Mistefa dike".

Bi gotina Mihemed Pêncwênî, piştî civînê Ubeydullah yekser hatiye revandin û **bê ser û beratekirin.**

Li aliyekî din, Sîrwan Barzanî di hevpeyvînekê de balê dikşîne ser vê yekê, Ubeydullah Barzanî di **yekem îniya piştî destpêkirina şerê Îran-Iraqê**, di mala xwe de hatiye girtin.

[21] Tevî ku derbarê hejmara Barzaniyên bê ser û beratekirî serjimêriyek fermî di ber dest de nîne, lê hejmareke zaf ji çavkaniyan behsa heşt hezar kesan dikin.

çarenivîsa Ubeydullah ji pirsî, ez birim baxçeyê pişt avahiyê û got: **“Ji ber wan du sedeman ew ji nav birine.”**

❖ Piştî serhildana şer di sala 1974’an de tu li ku derê bûyî?

Li Qahireyê bûm, çimkî dawiya sala 1972’yan ji Iraqê derketim û çûm Beyrûtê, ji wê derê jî çûme Qahireyê. Ji nîvê sala 1973’yan yanî ji dema şerê Cotmeha 1973’yan heta 1974’an li wê derê bûm.

❖ Dema şoreşa Kurd rastî şikestê hat tu li ku derê bûyî?

Di sala 1974’an de, Muemer Qedafî behsa “Peymana Cezayîrê” ji min re kir. Ez yek ji wan kesan bûm ku di “Kongreya Ciwanên Nasir Dêgolî” de li Cezayîrê beşdar bûm[22].

Sibata 1975’an ez li Cezayîrê bûm, Muemer Qedafî ji min re got: “**Di kevanê Civîna Bilind a Erebî de li Mexrîbê, civîneke wezaretên derve jî tê sazkirin[23].”**

Serok Huwarî Bûmêdîn di navbera şayê Îranê û Sedam Hisên de navcîtî dikir, di encamê de meha Adarê “Peymana Cezayîrê” hat îmzekirin. Piştî wê yekê serkirdatiya Kurd civînek li dar xist, destpêkê biryara li hember derketinê da.

Li 19’ê Adarê ofîsa Barzanî fermana dawî anîna bi li hember der-ketnê weşand. Li gorî fermanê pêşmerge dikarîn vegerin Iraqê yan biçin Îranê. Wê demê ne berpirsyariya min hebû, ne jî di nav şoreşê de xwedan pêgeh bûm.

……

[22] Kongreya Ciwanên Nasir Dêgolî ji 28’ê Sibatê heta **2’ê Adara 1975’an li Benxazî** hat sazkirin.

[23] Civîna Bilind a Erebî ji 26 – 29’ê Cotmeha 1974’an li Rîbata paytexta Mexrîbê hat li-darxistin.

❖ Tu dijî biryara rawestandina şer bûyî?

Destpêkê min nedixwest şer dubare biqewime, lê piştî Peymana Cezayîrê ez bi li hember derketinê re bûm.

Di wê barê de min nameyek ji Mela Mistefa Barzanî re şand. Eger me li ber xwe bida, wê demê dibû ku opozisyona Iraqê ya li Şamê pişta me bigirta.

Sûriye û Lîbyayê jî alîkariya me dikirin. Qedafî dijî siyaseta Barzanî ya bi Îranê re bû, lê amade bû pişta baskê pêşveroya Kurd bigre, ku hevpeymanê xeta erebî bû, min jî nûnertiya wê dikir.

Beriya herifîna şoreşê, min Prîmakov dît, wî xwest em neçin bin barê daxwaza şahê Îranê û ji min re got: **“Tevgera Kurd dê bi vê teslîmbûnê bibe tevgereke kirêgirtî û bindest.”**

Got jî.

“Eger hûn berdewam bin di berxwedanê de, ez dikarim di navbera tevgera Kurd û Bexdayê de navbeynkariyê bikim û ji wan re bêjim; ew ne girêdayî Îranê ne, tenê tevgereke Kurd in.”

Lê bersiva wan ev bû: Dev ji wan kesan berdin, ku dixwazin dest li karê me werbidin. Ya rast min têkiliyên xwe bi Sovyetiyan re qut ne-kir, tevî ku di wê barê de baregeha Barzanî daxwaz ji min kir, lê min dixwast têkiliyên me bi Ereb û Sovyetiyan re bimîne.

❖ Wê demê karê Prîmakov çi bû?

Rojnamevanekî nûçegihan bû. Dema ku Şoreşa Kurd rastî şikestê hat, di 27’ê Adara 1975’an de li Beyrûtê me daxuyanî da û daxwaza

li hember derketinê kir. Di daxuyaniyê de min got: “Bi van nêzîkan ji bo bilindkirina morala pêşmergeyan, ez ê vegerim.”

Piştî biryara Barzanî û dawîyanîna bi şoreşê, me civînek li dar xist, piştre me daxuyaniyek di wê barê de weşand û Yekîtiya Nîştimanî ya Kurdistanê (YNK) li Şamê hat damezrandin.

Dr. Fuad Mesûm nûnerê Barzanî, li Misrê, Serokê Yekîtiya Xwendekarên Kurdistanê Adil Murad bal me bûn, her wisa Ebdul Rezaq Ezîz Mîrza, naskirî bi Ebdul Rezaq Feylî jî bal me bû, ku yek ji Kurdên rewşenbîr bû.

Di 22’ê Adara 1975’an de me daxuyaniyek amade kir û da ber destê hejmrek ji hevalan, yên ku me berbijar kiribûn ji bo desteya damezrêner wek, Newşîrwan Mistefa, Omer Şêxmûs, Dr. Kemal Fuad.

Di 1’ê Hezîrana 1975’an de, me daxuyaniyek din weşand[24] ku di rojnameyên Lubnanê û Sûriyeyê de hatin belavkirin, her wisa ji aliyê Radyoya Dengê Iraqê ve li Şamê hat weşandin.

❖ Gelo piştgiriya Sûriyeyê ji bo avakirina partiya we hebû?

Belê, piştgiriya siyasî û lojîstîkî ya Sûriyeyê ji me re hebû, çimkî wan rêdan da ku em baregehên xwe li wî welatî vekin, daxuyaniyan di rojnameyan de belav bikin û di radyoyê de jî bê weşandin.

……

[24] Ya rast ev e, ku di 1ê Hezîrana 1975’an de daxuyaniyek din nehatiye derxistin, belkî ya pêştir ku di **22’ê Adarê** de hatibû derxistin, **bi hinek guhertinan**, careke din hatiye weşandin.

❖ Ev piştgirî gihîştibû çi astekê?

Di hemû astan de hebû. Têkiliya min bi xwe ya taybet jî bi Serok Hafiz Esed re hebû. Têkiliyên me bi serokatiya Partiya Beis a Hevpeyman re, her wisa bi serokatiya Partiya Beis a Sûriyeyê bi xwe re jî, pir baş bûn. Di tevahiya warên siyasî, darayî, leşkerî û perwerdehiya leşkerî de, alîkariya me dikirin.

❖ Te li ku derê Abdullah Ocalan nas kir?

Dema ku ciwanekî penaber li Sûriyeyê bû û li baregehên partiya me dima.

❖ Kengê vegeriyayî Iraqê?

Di sala 1977'an de, piştî damezrandina Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistanê (YNK) di 1'ê Hezîrana 1970'yan de, ez vegeriyam Iraqê.

Piştî têkçûna hewldanên Dr. George Habash yên navcîtiyê bi hikûmeta Iraqê[25] re, di 1'ê Hezîrana 1976'an de, me biryara têkoşîna çekdarî da.

Piştre ez vegeriyam Iraqê û ji ber girtina sînoran nekarîm derkevim. Li "**Nawzeng**" dimam, ku navçeyeke dijwar a nêzîkî sînorê Îranê ye. Paş hingê, ez çûm Sûriyeyê. Me bi partiyên Kurd ên li Tirk re jî têkilî danîn. Ji wan Rêxistina Ciwanên Şoreşger ên Kurd, ku paşê bû Partiya Demokrat a Kurdistanê li Tirkiyeyê[26].

……

[25] Hewldanên navcîtiyê yên **George Habash** ji bo sivikkirina **cezayê bidarvekirinê** yê Şehab Şêx Nûrî û hevalên wî bû.

[26] Partiya Demokrat a Kurdistanê li Tirkiyeyê, di **11'ê Tîrmeha 1965'an** de li **Amed** ji aliyê Seîd Êlçî, Derwêş Akgol, Omer Turhan, Şakir Ozdemîr û Faîk Bucak ve hat damezrandin.

Her wisa bi Rêzdar Kemal Burkay, Serokê Partiya Sosyalîst a Kurdistanê re[27]. Dema ku ez vegeriyam Şamê, li wir Abdullah Ocalan dît. Wê demê di navbera PKK'ê û rêxistineke din a Kurd a bi navê KOK'ê[28] de şer hebû.

Ez wekî nûnerê YNK'ê û Rêzdar Kerîm Ehmed ji Partiya Komunîst a Iraqê, tevlî hewldanan bûn, da ku şerê di navbera wan de, bi dawî bibe. Em li mala min a li Şamê civiyan. Li wir min Abdullah Ocalan dît û min zanî, ew nêzîkî şeş mehan e li baregeha me dijî. Partiya wî, wê demê hîn piçûk bû.

❖ Gelo ew marksîst bû?

Wan wê demê xwe Marksîst-Lenînîst bi nav dikirin, lê niha îdia wê yekê nakin.

❖ Gelo têkiliyek we ya baş bi wî re hebû?

Min çend caran ew li Şamê dît. Têkiliyên navbera PKK'ê û YNK'ê baş bûn, bi taybet piştî navbeynkariya me ji bo avakirina eniyekê ji partiyên Kurd û Tirk.

Di wê barê de, me li Şamê çendîn civîn li dar xistin, bi amadebûna nûnerên Partiya Sosyalîst a Kurdistanê (PSK), Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) û Tevgera Rizgariya Neteweyî ya Kurdistanê (KOK).

……

[27] Partiya Sosyalîst a Kurdistana Tirkiyeyê di **Kanûna 1974'an** de, ji aliyê **Kemal Burkay** û hevalên wî ve hat damezrandin.

[28] Di kongreya sêyemîn a Partiya Demokrat a Kurdistana Tirkiyeyê de, li sala 1977'an, baskê ciwanan ê çepgir dest danîn ser partiyê û di **sala 1978'an** de, wan rêxistinek bi navê "**Tevgera Rizgariya Neteweyî ya Kurdistanê**" (**KOK**) ava kirin, ku Armanca wan a sereke, **Kurdistanek serbixwe û demokratîk** bû.

Ew civîn di bin çavdêriya me û Partiya Komunîst a Iraqê de hatin lidarxistin, da ku wan di eniyek yekgirtî de bikne yek, lê nebûn yek, çimkî li ser du xetên cuda dixebitîn.

Yek ji wan, **ji aliyê Abdullah Ocalan ve dihat nûnertîkirin, ku dixwest li Kurdistana Tirkiyeyê şoreş bê kirin.**

Ya din, **ji ber nebûna şert û mercên pêwîst ji bo şoreşê, banga leznekirinê dikir.**

Têkiliyên me bi Ocalan re bi başî man. Bi rêya me, wan Eniya Rizgariya Filistînê û Rêzdar Ebdul Cebar Kubeysî nas kirin, ku endamê serokatiya Partiya Beis û berpirsê deverê yê Partiya Beis a Iraqê bû.

❖ Ocalan kîjan rêxistinên filistînî nas dikir an jî bi wan re dixebitî?

Têkiliyek baş a Eniya Neteweyî ya Rizgariya Filistînê û Eniya Demokratîk a Rizgariya Filistînê bi Ocalan re hebû. Bi awayekî ku di dema êrîşa Îsraîlê de li ser Lubnanê, hinek ji gerîlayan heta kêliya dawî bi wan re şerî Îsraîlê kirin.

❖ Tê gotin bîranînên te yên xweş bi Ocalan re hene?

Ya rast, di sala 1980'yan de min çend caran Abdullah Ocalan dît. Di salên 1992'an û 1993'an de, dema ku Suleyman Demîrel ji aliyê **Tugut Ozal** ve ji bo avakirina hikûmetê hatibû erkdarkirin, ez wê demê li Tirkiyeyê bûm.

Demîrel ez vexwendim mala xwe û ji min re got:

“Ew dixwazin digel Erdal Înonu ji Partiya Komarî ya Gel[29], hikûmetê ava bikin. Wî ji min xwest, li ser pirsa Kurd li Tirkiyeyê, ez nêrînên xwe jê re bêjim.”

Wî projeyek amade dikir ku tê de îtiraf bi nasnameya Kurd dihat kirin, her wisa dixwestin hinek mafên Kurd bê bidin.

Min jê re got: **“Ew pirseke navxweyî ye. Lê wî bersiv da, ev yek hevşêwirîneke biratî ye.”**

Min jî got: **“Ev him ji bo we û him jî ji bo Kurdan tiştekî baş e.”**

Wî derbarê bandora min a li ser Ocalan pirsî.

Min got: “Ez ji te venaşêrim ku têkiliyeke min a baş pê re heye û ew guhdariya min dike. Ez di vê baweriyê de me, çareseriyeke siyasî ji bo her kesî rêya herî baş e, ji ber ku niha serdema diyalogê ye. Wî pêşwazî ji vê nêrîna min kir.

Paş hingê, bi Serok Oozal re civiyam, ku ez bi hevaltiya wî serbilind im, min tiştek jê veneşart.

Min jê re got: **“Dixwazim biçim Sûriyeyê, Ocalan jî dibînim, eger peyameke we ji bo wî hebe?”**

Wî got: **“Eger hinekî şîretan li wî dînî bikî (jê re wisa digot) da ku mecalekê bide, em bigihîjin çareseriyeke siyasî.”**

Piştre ez vegeriyam Kurdistanê û tevlî **Mesûd Barzanî**, em bi General **Eşref Betlîs Paşa** re civiyan, ku fermandarê candarmeya Tirkiyeyê û kesayetiyekî xurt bû di nav hêzên çekdar de.

……

[29] Partiya Komarî ya Gel (**CHP**) di **9’ê Îlona 1923’an** de ji aliyê **Kemal Ataturk** ve hatiye damezrandin. Heta piştî Şerê Cîhanê yê Duyem, ew yekane partî di qada siyasî ya Tirkiyeyê de bû. Di serdema pir partîbûnê de, **rola wê ya siyasî hebûye**. Piştî **darbeya 1980’yan** tevî ku **çalakiyên siyasî lê hatine qedexekirin**, di sala 1992’an de, dubare vegeriyaye qada siyasetê.

Her wisa bi eslê xwe jî Kurd bû. Wî derbarê serdana min a Sûriyeyê û dîtina Ocalan pirsî: **“Tu ê çi bêjî?”**

Min got: **“Pêwîstiya rawestandina şer.”**

Wî ez handam da ku wê yekê bikim. **Piştî ku ez gihîştim Şamê, Ocalan serdana min kir û em li ser agirbestê axivîn. Ocalan bê şert û merc, amadebûna xwe nîşan da.** Wê demê Kamran Qeredaxî jî li ma-la me bû. Min pêwendî bi nûnerê me yê li Enqereyê “**Serçil Mîrza Qezaz”** re kir.

Wî jî bi şêwirmendê çapemeniyê yê Turgut Ozal re têkilî danîbû. Serçil Mîrza her tişt jê re gotibû, wî jî rasterast ew fikir ji serok re gotibû. Piştre sekreterê wî yê taybet gazî min kir û got: **“Serok pêşwaziyê ji vê fikrê dike.”**

Wî ji min xwest: Ez Ocalan razî bikim, konferansek çapemeniyê li dar bixe û biryara xwe ragihîne, da ku biryar li pişt deriyên girtî nemîne. Min telefonî Abdullah Ocalan kir û daxwaza wî jê re got, û Ocalan jî qebûl kir.
Wê şevê min telefonî **Serok Ozal** jî kir û wî got: **“Ez ê hejmarek ro-jnamevanên Tirk bişînim”.**

Konferansa çapemeniyê li Beqayê hat lidarxistin, hejmarek ro-jnamevanên Tirk amade bûn û ez jî li wir bûm. Ocalan agirbestek 22 rojî agihand[30], lê me nezanî çima ew heyam hilbijarat.

……

[30] Konferansa çapemeniyê di **17’ê Adara 1993’an** de hat lidarxistin, **Ocalan agirbestek 25 rojî** ragihand.

Piştre ez çûm **Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê** û min serdana Konseya Ewlekariya Neteweyî kir, li wir rayedaran ez teşwîq kirim da ku di wê rêyê de berdewam bim.

Ji wê derê vegeriyam Brîtanyayê û bi Wezîrê Derve yê wê demê **Douglas Hurd** re hevdîtin kir[31].

Bi amadebûna şandeyek muxalefeta Iraqê, ku Dr. Mihemed Behr Ulûm û Ehmed Çelebî jî di nav de bûn**, min ji wan re behsa navcîtiya xwe ya navbera Ocalan û hikûmeta Tirkiyeyê, ji bo rawestandina şer kir.**

Ew hevdîtin bi cejna Newrozê re hevdem bû. Hurd pêşwazî ji navcîtîkirinê kir, lê min jê re got: **"Ez nikarim bi tenê bixebitim."** wî jî soza piştgiriya temam da min.

Paş hingê, ez vegeriyam Tirkiyeyê û bi germî hatim pêşwazîkirin. Hetta **Mesûd Yilmaz**, ku li derveyî desthilatê bû, li balafirxaneyê pêşwazî ji min kir û ji bo rawestandina şer, spasiya min kir. Piştre serokwezîr **Suleyman Demîrêl** bi germî û kêyfxweşiyeke mezin pêşwaziya min kir.

Serok Ozal, Dr. Erdal Înono û Demîrêl (Ez vê ji dîrokê re dibêjim) gotin: **"Em danûstandinê bi terorîstan re nakin lê pêşwaziya vê pêngava pozîtîf dikin."**

Ozal pîrozbahî li min kir û got: **"Ji wî dînî bixwaze bila dema agirbestê dirêj bike heta ku mecala min hebe, kesatiyên leşkerî û xelkê razî bikim û rêyekê jî ji bo wê pirsê peyda bikim."**

……

[31] Douglas Hurd ji 16'ê Cotmeha 1989'an heta 5'ê Tîrmehê 1995'an **Wezîrê Derve yê Brîtanyayê bû**.

Min jê xwest hejmarek parlamenterên Kurd ên Tirkiyeyê serdana Ocalan bikin.

Wî (Ozal) him daxwaza min qebûl kir, him jî ji wan xwest ku di vê mijarê de alîkariya min bikin û bi min re werin Lubnanê da ku Ocalan razî bikin ku agirbestê dirêj bike.

Me li Beqayê serdana Ocalan kir û daxwaza dirêjkirina heyama agirbestê kir[32].

Ya rast, min dixwest, demek bê dawî bi Serok Ozal bê dayîn. Ocalan razî bû, konferansek din li dar xist û peymana xwe ya dirêjkirina agirbestê ragihand.

Agirbestê heta piştî mirina Ozal berdewam kir. Heta wê demê, ku hêzên Tirkiyeyê Şemdîn Sakik revandin ku berpirsekî payebilind ê Partiya Karkerên Kurdistanê bû, bi girtin û kuştina 33 leşkeran dihat tawanbarkirin. Bi vê yekê agirbest bi dawî bû[33].

Min ji Ocalan xwest wê tawanê (girtin û kuştina 33 leşkeran) şermezar bike, daxuyaniyekê bide û sûcdar jî radestî dadgehê bike, lê wî red kir, di dawiyê de li ser wê yekê, têkiliyên me qut bûn.

……

[32] Di wê serdanê de **hejmarek serokên Partiyên Bakurê Kurdistanê** û endamê wê demê yê parlamentoya Tirkiyeyê **Ehmed Turk**, bi Talebanî re bûn.

[33] Agirbest di 8'ê Tîrmeha 1993'an de, **bi dawî bû** û şer di navbera artêşa Tirkiyeyê û Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) de, ji nû ve dest pê kir.

Beşa Duyem
YNK û Pirsên Navxwe û Navdewletî

Pêşgotin

Di vê beşê de, Sekreterê Giştî yê Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistanê Celal Talebanî, behsa du tecrubeyan ji danûstandinên bi Sedam Hisên û tîma wî re dike.

Ya yekem, dema şerê Iraq-Îranê di salên 1980'yan de û ya duyem jî, deh salên piştî herifandina rejîma Beis, di bin bandora bûyerên şerê Kendavê yê duyem û serhildana Kurdan de.

Talebanî dibêje: **Partiya min ji bo serhildanê amadekarî kir, yên din paşê hatin.** Her wisa dibêje: Serokkomarê Iraqê ji min re got: **Tu dê pêşniyarên me qebûl bikî yan em ê ji Kurdistanê vekişin û tu çi dikarî bike.**

Talebanî dibêje: **Tu roleke Tehranê berî bombebaranê di rizgarkirina Helebceyê de nebûye**, lê qebûl dike, ji Îranê alîkariya leşkerî wer-girtiye. Derbarê Muemer Qedafî dibêje:

Destê wî ji bo Şoreşa Kurd vekirî bû. Behsa şerê navxwe, rola artêşa Iraqê li Hewlêrê û helwesta wê demê ya Amerîkayê dike.

Naveroka
Beşa Duyem a Hevpeyvînê

❖ Helwesta we li hember şerê Iraq-Îranê yê 1980'yan çawa bû?

Ew helwesteke protesto û şermezarkirina şerê dijminane bû, ji ber ku ziyan dida berjewendiyên her du gelan. **Lê bi berçavgirtina hesta welatiyên Ereb ên Iraqê û hesta artêşê, me biryar da, em li dijî artêşa Iraqê şer nekin.**

Mamoste **Fazil Kerîm Ehmed**, ku wê demê endamê polîtburoya partiya me bû, me wekî nûner şand Bexdayê û me daxwaza rawestandina şer kir hata wê demê, ku cenga navbera Îran û Iraqê bi dawî bibe[34], da ku **em neyên tawanbarkirin bi şerê li dijî artêşê, ku bi xwe di şer de ye, lê Sedam Hisên pêşniyara me red kir**[35].

……

[34] Mamoste Fazil Kerîm Ehmed di bîranînên xwe de dibêje: "Demekê piştî destpêkirina şerê Îran-Iraqê, Sedam Hisên bi rêya Şêx Mihemed **Şêx Ebdul Kerîm Kirbçine**, wezîrê çandiniyê û berpirsên din ên Iraqê peyamek ji wî re şandibû, serdana Bexdayê bike da ku bi hev re pirsa Kurd û helwesta Kurdan li hember cenga Îran û Iraqê gotûbêj bikin."
Fazil Kerîm nivîsandiye: "Piştî nîqaşkirina naveroka peyamê bi Şêx Ebdul Kerîm re, wî hinceta vê yekê aniye, ku xwedêgiravî ji bo gaveke wisa, pêwîstî bi biryara polîtburoyê heye, lewma ew neçûye Bexdayê da ku Sedam Hisên bibîne."
[35] Di destpêka şer de, YNK'ê pişta tu aliyekî negirt, **lê di vê baweriyê de bû ku destpêkirina şerê di navbera Îran û Iraqê de, mecalek dîrokî ye**, ji ber ku tevgera rizgariya neteweyî ya Kurd dikare nehevsengiya hêzê li gorî berjewendiya xwe biguherîne.
Di wê çarçoveyê de, hejmarek civîn li dar xistin û gihîştin van biryaran:
Asta çalakiya pêşmergeyan bilind bikin, hinek rêbazên nû yên şer bikar bînin, bi taybet di nav bajaran û kampên darê zorê de, her wisa hew bidin hinek deveran azad bikin. Di hember rûbirûbûna rejîmê, ji nakokiyên siyasî û çekdarî yên navxwe yên Kurdistanê dûr bikevin. Ji bo serhildana girseyî ya welatiyan, **çalakiyên siyasî pêş bixin û xelkê di çarçoveya gireva giştî, xwenîşandan û awayên dîn ên xebata girseyî de, dijî rejîmê rêxistin bikin.**

Di sala 1982'yan de, Şehîd Dr. Ebdul Rehman Qasimlû, Sekreterê Giştî yê wê demê yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, wek navbeynkar ji bo rêxistina danûstandinan di navbera me û hikûmeta Iraqê de serdana me kir[36].

Ew pêşniyar bi şikesta artêşa Iraqê li Xoremşehrê re hevdem bû[37]. Em ji ber du sedeman dijî dagirkina Iraqê ji aliyê Îranê ve bûn. **Ya yekem, eger rejîmek îslamî wekî Îranê li Iraqê were damezirandin, wê demê em dikevin navbera du keviran û tên hêrandin.**

Ya duyem, ji ber ku em sekuler in, wê demê em zêdetir çepgir bûn û gelek ji me piştgirî didan ramanên Marksîstî-Lenînîstî û hinek ji me jî sosyalîst bûn. Ji ber van sedeman, me pêşniyar qebûl kir û razî bûn ku bi hikûmeta Iraqê re diyalogê bikin. Di wê çarçoveyê de, me dizî ve Feredûn Ebdul Qadir şand Bexdayê[38].

Lê hikûmeta Iraqê red kir û got: **Divê pirsgirêk tenê di navbera Celal Talebanî û Sedam Hisên de were çareserkirin.**

Di sala 1983'yan de, ez çûm Bexdayê û bi germî hatim pêşwazîkirin, lê roja yekem, di hevdîtina min û Tariq Ezîz de, li navenda îstixbarata Iraqê devojenî derket, di demekê de ku gotûbêjên me bi başî birêve diçûn, hata em gihîştin ser mijara Zanîngeha Silêmaniyê, ku ji bo Hewlêrê hatibû veguhestin.

Pêşniyara min bi vî awayî bû, Zanîngeha Silêmaniyê, ku ji bo Hewlêrê hatiye veguhastin û navê wê bûye **Zanîngeha Selahedîn**,

……

[36] Civîna yekem di **13'ê Cotmeha 1982'yan** de, li Goreşêrê pêk hat, ku nûnerê hikûmeta Iraqê serdana Celal Talebanî kir, lê civîn bê encam bi dawî bû.

[37] Artêşa Iraqê di 26'ê Cotmeha 1980'yan de Xoremşehr girtibû. Heta ku Îranê di 31'ê Gulanê de, ew ji nû ve girt, di bin kontrola Iraqê de bû.

[38] Fereydûn Ebdul Qadir di **Cotmeha 1983'yan** de çû Bexdayê.

wekî xwe bimîne, lê li Silêmaniyê zanîngehek bi navê **Zanîngeha Kurdistanê** were avakirin.

Lê wan gotin: Ew bi mercekê qebûl dikin, ku çêkirina wê bikeve piştî bidawîbûna cenga Îran û Iraqê. Ji aliyê xwe ve Serok Erkanê Artêşê Cewad Zenûn got:“Çareseriya herî baş ew e, Celal Talebanî biçe cem hevalê xwe Muemer Qedafî û ji bo avakirina zanîngehê pere bîne.”

Piştî wî, Tariq Ezîz yekser got: **“Bi Xwedê piştî serkeftinê, em ê serê wî kesî bibirin, ku têkiliyên wî bi biyaniyan re hebe.”**

Ez şoke bûm, min kel û pelên xwe kom kirin û kursiya ku li ser rûniştibûm, zivirand.

Piştî temamkirina gotinên xwe, ji min xwest biaxivim.

Min got: “Ez nikarim.”

Wî got: “Çima?”

Min got:

“Diyar e, em di dorpêçê de ne û dîlên şer in, di danûstandinê de çi pêwîst dike gotinên wiha bikin?”

Di bersivê de got: “Bira, em henekan dikin, û hûn jî her tim dibêjin Beisiyên faşîst.”

Min bersiv da: “Em dibêjin Beisiyên faşî û hûn jî pêkenokan li ser Kurdan çêdikin, lê ew di derveyî danûstandinê de ye.”

Wî got: “Ez ji gotinên xwe poşman im.”

Min got: “Ez razî nabim.”

Wî xwest ku ev gotûbêj ji qeydên civînê werin derxistin.

Min dîsa red kir.

Di wê demê de, Şehîd Qasimlû parçeyek kaxiz da min ku li ser nivîsandibû: **“Meselê zêde mezin neke.”**

Min lêborîna (Tariq Ezîz) qebûl kir, lê civîn tevlihev bû.

Dema ku min bi Serok Sedam re hevdîtin kir, wî ji min re got: **“Ew ji nîqaşa bi Tariq Ezîz re kêfxweş e.”**

Sedam got: **“Tevgera te nîşana cidiyeta te ye.”**

Civînên me berdewam bûn, li ser piraniya xalan jî me li hev kir.

Heta nivîsandina daxuyaniya siyasî jî, me parastina welat û helwesta xwe li dijî dagirkeriya Îranê û her êrişekê tekez kir. Me bi Sedam Hisên re jî hevdîtin kir, ku Îzet Dûrî, Tariq Ezîz û Hîşam Sebah Fexrî pê re bûn.

Aliyê me jî, Şehîd Qasimlû, ez, Omer Abdulla, Mela Bextiyar û Dr. Xidr Mesûm amade bûn.

Sedam kêfxweşiya xwe ji helwesta me nîşan da û ji min re got: Bi vê helwestê, te ji bo welat û Beis qenciyek qeyd kir, ji ber ku welat di xetereyê de ye û em di krîzê de ne, metirsî hatiye ber deriyê me, lê bi vê rewşê jî, hûn hatine bal me, tu çaxan vê yekê ji bîr nakim (Ev gotina Sedam bû), **“tiştekî didim te, ku serê te li ber Kurdên Îranê û Iraqê bilind be.”**

❖ Ew tişt çi bû?

Nizanim, destnîşan nekir, lê bêguman tiştek derbarê pirsa Kurd bû.

Bala xwe da Tariq Ezîz û got:

“Divê ev helwest di tevahiya xwendingehên Iraqê de were xwendin, da ku diyar bibe çawa Kurd di demên dijwar de bi me re bûne.”

Her wisa got: “Divê yên cuda bûne, bizanin (mebesta wî Beisiyên Sûriyeyê bû) em yekhelwest û yekdeng in,” wê demê nakokî di navbera wan û serokatiya Sûriyeyê de hebû.

Em ji gotinên wî kêfxweş bûn. Min cilê kurdî wek diyariyekê pêşkêşî wî kir. Em vegeriyan Kurdistanê û me şandeyek bi serokatiya Fuad Mesûm pêk anî, di heman demê de Elî Hesen Mecîd jî serokatiya şandeya hikûmetê dikir.

Danûstandinan heta nîvê sala 1984’an berdewam kir, Me li ser pênc xalan li hev kir:

Asayîkirina rewşa Kurdistanê, asayîkirina rewşa Kerkûkê, desthilatên xweseriyê, herêma xweser û demokrasî li Iraqê.

Lê me li ser du xalan li hev nekir:

1. **Sînorê Kurdistanê**
2. **Hilweşandina Fermandariya Parastina Neteweyî ku jê re “Caş” dihat gotin.**

Ji ber razînebûna şandeya hikûmetê li ser hilweşandina wan fermandariyan, danûstandin hatin rawestandin, şandeya me vegeriya.

Piştî demekê, **Îzet Dûrî** digel **Elî Hesen Mecîd**, serdana me kirin, da ku danûstandin ji nû ve dest pê bikin. Îzet Dûrî got:

“Meseleya van fermandariyan di desthilata min de ye û ez qebûl dikim ku wan hilweşînim bi mercekê ku kes neyê azardayîn an kuştin.”

Me jî qebûl kir.

Lê li ser mijara sînor wî got: **“Ne di desthilata min de ye. Ew di desthilata Serok Sedam de ye.”**

Ez bi helîkopterê çûm Bexdayê û min Sedam Hisên dît, ku Îzet Dûrî û Elî Hesen Mecîd jî li wê derê bûn. Piştî ku pêşwaziya min kirin, Sedam ji min pirsî: **“Kîjan xal asê meye?”**

Min got: “Meseleya sînor. Min anî bîrê ku di dema bihurî de, wî soza tiştekî dabû ku li hember gelê min, serê min bilind dike.”

Wî got: “Belê, di bîra min de ye.”

Min gotê: “Dibe navçeyên Şêxan û bajarê Akrê bê xistin ser Herêma Xweser a Kursdistanê?”

Wî got: “Baş e.”

Min got: Lê navçeyên Xaneqîn û Kefriyê?

Wî got: “Baş e, lê piştî cengê.”

Me dawî bi mijarê anî.

Piştre Sedam Hisên got: **“Hûn amade ne ku roja pêncşemê peymanê îmze bikin?”**

Min got: **“Nexêr, cenabê serok ji ber ku me şandeyek şandiye da ku berbijarên Meclisa Neteweyî û navên wezîran diyar bikin.”**

Elî Hesen Mecîd got: “Celal westiyaye û gelek zehmetî kişandiye, lewma divê em mecalê bidinê.” Di bersiva wî de Sedam got: “Ser çavan.”

Min ji serok xwest ku min ji wê berpirsiyariyê bibaxşîne.

Me di dawiyê de biryar da, ku **roja şemiyê** îmze bikin. **Wî bang li Wezîrê Çandê Letîf Nuseyîf Casim kir, ku roja Şemiyê bike betlaneya neteweyî.** Em jî derketin derve.

❖ Gelo danûstandin bi Sedam Hisên re dijwar bû?

Di hinek qonaxan de dijwar bû. **Ew beşdarî danûstandinan nedibû, ji ber ku şande her tim di danûstandinê de bûn. Danûstandina min bi wî re dijwar nebû,** berevajî bi Tariq Ezîz re dijwartir bû.

❖ Eger soza tiştekî bida, pêbend dibû?

Belê, min ev di ezmûna xwe ya kesane de dît. Gelek hevalên me ji hevdîtina wî ditirsiyan, lê min dipirsî, gelo wî bi xwe bangî min kiri-ye? Eger min bizaniya wiha ye, ez yekser diçûm.

Roja şemiyê, min telefonî Îzet Dûrî kir û jê pirsî gelo ji bo îmzekirinê amade ne. **Wî bersiv da: "Belê."**

Em çûn Meclisa Neteweyî û li wir hatin pêşwazîkirin. Wî ji me xwest ku em derbasî hundir bin, û bi xwe çû da ku bi serokatiyê re têkiliyê dayne. Lê dema vegeriya heyrmayî bû û got: **"Pirsgirêkek heye, divê berî îmzekirinê were çareserkirin."**

Diyar bû mijar girêdayî Peymanan **Mîsaqa Neteweyî** ye.

Gotinek Sedam anî bîra min, ku li ser peymana di navbera wan û Komunîstan de hebû. Sê salan dom kiribû. Sedam dibêje: **"Dibe ku bi birayên me yên Kurd re, em bi sal û nîvekê çareser bikin."**

Piştre derket ku şandeyek Tirkiyeyê li Iraqê ye. **Mi ji Îzet Dûrî pirsî, ya ku qewimî ji ber şandeya Tirkiyeyê ye?**

Piştî derbasbûna wan rojan, sala 1991'an, dema danûstandinan, ku Mesûd Barzanî jî amade bû, em bi Îzet Dûrî, Tariq Ezîz û Sultan Haşim re civiyan.

Îzet Dûrî got: **"Bavê Bafil, tu dizanî çima peymana 1984'an nehat îmzekirin?**

Tariq Ezîz got: **"Hevalê te Torgut Ozal sedem bû."**

Min destê wî girt û got: **"Serokê dîplomasiya Iraqê, bi zimanê xwe îtiraf bi rastiyan kir, di demekê de me tawanbar dikin ku em guh didin biyaniyan!"**

❖ Di navbera van her du dîrokan de şerê Kurd-Kurd derket? Çîroka Samî Ebdul Rehman çi bû?

Wê demê Samî Ebdul Rehman ji Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) veqetiyabû û partiyek bi navê "**Partiya Demokratîk a Gelê Kurdistanê**" damezrandibû. Di wê heyamê de, ew beşdarî tu şerekî nedibû.

Me Mesûd Barzanî vexwend Sûriyeyê, bi wî û Partiya Beis a Iraqê ya li Sûriyeyê re me li hev kir, da ku siyasetek hevpar bimeşînin, lê hejmarek mezin ji endamên me hovane hatin kuştin.

Me hêzek bi navê Hêza 77[39] amade kir ku sînorê wê bi dirêjahiya xeta Behdînan bû, da ku çekan ji Sûriyeyê bîne.

Ew hêz ji aliyê Şehîd Elî Eskerî, Dr. Xalid û Şêx Hisên Baba Şêx ve dihat rêvebirin. Piştî ku çûn nav axa Tirkiyeyê, ew ketin kemînê.

……

[39] Di tu çavkaniyên dîrokî yên behsa **Trajediya Hekariyê** dikin de, nehatiye gotin ku ew hêza YNK'ê bi navê Hêza 77'an hatiye binavkirin.

Hin ji wan şehîd bûn û **yên din jî ku xwe teslîmî Samî Ebdul Rehman kirin, hatin bidarvekirin. Samî Ebdul Rehman bi xwe endamê Serkirdayetiya Demkî ango "Qiyadeya Muweqete"[40]bû.**

Di nav kesên ku hatin bidarvekirin de, Elî Eskerî, Dr. Xalid û Şêx Hisên hebûn. Ji ber wê yekê, di navbera me û Partiya Demokrat a Kurdistanê de şer derket. Me endamên wan ji parêzgehên Hewlêr, Silêmanî û Kerkûkê derxistin, di encamê de vekişyan navçeyên Dihokê.

Piştre, di sala 1985'an de, bi navbeynkariya Îraniyan digel Îdrîs Barzanî, ji bo bi dawî anîna wê nakokiyê, me li hev kirin[41].

Samî Ebdul Rehman di sala 1979'an de ji Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) cuda bû û ew partî damezrand[42].

……

[40] Partiya Demokrat a Kurdistanê-Serkirdatiya Demkî, di **10'ê Kanûna 1975'an** de ji aliyê **Mesûd Barzanî, Îdrîs Barzanî, Samî Ebdul Rehman** , Cewher Namîq Salim, Arif Teyfûr, Kerîm Sincarî, Mihemed Reza, Azad Xefaf, Azad Berwarî, Xazî Zêbarî, Wirya Saatî, Fazil Mîranî û Ebdul Rehman Bêdawî ve hat damezrandin.

[41] Berî hewldana navbeynkariya **Îraniyan**, di navbera rêveberiya **PDK'ê û YNK'ê de bi rêya Polîtburoya Partiya Sosyalîst a Kurdistanê**, name hatine lihevguherin.

Her wisa di 27'ê Gulana 1986'an de, li baregeha Partiya Sosyalîst a Kurdistanê li gundê Kawlanê civînek hat lidarxistin, ku ew civîn destpêkek baş bû ji bo gavên din.

Piştre **Celal Talebanî û Îdrîs Barzanî di 7 û 8'ê Mijdara 1986'an de li Tehranê civiyan. Di encamê de, wan di 8'ê Mijdarê de peymanek îmze kir.**

[42] Di Kongreya Nehemîn a Partiya Demokrat a Kurdistanê de, ku ji **14-20'ê Mijdara 1979'an** hat lidarxistin, **hejmarek ji endamên Rêveberiya Demkî**, bi serokatiya Samî Ebdul Rehman, piştî ku hinek ji daxwazên wan nehatin bicîhanîn, **ji kongreyê vekişiyan**. Wan **Partiya Demokratîk a Gelê Kurdistanê** ava kirin.

❖ Hinek dibêjin; ger we Helebce bi alîkariya Îranê rizgar ne-kiriba, nedihat kîmyabarankirin, tu çi dibêjî?

Rizgarkirin bi alîkariya Îranê nebû. Alîkarî piştî rizgarkirinê hat[43]. Çekên kîmyeyî salekê berî Helebceyê li dijî me hatibûn bikaranîn, lê cîhan jê agahdar nebû. Tenê guhertinek pêk hat, ew jî ev bû, ku Îranê sînor ji rojnamevanan re vekir da ku wêneyên trajediya Helebceyê bigirin.

……

[43] Di sala **1984'an** de, Iraqê bi wê darayî û çekên nû yên bi dest xistibûn, şerê bi Îranê re derbasî qonaxek nû kir, di wê çarçoveyê de, dest bi êrişan ser saziyên aborî yên Îranê û bombebarana bajaran kir. Di hember de, Îran jî ket amadekariya bersivdanê.

Di sala **1987'an** de, qonaxek din a şer di navbera wan de dest pê kir. Îran li eniya başûr rastî sikestê hat. Lewma Îranî ketin vê fikirê ku eniyek din bi alîkariya hêzên opozisyona Iraqê li navçeyên Kurdistanê vekin.

Di wê çarçoveyê de û di nîvê sala 1987'an de, **Fermandariya Qerargeha Remezanê ya girêdayî Sipahê Pasdaran**, li baregeha xwe li Kirmaşanê bi nûnerên hêzên opozisyona Iraqê re civiya.

Di civînê de **nûnerên YNK'ê, PDK'ê, Partiya Sosyalîst a Kurdistanê, Tevgera Îslamî, Hizbullaha Şoreşger a Kurd, Hizbullah û Encumena Bilind a Îslamî ya Iraqê amade bûn.**

Di civînê de, îraniyan bi eşkere li ser vekirina eniya şer a bi Iraqê re li **Helebce û Şarezûrê** axivîn û aliyên beşdar jî amadebûna xwe ji bo her hevkariyekê diyar kirin.

Îran di vê baweriyê de bû, girtina Helebceyê dê parastinek xwezayî li dijî her êrişek Iraqê be. **Hêzên hevpeyman ên Kurd ji bo ku fişara ser xwe sivik bikin, dixwestin Helebceyê bigrin.**

Gelê Helebceyê jî, sala pêştir ji ber serhildanê, zilm û zordariya rejîma Beis dîtibûn, ew jî bi vê yekê re bûn, Helebce ji aliyê hêzên Kurd ve bê girtin..

Destpêka sala 1988'an, aliyê Îranî û partiyên Kurd çendîn caran bi hev re civiyan û plana girtina Helebceyê hat danîn.

Êriş di **şeva 12'ê Adara 1988'an de dest pê kir û Helebce di 15'ê Adara 1988'an de hat girtin**. **Iraqê jî, ji bo tolhildanê, di 16'ê Adara 1988'an de bajêr kîmyabaran kir.**

Di encamê de, şerê di navbera me û hikûmeta Iraqê de, pêvajoya kavilkirina gundan û koçberkirina Kurdan ji nû ve dest pê kir, ku berevajî peymana 1985'an a bi Îzet Dûrî re bû.

Piştî salekê, me efserek bi pileya rayîd bi dîl girt, dema azadkirinê, me nameyek dayê da ku bigihîne Elî Hesen Mecîd.

Di kasêteke dengî de Elî Hesen Mecîd dibêje:

"Talebanî ji rêya wî efserî, nameyek ji min re şandiye û daxwaza rawestandina şer ji aliyê xwe ve dike hata dawî bûna cenga Iraq-Îranê, bi mercekî ku kavilkirina gundan bê rawestandin."

Her wisa dibêje: **"Ey Celal Talebanî, niha ez dizanim kudera te têşe! Ji ber vê yekê, em ê gundan leztir kavil bikin."**

❖ Çima Helebce bi çekên kîmyayî hat bombebarankirin?

Ez dubare dikim, ew (Helebce) ji hêla hêzên me û hêzên Partiya Sosyalîst a Kurdistanê ve hate azadkirin. Piştî bombebarana çeper û baregehên partiya me, ji aliyê hêzên Iraqê ve, me êrişî Helebceyê kir, da ku eniya duyem vekin. Çawa ku Sedam bi xwe jî dibêje:

"Divê serê mar were girtin, mebesta wî baregeha serokatiya me bû."

❖ Gelo wê demê alîkariya Îranê ji we re dihat?

Belê, tenê alîkariya leşkerî, ne ya darayî. Ya rast, me ji Îraniyan xwest, çimkî wan dest danîbûn ser çekên me yên ku me pêştir bi dest xistibûn.

Berî şerê Iraq û Îranê, me sê hezar çek ji Sûriyeyê û 10 hezar çek ji Lîbyayê wergirtibûn.

Dema ku min bi Wezîrê Berevaniya Îranê Dr. Mistefa Çemran re hevdîtin kir, min daxwaza wan çekan kir.

Wî ji min re got: “Min ji bo te çareseriyek dîtiye, gelo ev çek ji bo firotinê ne?”

Min got: “Na.”

Wî got: “Yê şer bike yan birîndar bibe yan jî tê kuştin.”

Min got: “Belê, wisa ye.”

Wî domand û got: **“Ez ê wan çekan li şûna wan kesan yên bi wan şer dikin, radestî Sipahê Pasdarên Şoreşê bikim[44].”**

❖ Lîbyayê çi pêşkêşî Kurdan kir?

Destê Lîbyayê ji hêla darayî û leşkerî ve ji me re vekirî bû. Ew piştgirî vedigere salên 1970’yan.

Têkiliya min bi Ebû Zeyd ango Muemer Qedafî re baş bû. Dema ku wî alîkariya xwe pêşkêşî min kir, ez wê demê di serokatiya partiyê de nebûm û tevlî şer jî nebûm.

Wî ji min re got ku rojnameyekê biweşînim, min lêbihurîn xwest. Piştre wî got: **“Tu kesekî siyasetmedarî û pêdivîya te bi pereyan heye, . çekeke bankeyê ji albayê birayê te, ji te re pêşkêş.”**

……

[44] Civîna di navbera **Celal Talebanî û Mistefa Çemran** de, divê berî destpêkirina şerê Îran-Iraqê pêk hatibe, ji ber ku Çemran di 21’ê Hezîrana 1981’an de li nêzîkî Xefacyeyê hat kuştin.

Min dîsa sipasiya wî kir. Her tim beşdarî wan çalakiyan dibûm ku wan organîze dikirin û ez dihatim vexwandin, û têkiliya min bi Ebû Bekir Yûnis re jî hebû. Dema me YNK damezrand, min mehê hezar dînar jê dixwest.

Min nameyek ji bo wergirtina pereyan da konsulxaneya Lîbyayê ya li Şamê, lê wan dereng xist, paşê min zanî ku Ebdul Selam Celûd li Iraqê bûye[45].

Di nav me de, rojnamevanekî iraqî hebû ku navê wî **Munzir Neqişbendî** bû, kadroyekî payebilind ê Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) bû, ku tevlî refên me bibû û bi Adil Murad re di odeyekê de diman.

Wî karîbû destûra dayîna pereyan bidize û wêneyeke wê ji hikûmeta Iraqê re bişîne.

Wê yekê, Ebdul Selam Celûd xist şermezariyê, lewma wî ferman da, wê alîkariyê rawestînin.

Sal 1970'yan bû, lê piştî damezrandina YNK'ê, lîbyayiyan tevahiya daxwazên me qebûl kirin. **Hetta carekê Muemer Qedafî nivîsandibû, tevahiya daxwazên wî werin bicihanîn.**

……

[45] Derbarê têkiliyên YNK'ê û Lîbyayê, **Fuad Mesûm** dibêje:
"Têkiliya navbera wan baş bû, lê ne di destpêkê de. Paşê **Lîbyayê alîkariya wan kiriye, mehê 50 hezar dînarên Lîbyayê daye wan, Adil Murad jî, ew pere werdigirt."**
Derbarê bira pereyan û çawaniya wergirtinê, Adil Murad dibêje:
"Dema ku ez diçûm Lîbyayê, min pere ji wezareta derve wernedigirt, belkî ji serokatiya artêşa Lîbyayê werdigirt."

Yekem bira mezin a pereyan ku min ji Lîbyayê anî, nêzîkî çar milyon frankên fransî ango **nêzîkî 400 hezar dînarên Lîbyayê bû**.

Carna min di navbera Qedafî û yên din ên mîna Eniya Neteweyî ya Rizgariya Filistînê de, navbeynkarî kir, ji ber ku George Habash xiristiyanî bû, lewma di navbera wan de, pirsgirêk hebûn.
Li gorî pirtûkên wî yên bi navê "**Pirtûka Kesk**", "**Teoriya Sêyem**" Qedafî behsa çareserkirina pirsgirîka neteweyan dike.

Bi nêrîna wî, divê her neteweyek serxwebûna xwe bi dest bixe, ji ber ku bêyî serxwebûn û yekîtî, tu çareseriyek din ji bo pirsgirêka neteweyan nîne.

Qedafî di gotarekê de li Kremlinê got**: "Welatên parçekirî yên wekî neteweyên Kurd, Koreyî û Ereb divê bibin yek."**

Di civînekê de, ku Serokê wê demê yê Îranê Haşimî Refsencanî beşdar bû, Qedafî got: **"Divê neteweya Kurd bibe yek, serbixwe be û Kurdistanek serbixwe jî were avakirin."**

Dema ku Necmedîn Erbekan jî dît, jê pirsî çima îtirafê li Îsraîlê dikin, îtirafê li Kurdan nakin.

❖ Rikê Qedafî li Sedam dihat?

Wiya nizanim, lê wî pişta Kurdan digirt. Hemi caran dubare dikir û digot: **"Eger Kurd li Lîbyayê ban, min mafê wan yê çarenivîsê dida."**

❖ Çima we li Pişt Aşanê li Partiya Komunîst a Iraqê da?

Şer di navbera me û Eniya Neteweyî ya Demokratîk a Iraqê de, derket ku ji Partiya Komunîst a Iraqê, Partiya Sosyalîst a Kurdistanê û Partiya Demokrat a Kurdistanê pêk dihat.

Destpêkê têkiliya me baş bû, heta wê demê ku di navbera me û Partiya Demokrat a Kurdistanê de li Iraq û Îranê şer derket.

Wê demê PDK'ê û hêzên **Sipahê Pasdarên Îranê**, êrişî baregahên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê kirin, me jî pişta PDK ya Îranê girt, di encamê de şer di navbera me de derket. Sipahê Pasdaran êrişî navçeya Berzence kir, em li hember wan sekinîn û 18 kes ji endamên Sipahê Pasdaran ji aliyê me ve bi dîl hatin girtin.

Wan jî li navçeyên din êrişî me kirin û li Behdînan dest danîn ser baregehên me. Piştre ji bo dawîanîna şer me biryar da, baregehên wan li Pişt Aşanê bigrin. Di wê çarçoveyê de me dest bi êrişê kir û baregehên PDK'ê, Partiya Sosyalîst a Kurdistanê û Partiya Komunîst a Iraqê hatin girtin û serkirdeyên wan jî bi dîl hatin girtin.

❖ Çi rolek Îran û Sûriyeyê di avakirina Eniya Kurdistanî ya sala 1987'an de hebû?

Çi roleke wan nebû, ji ber ku Eniya Kurdistanî bi pêşniyara partiya me û Mesûd Barzanî hat damezrandin. Her wisa ji aliyê Îdrîs Barzanî ve jî gelekî dihat handan.

❖ Tawana Enfalê piştî dawîbûna şerê Iraq û Îranê dest pê kir?

Piştî cengê, destê artêşa Iraqê zêdetir vekirî bû, bi berfirehî êrişî me kirin û di encamê de, em vekişiyan ser sînor û navçeyên dijwar. Çawa ku hûn dizanin **li gorî ayeta Enfalê, saman û şerefa bêbaweran helal e, lewma em wekî bêbawer û derketî ji Îslamê dan zanîn û kuştina me ji aliyê wan va hat helalkirin.** Fermandarê giştî, peyamek ji artêşê re şandibû û gotibû: ***"Milk û şeref û jinên wan helal e."***

Wê demê jî, me ew peyama wan, belav kir. Bi mebesta guhertina demografiyê, zêdetir guhê wan li ser Kerkûkê bû. Zêdetirî 182 hezar

kesan hatin Enfalkirin. Rojekê Elî Hesen Mecîd dixwest wê hejmarê nerast nîşan bide, Got: **“120 hezar kes bûye.”**

Li gorî daneyên Rêxistina Human Rights Watch (HRW) 100 hezar kes di “Tawana Enfalê” de hatine kuştin û bêser û berate kirin.

Belgeyek me ya nîv-şewitî heye, me daye Rêxistina Lêbihurîna Nav-dewletî (HRW), ku nivîseke efserekî Iraqê ye û hejmara wan kesan yên bi çekên kîmyayî hatine kuştin, her wisa jinên ku destdirêjî li wan hatiye kirin, tê de hatine qeydkirin.

❖ Dema Iraqê êrişî Kuweytê kir tu li ku derê bûyî?

Li Şamê bûm. Çimkî li gorî biryara Eniya Kurdistanî, di navxwe de enî ji aliyê Mesûd Barzanî û li derve jî ji aliyê min ve dihat rêvebirin.

Di 11’ê Gulana 1991’an de li Saziya “**Chathatm House**” girêdayî Enstîtuya Şahane ya têkiliyên navdewletî yên Brîtanyayê, min semînarek li ser tevgera Kurd û rehendên wê da û tê de min got: **“Iraq dixwaze Kuweytê dagir bike û li wê hikûmetek girêdayî Bexdayê damezrîne.”**

Di nav beşdaran de, “**John Mabro**” ku serperestiya semînarê dikir, bi min re hev nêrîn nebû û got: **“Ev gotin bandorê li rastbêjiyê dike û zêdegavî jî xizmeta opozîsyona Iraqê nake.”**

Lê min Hilda Graham a rojnamevan razî kir, da ku babetekê li ser wê mijarê binivîse, wê nivîsî û da Wezareta Derve ya Brîtanyayê lê girîngî nedanê.

Piştre li Peymangeha Stratejîk a girêdayî Wezareta Berevaniya Fransayê, min di semînarekê de behsa niyeta Iraqê ya dagirkirina Kuweytê kir, lê dîsa kesî bawer nekir. Di wê semînarê de, Berpirsê Karûbarên Rojhilata Navîn li Wezareta Derve ya Brîtanyayê, **David Gorbos** jî, **gotina min wek zêdegaviyekê da zanîn**.

Min bi berpirsên Kuweytê bi xwe jî got, lê wan jî her bawer nekirin. Dema ku min paşê serdan Şazadeyê Şûngir Şêx Seid Ebdullah kir, wî got: "Eger te bi xwe, ew gotin nekiriba, me bawer nedikir ku bûyerek wiha biqewime."

Çavkaniya agahiya min ji nav hêzên Iraqê bi xwe bû, lewma amade bûm li ser wê yekê şert bikim.

Wê demê ez li Şamê bûm, Eniya Kurdistanî du biryar dabûn.

Ya yekem, rawestandina şer heta wê demê ku Iraq li Kuweytê be.

Ya duyem, şandina şandeyekê ji bo Tunisê, da ku Berpirsê Rêxistina Rizgariya Filistînê razî bike, di navbera me û hikûmeta Iraqê de, navcîtiyê bike, lê hikûmeta Bexdayê qebûl nekir.

❖ Piştî derketina Iraqê ji Kuweytê, li Kurdistanê serhildan çêbû, çi roleke YNK'ê tê de hebû?

Ya rast, **partiya me amadekarî ji bo serhildanê kiribû**, di wê barê de jî, gelek belgeyên me hene. Kekê Newşîrwan nameyek ji Mesûd Barzanî re şandibû û tê de behsa amadekariyên di nav bajaran de kiribû. Di bersivê de **Barzanî** gotibû: **"We tiştekî baş kiriye, lê niha me şiyana wan karan nîne."**

Dema ku serhildanê dest pê kir, hemî tê de beşdar bûn. Lê roleke me ya sereke hebû, me bi wan kesan ra têkilî danîn, ku girêdayî hikûmetê bûn, her wisa di aktîvkirina şaneyên çekdar de, li nav bajaran rola me hebû. Ji bilî wê yekê, piranî serhildan ji aliyê partiya me ve dihat rêvebirin.

Wek mînak êrişa ser Şeqlaweyê ji aliyê Kosret Resûl ve hat rêvebirin. Ya ser Silêmaniyê, ji aliyê Fereydûn Ebdul Qadir, û êrişa ser Kerkûkê jî, ji aliyê Newşîrwan Mistefa ve hat rêvebirin.

❖ Piştî serhildanê çi qewimîn?

Li derve bûm, ji bo lidarxistina konferansa Beyrûtê amadekarî dihat kirin, tevahiya navçeyên Kurdistanî ketibûn destê me, lê hikûmeta Iraqê karî bû serhildana başûrê Iraqê serkut bike.

Roja 11'ê Adarê hêzên Iraqê ber bi bakurê hatin. Ji rêya **Berzan Tikrîtî** nûnerê berê yê Iraqê li Cenevê daxwza danûstandinê hat kirin û wî ji me re got: **"Ji bilî parçebûna Iraqê, amade ne li ser hemî mijaran danûstandinê bikin."**

Me qebûl kir, Berzan Tikrîtî got: **"Hûn dikarin cihekî li Cenevê yan Urdinê yan jî di nav welêt de diyar bikin, em lê amade bin."**

Lê serokatiyê hez dikir, di nav welêt de danûstandinê bike, çimkî Kurdistan di dest me de bû û me dikarî di astek xurtir de danûstandinê bikin.

Partiya Demokrat a Kurdistanê jî qebûl kir û Mesûd Barzanî di peyamekê de, ji bo Iraqê amadebûna xwe nîşan da, lê nunerên wan

Hoşyar Zêbarî û Muhsên Dizeyî amade nebûn ku beşdarî wê şandeyê bin, ya ku biryar bû ji bo dîtina Berzan Tikrîtî di 21'ê Adarê de biçe Cenevê, bi vê hincetê ku diçin Erebistana Siûdî, piştî vegerê dikarin li ser mijarê biaxivin.

Em di vê baweriyê de bûn, eger di wê heyamê de danûstandin bi-hata kirin û Kerkûk jî di dest me de ba, helwesta me di danûstandinê de xurtir dibû. Piştî daxwaza lêbihurîna nûnerê PDK'ê, nûnerê me tenê çû danûstandinê[46] .

Di nav welat de, careke din ji rêya Mukerem Talebanî nameyek bi gef ji Mesûd Barzanî re hatbû şandin.

……

[46] Newşîrwan Mistefa di pirtûka xwe ya bi navê "Danûstandinên Eniya Kurdistanî- Beis 1991" de, dibêje: **Sedam bi rêya du kesan peyamek ji Celal Talebanî li derveyî welêt û Mesûd Barzanî di nav welêt de şandibû.**

Newşîrwan Mistefa dibêje: Berzan Tikrîtî **peya Sedam a nivîskî ji rêya Serçil Qezaz ji Talebanî re dişîne, her wisa ew bi xwe jî nameyek ji Talebanî re dişîne û jê dixwaze mifayê ji vê mecala dîrokê werbigre û tekez dike, amade ne li Cenevê, Eman û Selahedînê bi şandeya Eniya Kurdistanî re danûstandinê bikin.**
Her wisa Berzan Tikrîtî gotiye, ew tenê bi aliyekî re danûstandinê nakin, divê **Talebanî û Barzanî** bi hev re beşdar bibin.
Newşîrwan dibêje: "Talebanî razîbûna xwe ji bo danûstandinê nîşan dide û bi du nameyan bersiva Sedam Hisên û Berzan Tikrîtî dide."
Newşîrwan dibêje: "Tevî pêkanîna endamên şandeya danûstandinan, lê **ji ber amede nebûna nûnerên PDK'ê yên şandeyê, hewlên Berzan Tikrîtî serî negirtin**."
Derbarê hewla navxwe ya Sedam jî Newşîrwan Mistefa dibêje: Sedama bi rêya '**Hacî Ubêyd Hacî Mecîd Sersûr**' nameyek ji Mesûd Barzanî re şandibû, Barzanî jî piştî hevşêwirînê bi Newşîrwan Mistefa re, bi erê bersiva nameya Sedam dide."
Lê ew name nagihîje destê Sedam, ji ber ku di rê de helîkopter êrişî otomobîla "Hacî Ubêyd" dike, ew jî ji ber canê xwe direvin, name di nav otomobîlê de dişewite.

Newşîrwan balê dikşîne ser vê yekê, ku **paşê derketiye, helwesta Barzan û serkirdeyên din ên PDK'ê li Kurdistanê cuda bûye ji ya hevalên wan li derveyî welêt, bi vê yekê, pêşniyara Sedam a ji bo danûstandinê li Kurdistanê jî bê encam bû.**

Ew name bi serkutkirina serhildana başûr û navîna Iraqê re hevdem bû. Artêşa Iraqê berê xwe da bakurê, gelek zû karîn Dihokê bigrin. Piştre êrişî Kerkûkê kirin, piştî şerekî giran karîn bajêr dagir bikin. Xelk tirisyan û berê xwe dan sînorê Îran û Tirkiyeyê, bi awayekî ku bandor li pêşmerge jî kir, ew jî vekişiyan.

Me li çiyayê Ezmer li tenişta Silêmaniyê şer kir, li wê derê me êrişa artêşa Iraqê rawestand û me nehîşt bikevin Şarbajêr[47].

Hêzên Partiya Demokrat a Kurdistanê jî, li dergehê Şeqlaweyê pêşiya artêşa Iraqê girtin û hejmarek tankên artêşê ji nav birin. Piştî wê yekê hikûmetê daxwaza danûstandinê kir.

Şandeyek YNK'ê û PDK'ê ser daxwaza hikûmeta Iraqê çûn Bexdayê. Ew şande pêkhatibû; ji Fazil Mîranî, Azad Berwarî ji PDK'ê û Fereydûn Ebdul Qadir û Umer Fetah ji YNK'ê[48].

Berpirsên Iraqê sozdabûn şandeyê, dikarin hemî tiştekê gotûbêj bikin, bi taybetî jî pirsa federaliyê. wan mezheb bikar anîbû û gotibûn xwedêgiravî em û hûn sunî ne û şîe dijî me ye û **gotibûn hemû tişt bi beşdariya Celal Talebanî û Mesûd Barzanî serî digre.**

Serokatiya me (YNK) bi beşdariya 11 kesan civiya, 10 kesan deng dan danûstandinê, **tenê min deng neda.**

……

[47] Ehmed Bamernî ku yek ji wan kesan bû, di wê qonaxê de, li Silêmaniyê bi Celal Talebanî bû, di bîranînên xwe de, behsa rola hêzên Eniya Kurdistanî û çawaniya şikandina artêşa Iraqê dike.

[48] Mesûd Barzanî di wê barê de dibêje: "**Talebanî** di 8'ê Nîsana 1991'an de, **nameyek** jê re şandiye û tê de behsa wê yekê kiriye, ku hikûmetê ji rêya "**Dara Tofîq Axa**" peyamek şandiye û amadebûna xwe ji danûstandinê re nîşan daye, **di wê çarçoveyê de, her du aliyan li hev kirine da ku şandeyekê bişînin Bexdayê.**

Serokatiya Eniya Kurdistanî jî, bi piranî deng da danûstandinê, **vê carê jî, tenê min deng neda.**
Min ji ber çend sedeman daxwaza lêbihurînê kir, ku ev bûn; **Di heyama bihurî de me gelek gotin li dijî hikûmetê kiribûn, baweriya min li hikûmetê nebû, ditirsiyan min jehrxwar bikin, çend hincetên min ên din jî hebûn.**

Bersiva wan (Serokatiya Eniya Kurdistanî) ev bû, digotin:

"Tevahiya jiyana te di bin gef û kuştinê de bûye, tu pêşmergeyî û ev berjewendiya gelê Kurd e."

Lewma min nêrîna xwe guhert, bi du şertan:

Yekem**: Kekê Mesûd Barzanî bi xwe nameyekê binvîse û tê de bêjin, bê razîbûna min, wan biryar li ser çûna min dane.**

Duyem: **Destê min vekirî be, yên ku dixwazim, wan gel xwe bibim Bexdayê.**

Serokatiya eniyê qebûl kir û nameyek bi destxeta Kekê Masûd hat nivîsandin, ku heta niha jî li bal min e, tê de hatibû gotin, **me Celal Talebanî di wê barê de erkdar kir.**

Min jî ev kes hilbijartin: Nêçîrvan Barzanî ji Partiya Demokrat a Kurdistanê, Samî Ebdul Rehman ji Partiya Demokratîk a Gelê Kurdistanê û Resûl Mamend ji Partiya Sosyalîst a Kurdistanê[49]. Roja **19'ê Nîsana 1991'an** civîna Serokatiya Eniya Kurdistanî hat lidarxistin û biryar hat dayîn, roja 20'ê Nîsanê gera yekem a danûstandinan dest pê bike û heta 28'ê Nîsanê berdewam bibe.

……

[49] Ji bilî wan kesan ên Talebanî navê wan aniye, Omer Fetah û Omer Ebdullah ji YNK'ê û Azad Berwarî Ji PDK'ê di şandeyê de beşdar bûn.

Em çûn Bexdayê bi coş hatin pêşwazîkirin û Rêveberê Îstixbarata Leşkerî, Lîwa Wefîq Samerayî mêvandariya me kir, ku hevalekî min yê kevin bû. Berêvara wê rojê, Îzet Dûrî û Tariq Ezîz serdana me kirin û di atmosfereke dostane de em axivîn. Me çar xal da wan ku ev bûn:

1. **Demokrasî li Iraqê**
2. **Rewşa mafên mirovan li Iraqê**
3. **Rewşa mafê Kurdan**
4. **Normalkirina rewşa Kurdistana Iraqê.**

Wan derbarê her çar xalan de amadebûna xwe nîşan dan û ji me xwestin şandeya nûner pêk bînin.

Lê devojenî di navbera min û Tariq Ezîz de derket, dema ku wî behsa daxuyaniyeke min kir, ku tê de ez pişta pêşniyarên Wezîrê Derve yê Almanyayê "Hans-Dietrich Genscher" digrim, **ku behsa darizandina Sedam Hisên dike wek tawanbarê şer.**

Min bersiv da û got: "Em ji bo danûstandinê hatine ne ji bo nirxandina wê daxuyaniyê."

Berevajî plana ku hatibû danîn, me Sedam Hisên jî dît û bi germî pêşwaziya me kir. Derbarê gotinên Tariq Ezîz axivî û got: "Ew ji kevneşopiya eşîrtiyê tiştekî nizane."

Sedam Hisên besa çekê Kîmyayî kir, min gotê: "Me tu tiştek dijî cenabê te nagotiye, belkî me hikûmet û Partiya Beis gumanbar kiriye, lê piştî bikaranîna çekê kîmyayî êdî tu tiştek ji me re namye, bi taybetî piştî bombebarankirina Helebceyê."

Di bersivê de Sedam got: “Ez ji hesta we ya derbarê Helebceyê fem dikim, min hêvî jî dikir, Kekê Mesûd Barzanî bal we ba.”

❖ Wî Behsa Kuweytê kir?

Nexêr, çi tiştek negot.

❖ Daxwaza hatina Kekê Mesûd kir?

Belê, min gotê:

“Mesûd Barzanî birîndar e, ji ber ku serokê eşîreta xwe ye û wek min nîne, şeş hezar kes ji eşîra wî bêser û berate ne, ji bilî kuştina sê ji birayên wî. Eger bê daxwaza diyarkirina çarenivîsa bêser û berateyan dike.” Got: **“Ez rewşa wî berçav digrim.”**

Lê heta em vegeriyan Kurdistanê, me zanî ku ji tevahiya sozên xwe yên dabûn poşman bûye. Aliyê Iraqî got: “Demokrasî modela borjwaziya rojava ye. Mafên mirovan komploya dagirkeriya bloka sosyalîstî ye.”

Di encamê de, wî tevahiya sozên xwe bin pêkirin û tu ronahiyek ji bo li hev nêzîkbûnê di paşerojê de nehîşt. Tariq Ezîz jî gotibû Kekê Mesûd, mafê we ye ku Kerkûkê bigirin, çawa ku Ereb Endelosê digirin, ji ber ku bajarekî erebî ye, wekî Kerbelayê iraqî ye û nayê gotûbêj kirin[50].

……

[50] Di wê beşa gotina xwe de Celal Talebanî behsa şandeya gera duyem a danûstandinan dike, bi serokatiya **Mesûd Barzanî** û endamtiya her yek ji; Cewher Namîq Salim, Roj Nûrî Şaweys, Azad Berwarî, Cercîs Fethulla ji PDK’ê û Newşîrwan Mistefa, Kosret Resûl, Dara Tofîq Axa ji YNK’ê û Mehmûd Osman, Seîd Abdulla ji PASOKê û Samî Ebdul Rehman ji Partiya Demokratîk a Gelê Kurdistanê, **ku 7’ê Gulana 1991’an çûn Bexdayê heta 17’ê Hezîrana 1991’an li wê bûn.**

❖ Piştî wê yekê, we ji bo avakirina desthilatê kar kir?

Na, sala 1991'an min û Mesûd Barzanî hewl da, hevdîtineke din bi berpirsên Bexdayê re bikin. Sedam Hisên destpêkê tenê bi min re hevdîtin kir, piştre bi Mesûd Barzanî re jî hevdîtin kir. Wî ji ser cur û xwezaya nakokiyan li min pirsî, min gotê:

"Paşdevekişîn heye ji wan sozên ku we dabûn, her wisa hewl jî heye ji bo xerabkirina navbera min û Mesûd Barzanî, ev jî di berjewendiya Iraqê de nîne."

Her wisa min gotê:

"Ez nigeran im li hember weşandina gotarekê di rojnameya "Babil"ê de ku ji aliyê Udeyê kurê te ve tê serperestîkirin bi navê "Yek…Yek".

Naveroka wê behsa vê yekê dike, xwedêgiravî bav û kalên wan reviyane Kurdistanê û di bin çetra Talebaniyan de hatine parastin. Niha jî dema wê yekê hatiye başiyekê ji Celal Talebanî re bikin û bibaxişînin û li Bexdayê pêşwazî lê were kirin!!!!

Min ji Sedam re got:

"Hûn gelek baş dizanin rewşa we piştî şerê Kendavê çawa ye, hatina min a Bexdayê ji bo daxwaza lêbihurînê nîne, lewma wan cure gotaran wek heqaretkirinê der heqê xwe dizanim.

Sedam Got:

"Eger hûn pêşniyarên me qebûl nakin (Helbet ev gotina wî wek gefekê nebû**), em ê hêzên xwe ji wan navçeyan vekşînin ku em wekî Kurdistan dizanin û ji we re vala dikim, hûn jî çi dixwazin bikin."**

Ez ji Bexdayê vegeriyam, piştre Kekê Mesûd jî vegeriya.

Lê nakokî ket nav Eniya Kurdistanî, çimkî **Mesûd Barzanî amade bû tenê bi hikûmeta Iraqê re peymanê îmze bike**, hetta eger partiya wî jî razî nebe.

Ev jî di demekê de bû ku dizanî em razî nînin, çimkî em di vê baweriyê de bûn, ti tiştek ji bo gelê Kurd di naveroka peymanê de nîne, berevajî heqaretê li gelê Kurd dike û rûmetê dide Partiya Beis û Serokatiya wê. Wê nakokiyê ev pirs derxist holê, ku ji vir şûna em ê çawa kar bikin?

Hinekan pêşniyara **lidarxistina hilbijartinê ji bo hilbijartina endamên Encumena Yasadanînê kirin da ku ew encumen wan siyasetan destnîşan bike ku ji bo rêveberiyê pêwîst bûn.**

Siyaseta ku me xist meriyetê, me li ser li hev kirin. Piştî wê yekê artêşa Iraqê ji Silêmanî, Derbendîxan û Hewlêrê vekişiya, di wê demê de Hevpeymanan ***navçeya qedexe ji bo firînê*** diyar kir û hêzên artêşa Iraqê ji wan navçeyan der xist[51].

Vê yekê, ji bo vegera awareyan hêsankariyek mezin kir. Dixwazim behsa vê yekê jî bikim, tevî wê rewşê, me dawî bi danûstandinê bi hikûmeta re neanî.

Em di wê qonaxê û di rêvebirna deverê de rastî astengiyên mezin û dijwar hatin, ji ber ku hikûmetê hemû pereyên bankeyan biribûn, wê yekê jî pirsgirêkek cidî ji me re çêkir.

……

[51] Di çarçoveya projeya pêşniyarkirî ya Amerîkayê û hevpeymanên wî welatî de, **Konseya Ewlekariya Navdewletî** di **5'ê Nîsana 1991'an biryar 688'an** derxist. Di çarçoveya wê biryarê de, **xeta veqetandinê ya 36'an hat destnîşankirin, bi wê yekê êdî hêza esmaniya Iraqê nedikarî bakurê wê xetê bombebaran bike. →**

Bi taybetî hejmareke zaf karmend hebûn ku hikûmetê bi mebestên xwe yên taybet damezrandibûn. Vê jî zêdetir pirsgirêk aloz kir[52].
Sala 1992'an hilbijartin hat kirin û encamam wê ji bo her du aliyên sereke nêzîkî hev bû, her du alî jî nerazî bûn.

Wekî YNK'ê me li Silêmanî, Hewlêr û Kerkûkê piraniya dengan bi dest anî, PDK'ê tenê li Dihokê piranî bi dest xist, lewma me got ku wan sextekarî kiriye û hejmara dengê wan ji hejmara şêniyan zêdetir e. Gumana wan jî li encamên me hebû.

Paşê Komîsyona Serperestîkirina Hilbijartinê 44 kursî da me û 44 jî da PDK'ê û 12 jî da partiyên biçûk, ji ber ku wan partiyan kursiyên para xwe qebûl nekirin, komîsyonê 50'î kursî da me, 50 jî da PDK'ê û 5 kursî jî da Asûriyan.

PDK'ê xwest ku em di navbera posta Serokê Hikûmetê û Serokê Parlamentoyê de yekê hilbijêrin. Me serokê hikûmetê hilda û wan jî serokê parlamentoyê.
Kabîneya hikûmetê bi serokatiya Dr. Fuad Mesûm pêk hat û Dr. Roj Nûrî Şaweys jî wek cîgirê serokê hikûmetê het destnîşankirin.

……

→**Dewama [51]** Esmanî navçeyên kurdistanî yên bakurê xeta 36'an ji aliyê hêza esmaniya hevpeymanan ya bi navê "**Çekûçê Amade**" li "**Baregeha Încerlîkê**" ya **NATO**yê ve li **Bakurê Kurdistanê** dihat parastin.

[52] Hikûmeta Iraqê di **24'ê Cotmeha 1991'an** de, **tevahiya rêveberê û saziyên xwe ji bilî eletrîkê ji parêzgehên Hewlêr, Silêmanî û Dihokê vekişandin**, bi wê yekê jî desthilata rêvebirinê li deverê rastî pirsgirêk û astengiyan bû.

Post û erkên din jî di navbera her du partiyan (YNK û PDK'ê) de hatin parvekirin.

❖ Di nav hikûmetê de pirsgirêkên we hebûn?

Na, di nav hikûmetê de pirsgirêkên me nebûn. Ji bilî hinek nakokiyên veşartî, karûbar bi awayekî baş birêve diçûn. Li gorî wê yekê, me guman dikir têkilî di navbera PDK'ê û hikûmeta Iraqê de hebe.

Di gera duyem de, **Kosret Resûl Serokê** Encumena Wezaran bû. Hevahengiya navbera me gelekî baş bû, em bi hev re diçûn derveyî welat, her aliyekî dikarî bi navê aliyê din daxuyaniyê bide.

Rewş bi vî awayî heta sala 1994'an berdewam bû, heta wê demê ku **Bûyera Qeladizeyê** qewimî. Wê demê, ez li derveyî welat bûm, ew yek bû sedema derketina şer di navbera me de.

❖ Yanî şerê navxwe li Kurdistan derket?

Min gelek hewl da ku şer were rawestandin, bi Kekê Mesûd re têkilî danî, ser wê esasê ku peywendiyeke me taybet hebû. Hinek şertên wî hebûn min qbûl kirin, yek ji wan vekişiyana hêzên me bû ji Şeqlawe û çiyayê Sefînê, ji ber ku hêzê me li wê derê nêzîkî baregeha wî bûn.

Di praktîkê de me hêzên xwe vekişand, lê bi şertekî ku hêzên wan nekevin wê navçeyê. Wê demê pêwîst bû Kekê Mesûd ji bo îmzekirina peymana navbera me, bi amadebûna Serokê wê demê yê Fransayê Fraswa Mîtran bihata Parîsê, lê ew nehat.

Piştî wê yekê, hêzên wan êrişî ser mala min li Şeqlaweyê kirin û ofîsa min şewitandin.

PDK’ê berevajî soza dayî, li Şeqlaweyê dest danî ser bargehên me. Lewma careka din li sala 1995’an şer di navbera me de derket.

Tevî ku Amerîkî hatin ser xetê û biryara Parlamentoya Kurdistanê di wê barê de hebû, her wisa kesatiyên olî jî di nav hewldanan de bûn, lê hêzên PDK’ê her berdewam bûn li ser şerkirinê. Berevajî, me her cure navcîtiyek qebûl dikir, cara dawiyê me her du aliyan navcîtîkirina Îranê qebûl kir.

Mesûd Barzanî daxuyaniya rawestandina şer weşand. Dest bi danûstandinê hat kirin, l**ê bi êrişeke şikestî ser Hewlêrê dubare şer serî hilda** û tevahiya navcîtiyan jî, bê encam bûn.

❖ Cara dawiyê PDK’ê daxwaza alîkariyê ji Iraqê kir?

Agahiyên me nîşan didan, têkiliyek di navbera PDKê’ û hihkûmeta Iraqê de heye û 12 tank û hejmarek çek wergirtine. Piştî bê encamiya navcîtiyan, nişkeve wan daxwaza civîna polîtburoyên her du partiyan kir, lê ew civîn jî her nehat kirin.

Tevî ku min amadebûna xwe nîşan da, serdana Kekê Mesûd bikim, daxwaza me bê bersiv ma.

Piştî dorpêça Hewlêrê, roja **31’ê Tebaxa 1996’an** hêzên PDK’ê bi alîkariya **Garda Komariya Iraqê**, êrişî me kirin. Hêzeke mezin ya Iraqê li derdora Hewlêrê hatibû bicih kirin. Me Amerîkî ji xetera rewşê agahdar kir, lê wan gotin: **“Çavdêriya rewşê dikin.”**

Dema ku min têkilî bi **Alîkarê Wezîrê Derve** yê **Amerîkayê Bîltro** re danî, gelek eşkere got: **“Sedam û Masûd Barzanê dê baceke giran bid-**

in.”Got jî: **“Eger wê bêaqiliyê bikin, encamê ji bo wan gelek metirsîdar be.”**

Piştî zêdebûna hejmara hêzan, min careke din têkilî bi Bîltro re danî, dubare wî piştrastî da. Min gotê: “Ez hesabê li ser van gotinan bikim?” Wî got: **“Eger karekî wiha ji aliyê PDK’ê û hikûmeta Iraqê ve bê kirin, bertekeke me ya xurt dê hebe.”**

Paş hingê şandeyek amerîkî ji bo agahdar bûnê ji rewşê serdana me kir û got: “Ger ew hêla germ derbas bikin, em ê derbeyeke mezin li wan bidin.”

Me ji li ser wê esasê plan danî, eger li me nîzîk bin, hêzên amerîkî dê li hêzên iraqî bidin, bi wê yekê mecalê hebe, em hejmarek zêde çekan bi dest bixînin, yên ku di cih de dihêlin.

Lê mixabin ew yek şaş bû. Me dikarî plan dayna yên ku di nav bajêr de bûn rizgar bikin, çimkî wê demê hevjîna min û endamên polît-buroyê li Hewlêrê bûn. Li aliyekî din, me dikarî baregeh û cihên din vala bikin, çekên giran û mal û milkên xwe bibin û plana berevaniyê bi cih bînin.

Destpêkê me karî êrişa PDK’ê bişkênînin, lê me nedikarî rûbirûyê êrişa bi sedan tankên artêşa Iraqê bibin ku rijyabûn nav bajarê Hewlêrê.

Sibeha roja îniyê li baregeha xwe li Qelaçuwalanê li nêzîkî Silêmani-yê bûm, min têkilî bi amrîkiyan re danî, gotin: “Çavrê bin.” em heta piştî nîvro li bendê bûn, wê demê gotin: “Konseya Ewlekariya Nav-dewletî di civînê de ye û dê biryara xwe dide.”

❖ Amerîkiyan ji ber têkliya bi Îran û Sûriyeyê re tu ceza dan?

Wiha digotin, lê di vir de mijar, şikandina opozîsyona Iraqê jî hebû. Min jî dipirsî çima?

Wê demê navend, senter û xelkê Amerîkî bi xwe jî li Hewlêr hebûn, wek mînak Kongreya Neteweyî ya Iraqê (INC) ku Ehmed Çelebî serokê wê bû. Tevgera Wifaq a Neteweyî, ku sekreterê wê yê giştî Eyad Elawî bû. Wan gelek ziyan dîtin û bi dehan kes ji wan hatin kuştin û bi dîl girtin.

❖ Destpêkê Hewlêr û piştre jî Silêmanî girtin?

Belê, destpêkê wan Hewlêr girtin, piştî êrişa artêşa Iraqê ya berfireh û ketina wan a bi nav Koyeyê, me biryar da, rasterast bersivê nedin û bi awayê partîzanî şer bikin, ew jî bû sedem heta Silêmaniyê bikevin tevgerê û vekişin çiyan da ku, ziyana me ya canî wekî Hewlêrê çê nebe.

Piştre me pêşniyara amrîkiyan ji bo agirbestê qebûl nekir. Paş hingê di daxuyaniyekê de Alîkarê Wezîrê Derve yê Amerîkayê Bîltro li kongrêsê ragihand, dibe ku Celal Talebanî rijd be li ser şer ji bo vegerandina navçeyên xwe û got: **“Talebanî daxwaza min retkiriye.”**

Dema ku me zanî, mebesta artîşa Iraqê tenê bajarê Hewlêrê ye, me dest bi dije êrişê kir. **Di 10’ê Cotmehê de me gelek bilez Silêmanî girt, piştre Koye û gihîştin derdora Hewlêrê.**

Piştî wê yekê, em rastî du bûyeran bûn:

Ya yekem: Hikûmeta Iraqê bi tundî em agahdar kirin, eger bikevin nav Hewlêrê, ew ê bi tevahiya hêza xwe êrişî me dikin û vê carê berteka wan ji ya Tebaxê dijwartir dibe.

Ya duyem: Têkiliya Bîltro bû ku daxwaza aramkirina rewşê ji min kir, da ku serokatiya wê demê ya Amerîkayê şermezar nebin ku nêzîkî hilbijartinê dibûn. Ji ber ku berdewamiya şer û çûna nav Hewlêrê, dibû sedem artêşa Iraqê bertekeke tund bide, wê yekê jî îdareya Amerîkayê rastî rewşeke nexweş danî, lewma Bîltro soza çareserkirina wê pirsê da.

Lê piştî nirxandina rewşê, me biryar li ser berdewamiya şer da, çimkî di berjewendiya me de bû.

Alîgrên PDK'ê hetta Mesûd Barzanî, ku li Silêmaniyê bû ji rêya Kerkûkê reviya Hewlêrê. Me dikarî Hewlêr û navçeyên din rizgar bikin, lê Amerîkî û Brîtaniyan bi lez em rawestandin.

Beşa Sêyem

Çîroka Peydakirina Mela Mistefa Barzanî Li Moskowê

Pêşgotin

Celal Talebanî di sala 1933'yan de li gundê **Kelekan** nêzîkî bajarê **Dûkanê** girêdayî parêzgeha Silêmaniyê ji malbateke eşîra Zengene ya parçekirî di navbera Îran û Iraqê de ji dayik bûye.

Li Koye, Kerkûkê û Hewlêrê xwendiye û li Bexdayê koleja yasayê temam kiriye. Di temenê tazelawiyê de çûye nav tevgera Kurd, bi taybetî jî "**Partiya Demokrat a Kurd- Iraq**" ku **Partiya Demokrat a Kurdistanê**, ya niha berdewamiya wê partiyê ye[53].

……

[53] Di kongreya yekem de a **16'ê Tebaxa 1946'an Partiya Demokrat a Kurd- Iraq** hebûna xwe ragihand.
Piştre di kongreya sêyem de navê wê hat guhertin û bû "Partiya Demokrat a Kurdistan – Iraq".
Di sala 1957'an de piştî yekbûna basên Îbrahîm Ehmed û Hemze Ebdullah û tevlêbûna hejmarek Kurdên nav Partiya Komunîst a Iraqê, navê wê bû "**Partiya Demokrat a Yekgirtû ya Kurdistanê**".
Di kongreya çarem de li 7'ê Cotmeha 1959'an, navê wê hat guhertin û bû "**Partiya Demokrat a Kurdistanê**".
Piştî serhildana mezin a gelê Kurd li Başûrê Kurdistanê, di kongreya 11'an de li Tebaxa 1993'an, piştî ku Partiya Yekgirtin, Yekîtiya Demokrat a Kurdistanê û Tevgera Feylî ya Misilman tevlî wê bûn, dîsa navê wê hat guhertin û bû "**Partiya Demokrat a Kurdistan-Yekgirtû**".
Cara dawiyê di kongreya 12'an de li Hezîranan 1999'an navê wê bû "**Partiya Demokrat a Kurdistanê**".

Di vê beşê de Sekreterê Giştî yê Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistanê (YNK) Celal Talebanî, behsa **çawaniya peydakirina Mela Mistefa Barzanî li Moskowê dike.**

Wê demê Talebanî ji bo beşdarîkirinê di Festîvala Yekîtiya Lawan a Demokrat diçe Moskowê.

Di serdana xwe ya pêştir de, wî hewl dabû nav û nîşanan cihê mayîna **Mela Mistefa** peyda bike, lê nekarîbû.

Naveroka
Beşa Sêyem a Hevpeyvînê

❖ Te çawa Mela Mistefa Barzanî li Moskowê peyda kir?

Piştî ku ez gihîştim Moskowê, ji bilî beşdarîkirina festîvalê, xema min dîtina **Mela Mistefa** bû, bi her awayekî be.

Her wisa min dixwest diyariyekê pêşkêşî dayika "**Zoya**" bikim. Zoya keçeke rûsî bi navê "**Ana Dîmovska**" bû, bi paraşûtê dadikeve pişt hêzên almanî, gelek bi çelengî şer dike, dema tê dorpêçkirin, teslîm nabe heya canê xwe feda dike. Birayekî wê jî efserê artêşa Sovyetê bû, ku di şerê Berlînê de hatibû kuştin. Ew diyarî nîşana rêzgirtinekê bû ji wê dayikê ku du qehreman anîbûn dinyayê.

Armanca sereke ya çûna me pirsa Kurd bû, min hez dikir di nav şandeya Iraqê de beşdar bibin û amadeyiya me jî hebe. Peyveke nihênî wek parola di navbera min û **Mehdî Haşim Necefî** de hebû, ku wek nîşaneyeke hevbaweriyê dihat hesib.

Berevajî yên din ku piştî nîvro diçûn derve, lê ez li hotêlê dimam da ku ji endamên Partiya Komunîst agahiyekê ji **Mela Mistefa Barzanî** bi dest bixim an Mela Mistefa bi xwe bi min re têkiliyê dayne.

Rojekê du kes hatin û bi rûsî bi min re axivîn, lê min da femkirin ku zimanê rûsî nizanim. Gotin. "Em ji bo dîtina hevalekî hatina bi navê **Celal Talebanî**."

Min gote wan: "Ez bi xwe me." Wan daxwaza nasnameyê kirin. Piştî çend axaftinan û eşkerekirina wê peyva nihênî ya di navbera min û Mehdî Haşim Necefî de, ku peyveka erebî bû. Wan jî xwe dan naski-

rin, navê yek ji wan "**Es'ed Xoşewî**" bû, ku yek ji kesên nêzîkî Mela Mistefa bû.

Ez bi wan re çûm apartimanekê û bi hêviya dîtina Mela Mistefa bûm, niha nikarim hesta wê kêliyê ji te şirove bikim. Dema min Mela Mistefa dît, wî simêlê xwe kur kiribû, ew wêneya wî ya bi wî rengî heye, min girt, lê paşê belav bûye.

Em rûniştin gelekî axivîn. Me behsa rewşa malbata wî û keç û kurên wî kir. Bi taybetî Sabîrê kurê wî yê rehmetî ku piştî çûna bavê xwe ji dayik bibû; wî hîn ew kurê xwe nedîtibû ku piştre li Bexdayê hat kuştin.

Mela Mistefa tu tiştek derbarê çarenivîsa Mesûd nedizanî. Ji bo agahiya we dayika Mesûd Barzanî Zêbarî ye, xwişka Hoşyar Zêbarî û keça **Mehmûd Axayê Zêbarî** serokê eşîra Zêbarî ye. Di navbera wan û Barzaniyan de dijminatî hebû, her tim ew di nav rêzên hikûmetê de bûn. **Di serdema paşatiyê de jî endamê parlamentoyê bû**. Kekê Mesûd di zaroktiyê de li mala bapîrê xwe dima. Wêneya **Mesûd**, **Şêx Ehmed**, **Şêx Ubeydullah** û **Loqman** bi min re bûn.

Dema Mela Mistefa wêneya Şêx Ehmedê birayê xwe yê mezin dît, gelekî kêfxweş bû. Min gotê: "Şêx Ehmed navê kurê te yê biçûk kiriye Sabîr." Ji koma agahî û nûçeyên ku min gihande wî, tenê ji wê yekê xembar bû, dema min got:

"Keça wî bi **Ebdul Eelam** kurê **Şêx Silêman Barzanî** birayê '**Ebdul Muheymin Barzanî**' re zewiciye." çimkî **navbera Mela Mistefa û Şêx Silêman gelekî xirab bû**.

Ji min pirsî: "Kê biryara wê zewacê daye?"

Min got: “Şêx Ehmed.”

Di rastiyê de hemiyan rêza Şêx Ehmed digirtin. Mela Mistefa çend kêliyan bêdeng bû. Piştî wê hevdîtinê û nasîna cihê mayîna wî, min çend carên din jî serî lê dan.

Li wê derê min *Şehîd Mihemed Emîn Mîr-Xan* naskir ku egîdekî şoreşa Kurd bû. Wê demê li xwendingeheke hizbî de mijûlî xwendinê bû. **Ev jî cara yekem bû ku min Mela Mistefa Barzanî rû bi rû didît.**

❖ Hemû caran wek serokê PDK’ê dihat hilbijartin?

Belê, di tevahiya kongreyên PDK’ê de, Barzanî wek serokê partiyê dihat hilbijartin.

❖ Di yekem dîtina Mela Mistefa de, wek semboleke siyasî çi wateyek ji bo te hebû?

Dîtina wî di wê demê de, mîna vê yekê bû ku dewrêşek şêx û rêberê terîqeta xwe dibîne. Bi rastî nikarim behsa hesta xwe ya wê kêliyê bikim. Me di nav PDK’ê de Mela Mistefa Barzanî gekekî mezin û xwedan rûmet dizanî.

❖ Piştî wê hevdîtinê çi tiştên din qewimîn?

Me mijarên cûr bi cûr nîqaş kirin û min li ser hinek mijaran nêrîna wî wergirtin. Di nav wan de parçebûna ku di nav partiyê de çêbibû. Mela Mistefa alîgirê yekbûna hewldanan bû. Em li ser têkiliyên bi eşîran re axivîn û ji min xwest ku ez wan têkiliyan xurt bikim.

Derbarê têkiliyên me bi rûsan re, di vê baweriyê de bû nabe têkiliyên me bi wan re sînordar bimîne. Wî hetta ji min re got: “Divê em hewl bidin ku bi rêya **Babe Elî Şêx Mehmûd**, wezîrê berê yê hikûmeta

Iraqê, bi rojava re têkiliyê daynin ku têkiliya wî bi rojava re bi taybet bi Îraniyan re hebû.

Wî dixwest bizanibe **ez ji hêla rewşenbîrî û baweriyê çawa difikirim, dixwest min biceribîne ka heta çi astekê baweriya min bi dijatiya împeryalîzmê û paşketinê heye û çi qasî dixwazim têkiliyên bi bloka sosyalîst re pêş bixim.** Bi awayekî heyrmayî min jê pirsî: **"Em çawa dikarin bi wan re têkiliyê daynin?"**

Wî got: "Guh bide min û here." Wî ji min xwest da ku di hundirê welêt de bi hinek kesan re têkiliyê daynim. Ji wan **Şêx Letîf kurê Şêx Mehmûd** birayê **Babe Elî** bû. Peyveke nihênî jî di navbera wan de hebû. Min jê xwest ji çend kesatiyên nav welêt re nameyê binvîse û çend wêne jî min jê wergirtin da ku wek diyarî bibim ku bi destxetê xwe li ser wan nivîsîbû.

Her wisa min jê xwest ji rêya navnîşaneke hertimî haya me ji hev hebe, ew nav û nîşan yek li Taşkendê û ya din jî li Moskowê bû, ku têkilî ji rêya konsulxaneya Sovyetê li Şamê dihat danîn.

❖ Dizanî wek serokê PDK'ê hatiye hilbijartin?

Belê, sala 1955'an bi rêya nameyekê min ew yek gotibû wî. Mesûd Barzanî di pirtûka xwe ya bi navê "Barzanî û Tevgera Rizgariya Kurd" de naveroka wê nameyê belav kiriye.

❖ Wê demê te hest pê kir ku ew hez dike vegere?

Nexêr, hêviya wî ya vegera nêzîk nebû, ji ber ku Iraq ji bo înglîziyan welatekî girîng bû, her ew yek jî bibû sedema mayîna wî li Sovyetê. Min behsa hevdîtina xwe û Ebdul Hemîd Tesabhiçî û çawaniya ber-

firehkirina xebatê di nav Iraqê de û gefên Tirkiyeyê li ser Sûriyeyê kir. Xwest di wê mijarê de xebata min berdewam bibe.

Piştî vegerê, min serdana hejmarek hevalan kir ji wan, **Kemal Fuad** û **Ebdul Rehman Zebîhî**. Me bi hev re serî li **Ebdul Hemîd Sirac, Mîşêl Efleq** û **Ekrem Horanî** da. Mîşêl Efleq bi awayekî giştî bi me re axivî û me tiştek jê fem nekir.

Lê Rêzdar Ekrem Horanî, wê demê Serokê parlamentoya Sûriyeyê bû, zilamekî sade bû, behsa nasîna hejmarek cotkarên Kurd li devera Hemayê kir. Wê demê, bi Partiya Sosyalîst a Ereb re dixebitî û soz da li Sûriyeyê û Iraqê alîkariya partiya me bike.

Di serdana Ebdul Hemîd Sirac de, me behsa plana xebata hevpar û rêxistina hevdîtinekê di navbera Cemal Ebdul Nasir û Mistefa Barzanî de kir, di dema serdan Ebdul Nasir a Sovyetê de ji bo lihevkirinê li ser têkiliyên Ereb – Kurd û rewşa Iraqê.

Ji aliyê xwe ve, **Ebdul Hemîd Sirac xwest xebata Kurdên Sûriyeyê zêdetir li ser Tirkiyeyê be,** hevdem piştgiriya xwe ji bo wan nîşan da. Derbarê Kurdên Iraqê jî got: **“Eger dixwazin xebata çekdarî bikin, em ê alîkariya we bikin.”**

Min gotê: “Pêdiviya me bi çekan heye.” Wî jî got: “Baş e.”

Ew yek ji beşên herî girîng ê lihevkirinê bû, da ku em fişara li ser Nûrî Seîd zêde bikin.

Paş hingê me xwedê jê razî Kemaledîn Refet li Şamê dît. Efserekî rizgarîxwazê Misrê bû. Me behsa têkiliyên bi Misrê re kir, me çend daxwazî dan wî, da ku bigihîne serokatiya Misrê.

Daxwazên her girîng ev bûn:

1. **Vekirina Radyoya Kurdî li Qahireyê**
2. **Pêşwazîkirin ji şandeya Kurd**
3. **Rêxistina hevdîtina Mela Mistefa û Ebdul Nasir, li Moskowê**

Piştî heyamekê, em hatin agahdar kirin ku Serok Ebdul Nasir, ew daxwaziyên me qebûl kirine.

Di sala 1957'an de Radyoya Kurdî li Qahireyê hat vekirin. Amadekarî ji bo çûna şandeya kurdî ji bo serdana Misrê hat kirin, ku pêk dihat ji: Îbrahîm Ehmed û Mihemed Seîd Xefaf, bi armanca hevahengiya pêwîst a hevdîtina Mela Mistefa û Cemal Ebdul Nasir.

Paş heyamekê ji karkirina Radyoya Kurdî, **balyozê Tirkiyeyê** serdana Cemal Ebdul Nasir dike û behsa dilgiraniya Tirkiyeyê li hember karkirina Radyoya Kurdî dike, Ebdul Nasir dibêje:

"Hûn dibêjên Kurd li Tirkiyeyê nîne, peyamên radyoyê ji bo Kurdên Sûriyeyê û Iraqê ye, çima hûn ditirsin?"

Di bersivê de, balyozê Tirkiyeyê dibêje: **"Cenabê serok, Kurd li Tirkiyeyê jî heye."**

Ebdul Nasir kaxizekê didê da ku li ser binvîse Kurd li Tirkiyeyê jî heye, da ku di wê barê de fermana tedbîrên pêdivî bide. Sala 1957'an, tiştek qewimî û bandor li têkiyên me û Partiya Komunîst a Iraqê kir. Çimkî şaxeya Kurdistanê ya Partiya Komunîst a Iraqê, plana bi hev re karkirina bi PDK'ê re pêşkêş kiribû.

Bi vê wateyê ku her du partî di bin **serokatiyek hevpar** de xebatê bikin. Lê Partiya Komunîst a Iraqê ew plan qebûl nekir, **tevî ku di kon-**

greya 1956'an de wan projeya mafê çarenivîsê yê Kurd wekî ereban pejirandibû.

Her di wê salê de ango 1957'an ku mijara **Eniya Yekîtiya Neteweyî** di rojevê de bû. Wek Partiya Demokrat a Kurdistanê me xwest biçin nav wê eniyê, lê Partiya Beis bi vê hincetê ku me nas nakin û nizanin em çi dixwazin, dijatiya beşdariya me di eniyê de kir.

Ev jî di demekê de bû ku pêştir Partiya Komunîst a Iraqê li dijî şaxeya wê partiyê ya Kurdistanê derketibû, ji ber wê yekê **hejmarek ji kadroyên wan ên payebilind wek Kemal Fuad, Hemîd Osman, Salih Heyderî û hejmarek kadroyên din, hatin nav PDK'ê.**

Wek bertekekê jî Partiya Komunîst a Iraqê daxuyaniyek ser navê "**Plangerî û Kevneperestî**" weşand û tê de diyar kir; Partiya Demokrat a Kurdistanê cudaxwaz e û dijî xebata çîna karkeran e.

Ji ber wê yekê têkiliyên navbera me xirab bû. Piştî serketina Şoreşa 14'ê Tîrmehê, em çû nav "Eniya Yekîtiya Neteweyî" tu partiyekê jî dijatiya me nekir.

Piştî yekbûna Misrê û Sûriyeyê û avakirina **Komara Erebî ya Yekbûyî** di Sibata 1957'an de rewş hat guhertin û pêdivî bû em jî ji nû ve dest pê bikin.

Bi helkefta yekbûna Misrê û Sûriyeyê, me nameyek pîrozbahiyê ji Serok Cemal Ebdul Nasir re şand, tevî piştgiriya wê pêngavê, daxwaza mafên Kurdan jî kir. Wê demê du bizav li Iraqê hebûn.

1. **Bê merc û bi coş pişta Komara Erebî ya Yekbûyî digirt.**
2. **Daxwaza sebirkirin û bi rojevkirina pêvajoya demokrasî û pirsa neteweyî dikir.**

Yekbûna Misrê û Sûriyeyê bandor li navxwe ya Iraqê kir, wek mînak çalakiyên neteweyî zêde bûn, li Kurdistanê xelkê şahî kirin û aheng rêxistin.

Her di wê salê de me û beskê bi navê **Eniya Partiya Demokrat a Kurd-Iraq**, li ser yekbûnê li hev kir. Piştî ku min Mela Mistefa li Moskowê dît û ser wê yekbûnê em axivîn. Wî razîbûn li ser yebûnê nîşan da û hilbijartina xwe wek Serokê **Partiya Demokrat a Yekbûyî ya Kurdistanê** pejirand. Sedema veqetyana wê grûpê, guhertina navê Kurd bi Kurdistanê bû.

Dema Şoreşa 14'ê Tîrmeha 1958'an qewimî, li Kurdistanê rastî berteka me ya piştgirî û xwe dûrxistinê hat. Bi taybetî li Silêmanî, Kerkûk û Hewlêrê, me hewl ji bo razîkirina kesên leşkerî yên di nav PDK'ê û aliyên din da, heta pişta şoreşê û komarê bigrin.

Wê demê ez bi awayekî veşartî li Silêmaniyê dimam. Li avahiya "Ereb Neciye" djiyam û min navê xwe kiribû Mihemed. Sibeha zû erebaneçiyekî bangî min kir û got: "Li Bexdayê şoreş çêbûye û dawî bi melîk hatiye anîn, li şûna wî Babe Elî danîne."

Min gotê: "Kekê Ebdullah dev jê berde bihêle ze razêm[54]." Got: "Biçe guh bide radyoyê," diyar bû rast digot. Min bi lez cilên xwe li ber kir û çûm nav bajarê Silêmaniyê û min heval kom kirin, me karî bilindgoek û otomobîlekê ji şaredariyê werbigrin.

……

……

[54] Celal Talebanî di hevdîtina bi **Îrfan Qaneî Ferd** re behsa vê yekê kiriye; şeva **14'ê Tîrmeha 1958'an**, li mala Qadir Tegeranî bûye, wê demê nasnavê wî "**Ebdullah**" bûye ne Mihemed. Her wisa gotiye; Kesê ku nûçeya serketina şoreşê gihandiye wî "**Qadir Tegeranî**" bûye ne erebaneçiyek bi navê Ebdullah.

Mihemed Hacî Tahîr bi wê bilindgoyê û dengê xwe yê zelal welatiyên bajêr anîn coşê.

Wê rojê, yekem car bû ku piştî çend salan xwe veşartinê, eşkere derketim û min gotarek pêşkêş kir û ji xelkê xwest pişta şoreşê û komarê bigirin. Me fermandarê leşkergehê neçar kir ku peyama piştgiriyê bişîne. Roja duyem em li Kerkûkê cviyan û me daxuyaniya xwe ya navdar weşand ku pişta komarbûna Iraqê digirt.

Me hejmarek kes wek nûner li navçeyên cuda yên Kurdistanê ji bo çûyîna Bexdayê û gihandina peyama piştgiriya Komara Iraqê amade kirin.

Rêzdar Îbrahîm Ehmed li ber avahiya Wezareta Berevaniyê di axaftinekê de, xwest hemû pişta Komara Iraqê bigirin, çimkî nûnertiya Kurd û Ereban dikir û bingeha demokrasiyê bû, hevdem wî daxwaza mafê xweseriyê ji bo Kurdistanê kir.

Guhê Ebdul Kerîm Qasim li axaftina Îbrahîm Ehmed bû û bersiv da û got: **“Iraq welatê hemiyan e û divê ruhê biratiya Kurd û Ereban xurt bikin.”**

Paşê dema gotûbêjên derbarê nivîsîna destûra demkî ji bo Komara Iraqê, nûnerên me ku ez bi xwe jî yek ji wan bûm, me hewl da fermandarên Eniya Yekîtiya Neteweyî razî bikin, birgehekê li ser xweseriyê bixin nav reşnivîsa destûrê. Nêrîna eniyê bi vî awayî bû, ku birgehek li destûra Partiya Neteweyî ya Demokratîk bê zêdekirin ku dibêje:

“Kurd û Ereb di welat de hevpar in û divê destûr wan mafên neteweyî di çarçoveya Yekîtiya Neteweyî ya Iraqê de bi cih bike.”

Lê me daxwaza zêdekirina vê naverokê dikir, ku dibêje:

“Kurd û Ereb di welat de hevpar in û destûr jî îtirafê bi mafên neteweyî dike, di nav de jî xweserî di çarçoveya Yekîtiya Neteweyî ya Iraqê de.”

Her çend ew yek nehat qebûlkirin, lê dîsa jî me wek pêngavek pozîtîf lê nihêrî. Her diviya, heta damezrandina saziyên destûrî û hilbijartina parlamentoyê em hinekê li bendê bana. Her wisa hesteka neteweyî ya gştî jî hebû pêdivî dikir em jê re alîkar bin.

Me îzna weşandina Kovara “**Rizgarî**”[55] û **bexişandina Mela Mistefa Barzanî, yên pê re û girtî û sewqkiriyan wergirt.**

Her wisa Ebdul Kerîm Qasim ji bo komkirina wan kesan ên di rewşeke taybet de hatibûn awarekirin, biryara avakirina gundê kurdî da, her wisa ji xezîneya gştî bûdce jê re hat taybetkirin.

Ji rêya balafirxaneya Qahireyê em benda vegeriyana Mela Mistefa Barzanî bûn. Piştî çendîn têkiliyan, serokê wê demê yê Misrê Cemal Ebdul Nasir, daxwaza wî pejirand.
Wê demê pirsek hebû ku bibû sedema nakokî û cudahiyê; ew jî pirsa yekbûna bilez a Iraqê bi **Komara Erebî ya Yekbûyî** re bû.

Piştî nirxandin û gotûbêjkirina wê pirsê, Partiya Demokrat a Kurdistanê helwesta xwe diyar kir, ku bi kurtî bi vî awayî bû:

“Gelên welatê Ereb mafê wan heye li ser çarenivîsa xwe biryarê bidin. Gelê Ereb yê li Iraqê jî mafê wî heye biryarê li ser çawaniya têkiliyê bi gelên din yê welatê Ereb re bide.

……

[55] Hejmara yekem a Kovara “**Rizgarî**” di **10’ê Sibata 1959’an** de hatiye weşandin. Xwedan îmtiyaz Salih Heyderî, sernivîskar Fuad Cewad û **rêveberê nivîsînê Celal Talebanî** bûye. Bi gştî sê hejmarên wê hatine weşandin û piştre rawestiyaye.

Wekî gelê Kurd mafê me nîne ku li hember wê yekê îtirazê bikin. Di heman demê de, pişta her biryarekê digrin, li ser wê biryarê gelê Iraqê hevnêrîn be, lê bi şertekî; yekem demokrsiyê garantî bike, duyem dayîna mafên neteweyî yên gelê me garantî bike".

Lê wê helwestê nekarî partiyên din razî bike. Ev jî bû sedem ku di navxweya PDK'ê de nakokî derkevin. Lewma PDK bi ser du baskan de parve bû. Baskekî xwe da aliyê Partiya Komunîst a Iraqê, baskê din jî, tekez li serxwebûna biryara PDK'ê dikir. Sekreterê Giştî yê PDK'ê Îbrahîm Ehmed jî ketibû navbera her du baskan. Lê belê ez li ser helwesta serxwebûnê re bûm.

Partiya Komunîst a Iraqê bîr û raya giştî xistibû destê xwe. Li aliyê din, Şehîd Fuad Rikabî, gelek hewl da ku Mîşêl Efleq bi berçav girtina taybetiyên dewleta Iraqê, pêkhateyên olî û neteweyî razî bike, lê Mîşêl Efleq gelek rijd bû li ser nêrîna xwe û dubare dikir, ew taybetmendiya Iraqê bi xwe dibe sedem ku yekbûn pêk were.

Ez di vê baweriyê de me; **him xeta tund a yekbûnê ya Beisiyan, him jî xeta yekîtiya federaliyê ya Partiya Komunîst şaş bûn, çimkî Beisiyan yekbûn nedixwestin, komunîstan jî yekîtiya federalî nedixwestin.**

Wê nakokiya kûr a nav PDK'ê bandor li çalakiyên komîteya navendî kir, tevî ku piraniya komîteya navendî alîgrên serxwebûna biryarên partiyê bûn, di hember de mêla piraniya polîtburoyê li ser Partiya Komunîst bû.

Ew yek bû sedem ku ez û Hemîd Osman ji polîtburoyê derketin, bi vî mercî ku di heyama mehekê de civîna komîteya navendî bê lidarxistin lê mixabin civîn nehat kirin.

Têkçûna “**Darbeya Şewaf**”[56], berfirehbûna tevgera komunîzmê û navderxistina Ebdul Kerîm Qasim wek kesatiyekî komunîst, bûn sedem ku kontrola desthilatê bikeve dest alîgirên komunîzmê û bi wê yekê Mela Mistefa biçe ser xeta wan.

Cara dawiyê karîn bi îmzeya Mela Mistefa biryara rawestandina çalakiyên min ên PDK’bûnê bidin, ku berevajî yasaya navxwe ya PDK’ê bû. Piştî razîbûna hikûmetê li ser vegera Mela Mistefa, bi fermana Ebdul Kerîm Qasim Iraqê pasport dan wî, Mîr Hac Ehmed û Es’ed Xoşewî.

Ji aliyê xwe ve, me jî şandeyek pêkhatî ji Îbrahîm Ehmed, Nûrî Ehmed Teha, Ubeydullah û Sadiq Barzanî amade kir da ku li Pragê pêşwaziya Mela Mistefa bikin û agahiyan derbarê pêşhatên dawî û nakokiyên bi Partiya Komunîst a Iraqê re bidinê.

Piştî pêşwazîkirinê, ew şande digel Mela Mistefa diçin Qahireyê û di Îlona 1958’an de dibine mêvanên Serokê wê demê yê Misrê Cemal Ebdul Nasir. Ebdul Nasir gelek bi germî pêşwaziya Mela Mistefa kir. Bi fermaneke serokatiyê wî serî li Port Seîd da û ji nêzîk ve encamên şerê dijminatiya ser Misrê dît.
Ew serdan bû sedema dilgiraniya komunîstan; ji ber ku serokatiya wan di vê baweriyê de bû, ku ew serdan ji aliyê me ve hatiye rêxistin. Lewma li dijî me dest bi propagandayê kirin û navê **Kurdên Beisî**

……

[56] Tevgera Şewaf ango Darbeya Şewaf di **8’ê Adara 1959’an** de, bi serokatiya efserekî bi navê Ebdul Wehab Şewaf li bajarê Mûsilê bi alîkariya Komara Erebî ya Yekbûyî dest pê kir; armanca wan a sereke **dawîanîn bi desthilata Ebdul Kerîm Qasim**, **hember derketina komunîzmê** û **hevpamaniya hikûmet û hêzên pêşverû bû**. Lê di **9’ê Adara 1959’an** de, piştî kuştina Ebdul Wehab Şewaf û girtina hejmarek serkirde û alîgirên wî, dawî pê hat.

li me kirin, ku xwedêgiravî em dixwazin **Komara Yekbûyî ya Sûriyey, Misr, Iraq û Kurdistanê ava bikin.**

Piştî vegera Mela Mistefa, li ser wî hevrikî di navbera me û komunîstan de derket, ji ber ku ji bo pirsa Kurd kesatiyekî mezin û xwedan biryar bû, lewma komunîstan hez dikirin Mela Mistefa bikişînin nav xwe lê cara dawî em serketin.

Wê demê ez berdevkê Mela Mistefa bûm, tevahiya gotar û axaftinên wî min dinivîsîn. Pirsgirêka yekem a ku Mela Mistefa pê re rû bi rû bû, nakokiyên navxwe yên PDK'ê bû. Di wê çarçoveyê de wî pêşwazî ji hejmarek kesayetî û şandeyan kir ku bi armanca ça-reserkirina nakokiyan daxwaza lidarxistina kongreyê dikirin.

Wê demê, sala min a çarem a xwendina koleja yasayê hêj mabû; tevî ku min dikarî mifayê ji biryara Ebdul Kerîm Qasim bigrim û wê salê nexwînim û bibim parêzer, lê min biryar da vegerim kolejê û xwendina xwe temam bikim.

Roj bi roj fişarên ser Mela Mistefa ji bo lidarxistina kongreyê zêde dibûn. Li gorî wê yekê ku ew serokê PDK'ê bû, daxwaza civîna komîteya navendî kir; lê koma dijber a nav komîteyê red kir û gotin: "Divê ew cure daxwaz ji aliyê polîtburoyê ve bê kirin." Tevî rijdbûna Mela Mistefa li ser beşdariya civînê, lê endamên wê komê beşdar nebûn.

Di wê civînê de 11 kes amade bûn, biryar hat dayîn rojnameya PDK'ê bê weşandin û ji destê wê komê bê derxistin û ez serpestiya wê bikim. Biryara rawestandina çalakiyên min ên partiyê bê be-talkirin û berpirsyarî, ji wê komê were standin, eger biryarên civînê qebûl nekin.

Heta wê demê, min karî bawerînameya bekaloryosê di yasayê de bi dest bînim û piştî heyameke dûr û dirêj, ez vegeriyam nav malbata xwe.

Paş çendekê, di nameyekê de Mela Mistefa tekez li pêwîstiya vegera min a Bexdayê kiribû. Ez vegeriyam Bexdayê, bi fermana Mela Mistefa parêzvanên wî dest danîbûn ser baregeha rojnameyê[57]. Mela Mistefa gelek tore dihat xuyakirin, kilîta baregeha rojnameyê da min û xwest, ez rojnameyê birêve bibim.

Paş hejmarek civînan bi aliyên siyasî re ji wan komunîstan, me biryar da komîteyek amadekar a bêalî ji Dr. Ezîz Şemzînî, Dr. Murad Ezîz, Parêzer Ewnî Yusif û du kesên din ji bo çareserkirina nakokiyan bi awayekî demokratîk, lidarxistina hilbijartinê li seranserî Kurdistanê û lidarxsitina kongreya PDK'ê û yekalîkirina tevahiya pirsên asêmayî pêk bînin.

Di heyama du mehan de wê komîteyê wek amadekariyekê ji bo lidarxistina kongreyê û serperestîkirina hilbijartinê serî li tevahiya bajarên Kurdistanê da.

Ez bi xwe neçûm kongreyê, çimkî min dixwest biryara rawestandina çalakiyên min ên patiyê bê hilweşandin da ku wek endamê komîteya navendî di kongreyê de beşdar bibim. Cara dawî kongreyê bi tevahiya dengan ew biryar hilweşand.

Roja duyem di kongreyê de amade bûm, kongreyê hevdem biryara derkirina koma dijber a naskirî bi "**Koma Pêncan**" jî da.

……

[57] Merem baregeha **rojnameya Xebatê** ye, ku ji aliyê **Mela Mistefa Barzanî** ve êvara 30'ê Hezîrana 1959'an dest bi ser de hat girtin.

Di şeva kongreyê de (**4'ê Cotmeha 1959'an**) ku li mala Îbrahîm Ehmed li Bexdayê birêve diçû, nêzîkî 90 endaman beşdar bûn. Çûm derve da ku xwarinê bînim, min nûçeya êrişkirina ser Ebdul Kerîm Qasim bihîst, bê gîrobûn vegeriyam û min kongre jê agahdar kir.

Kongreyê biryara belavkirina endaman da û me Mela Mistefa veguhest cihekî parastî, nebe canê wî bikeve xeterê û darbeyek siyasî qewimî be. Kesên leşkerî têkilî bi yekîneyên xwe re danîn. Bi merema hevahengî û rawestandina her hewleka darbeyê me pêwendî bi Partiya Komunîst kir. Ebdul Kerîm Qasim ji wê hewla kuştinê rizgar bibû û me jî dest bi temamkirina kongreyê kir.

❖ Têkiliyeke taybet navbera Ebdul Kerîm Qasim û Mela Mistefa hebû, çîroka wê çawa ye?

Ya rast têkiliyek baş di navbera wan her duyan de hebû. Piştî vegeriyana Mela Mistefa di **Îlona 1958'an** de ji awarebûnê heta wê demê ku **Ebdul Kerîm** Qasim bi giranî hat birîndarkirin, Mela Mistefa wisa difikirî, ji ber wê têkiliya xurt dikare bêjê; wekî tolhildanekê destê wî di kuştina **Ehmed Axayê Zêbarî** de li Mûsilê hebûye[58] ku apê hevjîna wî ya biçûk û Hoşyar Zêbarî bû. Lewma dema ku li nexweşxaneyê me serdana Ebdul Kerîm Qasim kir, Mela Mistefa behsa wê bûyerê kir.

Ebdul Kerîm Qasim ji wan gotinên Mela Mistefa hêrs bû û got: **"Ka desthilata yasayê? Min ji te xwest piştî vegerê bi hemiyan re baş bî û xwe bi mezinê hemiyan bizanî û xwe ji wan cure reftar û nakokiyan dûr bixî."**

Di bersivê de Mela Mistefa got: **“Ez berpirsyariya wî karî digrim stûyê xwe, çimkî min ew ferman daye.”** Ebdul Kerîm Qasim bi toreyî got: **“Tu kujer nînî,”** di wê kêliyê de min îşaretek da Mela Mistefa, xwe wê de bide da ku xirabtir neke.

❖ Bi rastî destê Mela Mistefa di wê bûyera terorê de hebû?

Belê, belgeya wê jî, amadekirina wê komîteya parêzeran bû, ku ji aliyê PDK’ê ve ji bo berevanîkirina ji girtiyên bûyerê hatibû pêkanîn.

Dema ku em ji nexweşxaneyê derketin, min goteMela Mistefa: **“Nedibû te behsa wê yekê ji Ebdul Kerîm Qasim re bikira, ji ber ku ew serokwezîr û dozgerê leşkerî û yasayî ye, dikare niha fermana girtina te bide.”** Ew bûyer destpêka xerabûna têkiliyên navbera wan bû.

Sala 1960’an li ser îzna partiyan nîqaş hebûn, me navê partiyê wek “**Partiya Demokrat a Kurdistanê-Iraq**” danî bû, lê Ebdul Kerîm Qasim razî nebû û kire “**Partiya Demokrat a Kurdî**”.

Di bersivê de me da xuyakirin ku peyva “**Kurd**” rengdêreke tenê mafê Kurdan digire ber, lê peyva “**Kurdistan**” tevahiya wan kesan di-greber ku rûniştiyên navçeyên Kurdistnanê ne; cara dawiyê Ebdul Kerîm Qasim razî bû ku bibe “**Partiya Demokrat a Kurdistanê-Iraq.**”

Di bin wê bandorê de, eşîrên Kurd wek **Zêbarî, Sûrçî û Biradostî** ser-dana Bexdayê kirin û îtiraz qeyd kirin. Hinek caran jî ji bo alozkirina rewşê li dijî Mela Mistefa gotinên nerast dikirin.

……

[58] Mesûd Barzanî di pirtûka “**Barzanî û Tevgera Rizgarîxwaziya Kurd**” de bal kişandiye ser vê ye ku **Ehmed Axayê Zêbarî** di **4’ê Mijdara 1959’an** de li Mûsilê hatiye kuştin.

Ev û hinek faktorên din bûne sedema xirabûna têkiliyên Mela Mistefa û Ebdul Kerîm Qasim.

Li vir pêwîst e, ez behsa tiştekê bikim. Dema navbera her dukan zêdetir ber bi xerabûnê ve diçû, berpirsên Sovyetê ji wê yekê hisyan.

Di nav artêşa Iraqê de bi taybet saziya îstixbaratê de efserekî me hebû, bi gotina wî Ebdul Kerîm Qasim di civînekê de ji fermandarên leşkerî re gotibû: **"Eger Mela Mistefa bêdeng nebe, dê li ser wî bel-geyan belav bikin."**

Ev gotin di nameyên navbera Mela Mistefa û efserekî siyasî yê brîtanî û hikûmeta Brîtanyayê de heye, ku niha di nav dosa yên Wezareta Derve ya Iraqê de ye.

Piştî ku Sovyetî ji wê agahiyê hisyan, yekser gazî Mela Mistefa kirin da ku beşdariyê di mîtînga Şoreşa Oktoberê a 1960'an de bike[59]. Ev jî ji bo wê yekê bû, dûr bike ji her bûyerekê ku dibe navbera wî û Ebdul Kerîm de biqewime.

Li Moskowê bi germî pêşwaziya Mela Mistefa hat kirin, ziyana wan çekan jî hat dayîn, ku bi xwe re biribûn dema ku berê xwe dabû Sovyetê.

Tevî ku diviya ez di gerê de, bi Mela Mistefa re bama, lê wî têkilî bi min re danî û ji min xwest ku ez nameyekê ji Balyozxaneya Sovyetê ya li Bexdayê re binivîsim û tê de behsa rewşa PDK'ê li Kurdistanê bikim, balê bikşînim ser vê yekê, ku pêwîst e di vê rewşê de Mela

……

[59] Mela Mistefa Barzanî **5'ê Mijdara 1960'an** çû serdana **Yekîtiya Sovyetê** û heta **13'ê Çileya 1961'an** li wê derê ma. Plana Sovyetiyan bi vî awayî bû, hevdîtinekê bi Mela Mistefa re bikin, çawa ku bi fermandarên Partiya Komunîst a Iraqê re ew hevdîtin kiribûn ku dijî Ebdul Kerîm Qasim bûn.

Mistefa vegere Iraqê. Ji ber ku Sovyetiyan dixwest Mela Mistefa heta demeke nediyar li Moskowê bimîne.

Piştî şandina wê nameyê, berpirsên Sovyetê, bi vî mercî ku têkiliyên xwe bi Ebdul Kerîm Qasim re baş bike, razî bûn Mela Mistefa vegere Iraqê.

Mela Mistefa piştî vegerê serdana Ebdul Kerîm Qasim kir, hetta behsa qerebûya çekan jî, bi wî re kir, tevî ku bertekek Ebdul Kerîm li hember wê yekê nebû, lê nerazîbûn ji rûveta wî ve diyar bû.

Kongreya Pêncem a Partiya Demokrat a Kurdistanê di 5'ê Gulana 1960'an de, bi beşdariya 168 endaman li baregeha PDK'ê li taxa Seidûn a Bexdayê hat lidarxistin.
Mela Mistefa ji tirsa girtinê yan jî terorkirinê ji aliyê neteweçiyan ve beşdar nebû. Bi taybet piştî hewla terorkirina Ebdul Kerîm Qasim û darbeya têkçûyî ya Ebdul Wehab Şewaf û tawanbarkirina Barzaniyan bi serkutkirina wan kesan ên dilsozê hikûmetê bûn. Ji ber wan sedeman, Mela Mistefa dixwest li navçeya Barzan bimîne.
Kongre du rojan hat paşde xistin beta Mela Mistefa ku serokê PDK'ê bû razî bikin di kongreyê de beşdar bibe.

Di wê navberê de, Ebdul Kerîm nameyek ji Ewnî Yûsif endamê serokatiya me û wezîrê avadankirinê re şandibû û behsa pêwîstiya terikandina Mela Mistefa kiribû û gotibû: **"Ew kesekî eşîrî û tênegihîştî ye, hûn jî mirovên rewşenbîr û pêşketî ne".**

Bêguman me dizanî armanca wî çî ye, lewma me gote wezîr em cuda nabin û daxwaza wî qebûl nakin.

Piştî wê bersivê, hikûmeta Iraqê bi hinceta berevaniya ji xwe dest bi çekdarkirina eşîrên Kurd yên dijî Barzanî kir. Hikûmetê eşîrên Zêbarî û Sûrçî çekdar kirin, bi wê yekê jî rewşek pir tevlîhev di navbera Barzanî û hikûmeta Iraqê de çêbû.

Rewş bû sedem careke din rojnameya "**Esewre**" ku girêdayî Ebdul Kerîm Qasim bû, gotinên "**Klofîs Meqsûd"** derbarê kêmaniyan li welatê Ereb belav bike ku bi zêhniyeteke kevneperestiyê hatibûn nivîsîn.

Tevî ku paşê xwedanê rojnameyê daxwaza lêbihurînê kir, lê heta demekê denge gendiyek zaf çê kir û me wek pêngaveke dijî xwe dizanî. Lewma me li dijî wê gotarê îmze kom kirin û çendîn gotar jî di wê barê de nivîsandin û tê de rexne ji wan cure bîr û nêrînan girtin.

Di wê rewşê de Ebdul Kerîm Qasim di konferanseke rojnamevanî de bal kişand ser hebûna çend belgeyan û got: **"Eger belav bikin, xwedanê wê dê rastî şermezariyeke mezin bibe".**

Me jî dizanî mebesta wî kî ye. Me ew pirs gihande polîtburoyê û di rojnameya me bi xwe de jî, gotarek li ser weşand. Ya rast me nedizanî nameyên bi wî awayî navbera Mela Mistefa û Brîtanyayê de heye yan na?

Paşê rastiya wan nameyan zelal bû, ji be ku di pirtûka "**Mela Mistefa el-Ostûre wel-Heqîqe**" ya **Fazîl Berak** de hat belav kirin, ku nivîsa Mela Mistefa bi xwe bû.

Desthilatê dest bi operasyona girtinê kir, di encamê de hejmareke zaf ji hevalên me li Kerkûk, Silêmanî û Dihokê hatin girtin. Bi vê yekê jî bêtifaqiya navbera me û Ebdil Kerîm Qasim kûrtir bû.

Terorkirina Sidîq Mîran li nêzîkî Şeqlaweyê, ku di serdema paşatiyê de parlamenter bû, her wisa mezinekî eşîra Xoşnaw û dijberekî Mela Mistefa bû, ew jî bû sedem ku partiya me bê tometbarkirin.

Lewma Dozgerê Giştî yê Leşkerî **Ehmed Salih Ebdî**, fermana girtina **Sekreterê PDK'ê Îbrahîm Ehmed** da, ew jî neçar bû xwe veşêre.

Sala 1961'an ez him sernivîskarê rojnameya "Xebatê" bûm, him jî Serokê Desteya Nivîskaran a rojnameya "Kurdistanê" bûm.

Di ahenga Newrozê de li Hota Gel, min gotarek pêşkêş kir û tê de pesnê Mela Mistefa da û bi zimanekî hişk rexne ji hikûmetê girt, lewma fermana girtina min hat dayîn, min jî xwe veşart, ji ber wê yekê rojname ji weşanê ket û PDK bê rojname ma.

Di rewşek wiha de qutbûnek navbera partiya me û Ebdul Kerîm Qasim de çêbû. Di wê rewşê de girtin û peyketina endamên Partiya Beis, komunîstan dest pê kir, Partiya Neteweyî ya Demokratîk jî çalakiyên xwe rawestandin. Tevî ku Sovyetiyan hewl dan me û Ebdul Kerîm li hev nêzîk bikin, lê hewlên wan bê encam bû.

❖ Wê demê we çawa pêwendî bi Sovyetiyan re dikir?

Navbea partiya me û Balyozxaneya Sovyetê de, min rola pira têkiliyan didît, lê têkiliyên navbera Mela Mistefa û Sovyetê bi rêya Serokê Tevgera Ensar ol-Selam Ezîz Şerîf pêk dihat.

Di encama jikarketina rojnameya Xebatê û nepenîbûna Îbrahîm Ehmed û min de PDK ji çalakiyê ket û rewşa Kurdistanê jî zêdetir aloz bû.

Hikûmetê bi berfirehî dest bi girtina alîgirên me kir. Ya rast li hember wê rewşê ku di navbera me da qewimî, em lê berpirsyar bûn, bi taybetî jî ez, çimkî min nûnertiya aliyê tundrê dikir.

Ev jî hevdem bû digel zêdebûna bizavên axa û eşîrên Kurd û yên ku di encamam bicihkirina yasaya reforma çandiniyê ziyan dîtibûn, hetta wan eşîran destê xwe yê alîkariyê dirêjî şahê Îranê kiribûn.

Me û Partiya Komunîst pişta bicihkirina yasaya reforma çandiniyê û tevgera cotkaran digirt ku tevahiya navçeyên Kurdistanê dabû ber xwe, ev jî bû sedema gurbûna tevgera cotkaran û pena birina axa û began ji bo Îranê. Îranê jî dest bi çekdarkirina wan kir û vegerandin navçeyên sînorî.

Piştî nirxandina rewşê, di nav partiya me de, du araste çêbûn.

1. **Ya yekem ji Mela Mistefa, ez, Omer Mistefa, Elî Eskerî û Mela Ewlayê Hacî Îsmaîl pêk dihat.**
2. **Ya duyem ji Îbrahîm Ehmed, Dr. Ezîz Şemzînî û Dr. Nûrî Şaweys pêk dihat.**

Piraniya polîtburoyê jî di vê baweriyê de bû, divê PDK dest ji wê tevgera eşîriyê wernede; çimkî cara dawiyê bi xwe rastî şikestê tê.

Wek arasteya yekem, em di vê nêrînê de bûn ku wê tevgera eşîrtiyê hesta neteweyî ya Kurdan bikar anîniye û Ebdul Kerîm tirsandiye; lewma divê em ji bo kontrolkirina serokatiya wê û rakişandina endamên wê, rewşê bixin kontrola xwe û bikarin dijî Ebdul Kerîm Qasim dest bi xebata çekdarî bikin. Lê niha ez difikirm, ew nêrîna me şeş bû.

Mela Mistefa hewl dida wê tevgera eşîrtiyê xurt bike û digot:

“Eger wan eşîran li Dola Xelekan, Behdînan, Raniye û Derbendîxanê kom bike, dikare Ebdul Kerîm neçar bike bi PDK’ê re li hev were.”

Polîtburoya PDK’ê civiya û biryar da, ez biçim navçeya Barzan da ku nêrîna Mela Mistefa derbarê destpêkirina xebata çekdarî bizanim. Çûm **Çiyayê Şîrîn** Mela Mistefa Havînê li wir bû. Got: **“Em dest bi şer nakin.”**

Min gotê: **“Komkirina eşîran û derxistina fermana şer, bi taybetî te-qandina piran û birîna xetên telefonê, rewşê xirabtir dike ku piştre nayê kontrolkirin. Her wisa dibe sedem, hikûmet derbeyên mezin li me bide.”**

Lê Mela Mistefa digot: **“Ew yek naqewime û şer di navbera me û hikûmetê dernakeve.”**

Di wê navberê de, **9’ê Îlonê** bajarê Zaxoyê serî hilda û hevalên me dest danîn ser bajêr û çekên hikûmetê birin. Piştre bajarên din jî serî hildan, Ebdul Kerîm Qasim wisa dizanî, ku em serokatiya wê serhil-danê dikin.

Lewma **11’ê Îlonê** fermana êrişa esmanî da, di wan êrişan de ji bilî navçeya Barzan, tevahiya eşîran hatin bombebarankirin. Ji ber bombebaranê eşîr revyan û em tenê man. Lewma em neçar bûn vekişin çiyan. Bi wê yekê jî kontrola navçeyên Kurdistanê ket destê hêzên hikûmetê.

Lê hikûmet nesekinî, **12’ê Îlonê** daxuyaniyek ser navê Şêx Ehmed Barzanî û Mela Mistefa Barzanî weşand û diyar kir: **“Ew du kesayetî bi hikûmetê re ne û dijî serhildana eşîran in.”**

Di heman demê de, ji eşîran jî xwest vegerin ser mal û halê xwe û dilsoziya xwe ji bo Ebdul Kerîm Qasim diyar bikin. Heta vê derê hikûmetê armanca xwe bi dest xist.

Lê **16'ê Îlonê** navçeya Barzan jî hat bomberankirin, wê yekê Şêx Ehmed (birayê mezin ê Mela Mistefa) neçar kir ku biryara şer ne-kirinê bide û bi rêya nameyekê girêdayîbûna xwe ya bi hikûmetê re rabighîne û ji Mela Mistefa bixwaze ji navçeyê derkeve. Lewma Me-la Mistefa bi 250 şervanan berê xwe da sînorê Dihokê, em jî hilkişyan çiyan.

Beşa Çarem
Barzanî û Ebdul Kerîm Qasim
Nakokiyên Navxwe yên PDK'ê

Pêşgotin

Di vê beşê de Sekreterê Giştî yê Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistanê (YNK) Celal Talebanî, behsa kûrbûna nakokiyên navbera Mela Mistefa Barzanî û Ebdul Kerîm Qasim dike.

Her wisa behsa têkiliyên Kurd û Îranê dike. Balê dikşîne ser Serokwezîrê Rûsya yê berê Yevgînî Prîmakov ku wê demê nûçegihan bûye û ew bûyerên Iraqê yên wê qobaxê qeyd kirine.

Her wisa balê dikişîne ser qonaxa piştî darbeya 8'ê Sibata 1963'yan û danûstandinên di navbera hikûmeta Iraqê û serokatiya Şoreşa Îlonê.

Ji bilî wê yekê, behsa serdana xwe ya Misrê, Cezayîr û hevdîtinên xwe yên bi Cemal Ebdul Nasir û **Ehmed Bên Bêlla** re dike.

Talebanî di vê beşê de behsa têkiliyên xwe bi Sovyetê re dike, eşkere dibêje, wî telîmat ji wan wergirtiye û li ser gavên xwe bi wan re şêwiriye.

Her wisa Celal Talebanî, derbarê nakokiyên navxwe yên di navbera Mela Mistefa Barzanî û Polîtburoya Partiya Demokrat a Kurdistanê

(PDK) de diaxive, bi awayekî di sala 1964’an de baskê polîtburoyê ji ber wê yekê, neçar bûye berê xwe bide Îranê.

Di wê çarçoveyê de Celal Talebanî behsa helwesta xwe di bûyeran de dike, piştre behsa çawaniya vegera baskê polîtburoyê û şaşiyên wan ên lihevhatina bi Mela Mistefa Barzanî û sedemên vegera wan a bajaran di sala 1966’an de dike.

Naveroka
Beşa Çarem a Hevpeyvînê

❖ Rast e pêş Şoreşa Îlonê daxuyanî hatin belavkirin; Mela Mistefa razî bibû li ser wê yekê?

Bi xatircemî nizanim, lê di vê baweriyê de me bi razîbûna wî hat kirin, çimkî Şêx Ehmed jî razî bû. Rewş wekî berê lê hat, eşîran dilsoziya xwe ji bo hikûmetê nîşan dan.

Ji bilî me endamên PDK'ê, tu kes di meydanê de nema, bi awayekî hejmara me li Hewlêr, Silêmanî û Kerkûkê nedigihîşt 400 keseî ji bilî wan 200 pêşmergeyan ên li devera Dihokê li bal Mela Mistefa bûn.

Li hember wê rewşê, hikûmetê xebata PDK'ê û weşana rojnameya me qedexe kir, hevdem dest danî ser bargehên partiya me. Ya rast Mela Mistefa hez nedikir şoreş serî hilde yan em dest be xebata çekdarî bikin. Lewma hewl da ku têkiliyê bi sûriyan re deyîne.

Wê demê, têkiliya navbera Mela Mistefa û Misrê jî têk çûbû, lewma dema ku wî daxwaza penaberiya siyasî ji Misrê kir, wan red kir.

Piştre daxwaza penaberiyê ji Turkan kir, wan jî red kir. Paş hingê hewl da bi hikûmeta Iraqê re li hev were. Hikûmeta Iraqê fermandarê "Mûsilê Lîwa Hesen Ebûd" şand bi Mela Mistefa re hevdîtinê bike. Lê armanca wan tenê ew bû, Barzanî bikişînin cihekê û bombebaran bikin ku wisa jî bû, lewma wê hewlê jî serî negirt û xwesta wî ya lihevhatinê rastî şikestê hat.

Di wê navberê de komunîstan dest bi pêvajoyekê bi navê "**Aşitî ji bo Kurdistanê û çareseriya siyasî ji bo pirsa Kurd**" kirin û di wê çarçoveyê de, bangnameyek ji Ebdul Kerîm Qasim re şandin, heya wê demê, hîn partiya me ango PDK li ser destpêkirina şer û xebata çekdarî, biryara dawiyê nedabû.

Ev jî hevdem bû, digel biryara Ebdul Kerîm Qasim a ku dixwest Kuweytê tevlî Iraqê bike û di wê barê de, yekîneyeke leşkerî ya xwebexş ji bo rizgarkirina Kuweytê hatibû pêkanîn[60].

Ew yek bû sedem da ku Mela Mistefa bi vî mercî ku Iraq bi me re aşit bibe, amadebûna xwe nîşan da, lê Ebdul Kerîm Qasim pêşniyara Barzanî red kir û xwest em şandeyekê bişînin Bexdayê.

Me jî "Nûrî Şaweys" şand Bexdayê, lê Ebdul Kerîm gotibû Nûrî Şaweys: "Xwe teslîm bikin û têkiliya xwe bi Mela Mistefa re qut bikin." Me ew daxwaz red kir, Mela Mistefa li Behdînan ma.

Min jî serokatiya navçeyên Silêmanî û Kerkûkê dikir, hêza çekdar a Hewlêrê jî ji aliyê xwedê jê razî Omer Mistefa ve dihat rêvebirin.

Di Sala 1961'an de li ser vê yekê gelo em şer bikin yan na? Me civîneke komîteya navendî li dar xist ku 12 endam tê de beşdar bûn. Di civînê de me biryar da, em tevgereke çekdariyê ya berevanîker ava bikin, da ku bi rêya şerê partîzanî xebata çekdarî bike. Hevdem, dev ji diyalog û li hevhatinê ber nedin.

……

[60] Kuweytê di **19'ê Hezîrana 1961'an** de serxwebûna xwe bi dest anî. Di 20'ê Hezîranê de jî, **Ebdul Kerîm Qasim** peyamek ji Mîrî Kuweytê re şand û pîrozbahî li wî kir. Lê piştre **25'ê Hezîranê**, di konferanseke rojnamevanî de, **xwest Kuweytê tevlî Iraqê bike** bi vê hincetê ku Kuweyt beşek ji erdê Iraqê ye û Brîtaniyan jê veqetandine.

Me slogana “**Demokrasî ji bo Iraqê û Xweserî ji bo Kurdistanê**” bilind dikir. Du hevalan, ew biryar qebûl nekirin, yek ji wan Cîgirê niha yê Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê Rêzdar Elî Ebdullah bû.

Wî got: “Di bin fişara neteweçiyan û ji ber kêmiya bijardeyên xwe, Ebdul Kerîm Qasim neçar dibe giringiyê bide pêvajoya demokrasiyê.

Hevalê din jî xwedê jê razî Muqedem Nûrî Ehmed Teha bû, ku yek ji wan efseran bû, di avakirina Komara Mihabadê de beşdar bibû. Wî jî got: “li gorî tecrubeyên min ên kesane, çarenivîsa tevgera çekdariya di bin femandariya Mela Mistefa Barzanî de, tenê şikestin e.

Bi vî awayî, pêvajoya xebata çekdarî di dawiya sala 1961’an de dest pê kir û piştre berfireh bû.

❖ Pêvajoya xebata çekdarî heta kengê dewam kir?

eta sala 1962’yan berdewam kirin, lê heta darbeya 1963’yan zêdetir berfireh bû. Wê demê, ez endamê polîtburoyê bûm û tevî hevalên pêşmerge li çiyan dimam.

Havîna 1962’yan Mela Mistefa cihê xwe veguhest navçeya Riwandizê heta dawiya şoreşê di sala 1975’an de, baregeha farmandariya wî li navçeya Balekayetiyê bû.

Di wê heyamê de, Bîroya leşkerî hat avakirin, ku serperestiya çalakiyên leşkerî dikir û ez berpirsê wê buroyê bûm.

Di sala 1962’yan de hevdîtinek navbera me û Beisiyên opozisyon de çêbû. xwedê jê razî endamê polîtburoyê Salih Yûsifî nûnerê me bû û nûnerê Beisiyan jî Elî Salih Seidî, endamê serokatiya wan bû.

Me li hev kir, di her kiryareke leşkerî de, li dijî Ebdul Kerîm Qasim, em alîkariya wan bikin.

Di heman demê de, xwedê jê razî Tahîr Yehya ji rêya Muqedemê Kurd Kerîm Qerenî, sekreterê partiya me Îbrahîm Ehmed agahdar kir, ku biryar e, Beisî û neteweçî bi hev re kom bibin û dixwazin Ebdul Kerîm Qasim ji holê rakin û bi aliyê Kurd re li hev kirin.

Rêzdar Îbrahîm Ehmed şertên me pêşkêş kirin, ku ev bûn:

- **Îtirafkirina bi mafê xweseriya Kurdistanê**
- **Danîna Mela Mistefa wek hakimê leşkerî yê Kurdistanê**
- **Pişikdarbûna Kurd di çar wezaretên hikûmeta nû de**
- **Organîzekirina demokrasiyê di qonaxa piştî Ebdul Kerîm Qasim de.**

Ji aliyê xwe ve, Tahîr Yehya daxwazên me qebûl kir. Ev jî di demekê de bû, Roj bi roj dijatiya Ebdul Kerîm Qasim berfirehtir dibû, her wisa dema bicihanîna plana ji holê rakirina wî jî nêzîk dibû. Di Kanûna Paşîn (Çile) a 1963'yan de, wan ji me xwestin navê çar kesan diyar bikin, da ku wek wezîr di hikûmeta nû de beşdar bibin.

Mela Mistefa ev nav pêşkêş kirin:

Babe Elî Şêx Mehmûd, Serheng Fuad Arif, Celal Talebanî (ez) û Bekir Ebdul Kerîm, lê min red kir.

❖ Çima te qebûl nekir?

Ez di vê baweriyê de bûm, Beisî xwînxwar in; min jî nedixwest ji bo berpirsyariyeke hestyar wek erka wezîrê dadê, xwe berbijar bikim. Lewma li şûna min, navê Şehîd Elî Eskerî xistin lîsteyê.

Dema ku şoreş hat kirin, sibeha 8'ê Sibatê bû, ez li bal Mela Mistefa bûm, min ew ji xewê ra kir û got: "Rabe kar hatiye kirin." Çimkî şandeya me ya li Bexdayê peyamek şandibû, wê demê min zanî ko-ma ku me bi wan re li hev kiribû, wan desthilat herifandine.

Paş du-sê rojan Kerîm Qerenî û Loqmanê kurê Mela Mistefa hatin, wê demê Loqman li Bexdayê girtî bû[61]. Wek mizgîniyeke xweş û nîşandana niyetpakiya xwe aliyê hikûmetê ji Mela Mistefa xwest, şandeyekê bişîne Bexdayê da ku bi wan re danûstnandinê bike.

Piştî serhildana Tevgera 8'ê Sibatê, yekser nakokî navbera serok û polîtburoyê de derket, dema ku Mela Mistefa dixwest fermana da-girkirina bajarên Kurdan û anîna efserên komunîst û Qasimiyan ji bo Kurdistanê bide, da ku karekî bike, bi navendeke xurtir bi hikûmeta nû re danûstandinê bikin.

Çimkî di yekem daxuyaniya hikûmeta nû de, tu bal nehatibû kişandin ser wan sozan ên ku dabûn, ne behsa xweseriyê û ne jî behsa navê Mela Mistefa wek hakimê leşkerî yê Kurdistanê hatibû kirin.

Berevajî tenê behsa çend peyvên giştî hatibû kirin ku ew jî bersivdar nebûn.

Mela Mistefa hez dikir, mecaleke din jî bide hikûmetê, ez û Salih Yûsifî di 19'ê Sibata 1963'yan de hatin şandin ji bo Bexdayê, em li hotêlê bûn, Tahîr Yehya ku wê demê fermandarê giştî yê artêşê bû, şev serî li ma de û pirsî:

……

[61] Loqman Mela Mistefa Barzanî di dawiya sala **1962'yan** de ji aliyê Eqîd Wehbî ve li Mêrgesorê hatibû girtin û kelebçekirî ji bo **Bexdayê** hatibû veguhestin.

“Hûn li ser peymana xwe mane?”
Me got: “Belê.” Min jê pirsî: “Lê hûn?”
Wî jî got: “Belê, em li ser soza xwe ne.”
Wan Bab Elî Şêx Mehmûd û Fuad Arif di nav pêkhateya hikûmetê de, berevajî lihevkirinê danî bûn.

Roja duyem, me serdana Serokkomar **Ebdul Selam Arif** û Serokwezîr Ehmed Hesen Bekir kir, wan bi başî behsa Kurdan kirin, hetta Ebdul Selam, bi peyva “**Kurdistana Dilovan**”, navê Kurdistanê anî, ev jî destpêkeke cihê kêfxweşiyê bû.

Di wê serdemê de, navbera me û Partiya Komunîst xweş bû. Ji rêya Kurdistanê ve me endamên wan ji dest Beisiyan rizgar dikirin. Du otomobîlên min hebûn, qet di nuqteyên kontrolê de, nedihatin sehkirin, min yek ji wan otomobîlan, ji bo derbaskirina endamên Partiya Komunîst bi kar dianî.

Di nav kesên ku min derbaskirin de, xwedê jê razî Selîm Fexrî, Muqedem Seîd Metir û çend kesên din hebûn.

Beisî ji wê kiryara min tore bûn, lewma di yekem hevdîtina min û Elî Salih Seidî de, nîqaşek mezin çêbû, bi kurtî min gotê: **“Tevî ku em dijî jinavbirina komunîstan e, lê tu niyeteka me ya hevkarîkirina wan a leşkerî nîne.”**

❖ Elî Salih Seidî kesekî tundûtîj bû?

Tundûtîj bû, lê berevajî wê yekê ku ser wî tê gotin; xwedan nêrînên rast û kesekî pêşketî bû. Wek mînak, ji min xwest bi wan re biçim Qahireyê, ne ji ber wê yekê ku pirsa Kurd li Iraqê çareser nebûye,

belkî **armanc pişikdarkirina Cemal Ebdul Nasir û Ehmed Bên Billa di wê pirsê de bû.**

Her ew jî bû sedem, Ehmed Hesen Bekir ji bo ku Ebdul Nasir bêdeng bike, bêje em amadene xweseriyê bidin Kurdan, lê Elî Salih Seidî digot: "Ebdul Nasir stûyê me dişkînîne û dibêje Beisiyan Iraq parçe kirin."

Min fem kir, tenê pêwîstiya wan bi demê heye da ku bikarin dijberên xwe yanî komunîst û yên din ji nav bibin, her wisa pêgeha xwe ya di desthilatê de qahîm bikin, li şûna bicihkirina wê rêkeftina ku bi me re îmze kiribûn.

Ez di çûyîna Qahireyê de dudilî bûm, ji ber ku razîbûna gera xwe ya derve bi dest neanî bû, tevî ku her du wezîrên me yên Kurd, ber-pirsyariya wê gera min didan stûyê xwe, lê bêşik Mela Mistefa Barzanî ji wî karê min hêrs dibû. Çawa ku di pirtûka xwe ya bi navê "**Gera Zilamên Netirs**" de nûçegihanê rojnameya **New York Times** "**Dana Adams Schmidt**" behsa wê yekê dike.

Nivîskarê pirtûkê dibêje: "**Dema min Celal Talebanî li balafirxaneyê dît û min jê re behsa hêrsbûna Mela Mistefa kir, rengê wî spîçolkî bû, lê min dizanî Celal Talebanî kesekî dûrbîn e û girîngiya têkiliyên Ereb û Kurdan û Cemal Ebdul Nasir bi başî dizane**."

Ez vê gotinê ji bo dîrokê dikim; ez **23'ê Sibata 1963'yan** de bi Elî Salih Seidî re çûm Qahireyê. Di nav balafirê de min gotê:

"We serkirdeyên Partiya Komunîst girtîne, hûn ê çi li wan bikin?" Wî bersiv da û got: **"Aramanca me gihîştina bi lihevkirin û lihevhatinê ye; êdî xwîn rijandin bes e."**

Ev jî di demekê de bû, wê demê Beisiyan hejmarek zaf ji komunîstan bidarve kiribûn[62].

Em gihîştin Qahireyê, Cemal Ebdul Nasir ji bilî ku bi germî pêşwaziya me kir, serketina şoreşê jî li me pîroz kir. Got ricayê dikim:

“Gelek baş guh bidin min, ez hez nakim tu kes bê kuştin bi taybetî yên bi Ebdul Kerîm Qasim re bûn.”

Tekez jî kir û got: **“Ez xembar im ji ber ên hatine kuştin tenê Fazîl Ebas Mehdawî nebe.”**

Ebdul Nasir got:

“Ebdul Kerîm Qasim serokatiya şoreşê dikir û efserekî rizgarîxwaz bû, qet pêdivî nedikir bê kuştin.”

Di gotina xwe ya duyem de xwest, Beisî dev ji jinavbirina komunîstan berdin û got: **“Ew qirkirin, helahelayek mezin di nav pergala sosyalîst û cîhanê de çê dike û qirkirina xelkê bi wî awayî, şaşiyek mezin e.”**

Cemal Ebdul Nasir ew axaftin gote Şandeya Iraqê, ku ji aliyê Elî Salih Seidî ve dihat serokatîkirin ku ji Wezîrê Berevaniyê Salih Mehdî Emaş, Wezîrê Derve Talîb Şebîb, Nûnerê Sendîkaya Endazyaran Edîb Cadirîş û min pêk dihat. Derbarê **pirsa Kurd** li Iraqê, **Elî Salih Seidî ji Ebdul Nasir xwest, şandeya Kurd bibîne**. Bi wê mebestê ez dam naskirin, çimkî min nûnertiya **Partiya Demokrat a Kurdistanê** dikir ku Fuad Arifê wezîr jî bi min re bû.

……

[62] Di **13’ê Adara 1963’yan** de hejmarek ji **endamên Partiya Komunîst li Iraqê** ji aliyê **Beisiyan** ve hatin bidarvekirin ku **Sekreterê** wê partiyê **Selam Adil** jî di nav wan de bû.

Di civîna bi Ebdul Nasir re, min behsa nêrîna me derbarê Yekîtiya Ereb û yekgirtîbûna Iraqê û piştgiriya me ji bo wan her du pirsan kir.

Me wateya xweseriyê jê re şirove kir, wisa bizanim di wê civînê de, nêrîneke wî ya baş derbarê pirsa Kurd hebû.

Dr. Cemal Etasî, di pêşgotina pirtûka "**Ereb- Ekrad**" ya Munzir Mûsilî de, behsa wê civînê kiriye û bal kişandiye ser vê yekê ku **çi qasî kêfa Cemal Ebdul Nasir ji wan şiroveyên Celal Talebanî re li ser pirsa Kurd hatiye**. Rojnamevanê Fransî "**Eric Rouleau**" jî di rojnameya Lomondê de tekez li ser wê rastiyê dike.

Gelek baş, axaftina Cemal Ebdul Nasir tê bîra min ku got:

"Wek neteweya Ereb çi çareseriyeke me ya amadekirî ji bo wan pirsan nîne; û got: 'Lewma piştî vegera te ji Cezayîrê, em ê wê pirsê gengeşe bikin.' "

Em çûn Cezayîrê û li wê derî bi Serok **Ehmed Bên Billa** re civiyan, ew ji Cemal Ebdul Nasir vekirîtir bû. Gote şandeya Iraqê:

"Birayên min bêgîrobûn mafê xweseriyê bidin Kurdan, çimkî di qonaxekê de li Cezayîrê me daxwaza xweseriyê dikir, lê dema ku fransî razî nebûn wî mafî bidin, me slogana xwe guhert serxwebûnê, Ji ber wê yekê, divê hûn mafê Kurdan bidin."

Em vegeriyan Qahireyê, dubare me bi serok Ebdul Nasir re hevdîtin kir.

Wî got: **"Ez jî dixwazim li Iraqê mafê xweseriyê bidine we (Kurd)."**

Lê ev gotin kir; Celal ji zarê min vê peyamê bigihîne partiya xwe:

1. **Tekez li ser yekperçetiya axa Iraqê bê kirin.**
2. **Di organîzekirina xweseriyê de vê yekê zelal bikin, hûn wî mafî di çarçoveya Iraqê de dixwazin.**
3. **Dijatiya yekîtiya erebî nakin.**
4. **Li hember şayê Îranê bi hişyarî tevbigerin, çimkî pirsa Kurd di berjewendiya xwe de bi kar tîne, ger di berjewendiya wî de nebe, pişta xwe didê.**

Piştî ku em vegeriyan Bexdayê me civînek hevpar li dar xist û daxwaza bicihkirina peymana lihevkirinê û xweseriyê kir, bersiva aliyê hikûmetê ev bû:

“Em ê piştî civîna serokatiya şoreşê bersiva we bidin.”

Em bi şandeya hikûmetê re civiyan ku ji aliyê Hazim Cewad ve dihat serokatîkirin ku yek ji serkirdeyên partiya Beis û wezîr bû. Hazim Cewad wiha got:

“Ew ne tenê dixwazin mafê xweseriyê bidin Kurdan, belkî mafê gelê Kurd yê diyarkirina çarenivîsa xwe jî heye û hêvî dikin, rojek were ku Komareke Kurdistanê ya Sosyalîst bê avakirin. Lê pêdiviya me bi heyamekê heye, ji ber vê rewşa xirab a ku niha welat tê de ye.”

Bêşik min spasiya Hazim Cewad kir û gotê:

“Em daxwaza serxwebûnê nakin belkî xweseriyê dixwzin ku nîvê wî mafî ye, ya ku tu behsê dikî.”

Bersiv da û got: “Em ê roja başti dê bersiva we bidin.”

Roja paştir Konseya Serokatiya Şoreşê bangî me kir û em bi xwedê jê razî Salih Mehdî Emaş re civiyan.

Şandeya me pêk hatibû ji; Ez, Mihemed Seîd Xefaf, Babe Elî, Fuad Arif û Salih Yûsifî.

Salih Mehdî Emaş got: “Em hez dikin mafê xweseriyê bidin Kurd” ji min jî xwest, reşnivîsa projeya wê xweseriyê amade bikim ku em dixwazin. Her wisa soz da ku razîbûna tevahiya endamên Konseya Serokatiya Şoreşê werbigre.

Lê got: **“Ji bo bicihanîna projeyê, pêdiviya me bi heyama çar mehan heye.”**

Me jî careke din anî bîra wan ku ji sozên dayî poşman nebin.

Bêşik di wê serdemê de, behsa projeya xweseriyê, çi ji projeya ava-kirina Îsraîla duyem kêm nebû, lewma me biryar da bi Mela Mistefa Barzanî re bişêwirin. Me têkilî bi wî re danî, Mela Mistefa xwest bilez em vegerin Kurdistanê.

Piştî gihîştinê, min raporek derbarê gera xwe ya Qahire û Cezayîrê da Mela Mistefa. Ji ber wê gerê û dîtina Cemal Ebdul Nasir û Ehmed Bên Billa, gelekê hêrs bû, lê dema min gotê: **“Me çi kiriye, kêfxweş bû û destxweşî li min kir.”**

Paş çend rojan, di 3’ê Adara 1963’yan de şandeyek hikûmeta Iraqê bi serokatiya **Tahîr Yehya** hat Kurdistanê.

Wê şandeyê daxuyaniya Konseya Serokatiya Şoreşê bi xwe re anîbûn, ku tê de tekez li mafên gelê Kurd li ser bingeha nenavendiyê dikir, tevî ku cara yekem bû wan peyva “**Gelê Kurd**" bikar dianîn, **lê peyva xweseriyê guhetibûn bi nenavendiyê, ew jî bû sedem ku Mela Mistefa daxuyaniya hikûmetê qebûl neke.**

Me dest bi amadekirina projeyeke şûngir kir, ya rast ez di amadekirina wê projeyê de beşdar nebûm, belkî Muqedem Rukn Nebewî proje amade kir.

Di naveroka projeyê de daxwazeke zêdetir ji xweserî û federaliyê dahat kirin. Daxwaza pêkanînan artêşa Kurd dihat kirin, ku şûngirê artêşa Iraqê li Kurdistanê be, her wisa mîna artêşê were pirçekkirin.

Me ew proje pêşkêşî hikûmetê kir.

Di hember de, hikûmetê jî şandeyek bi serokatiya Fayîq Samerayî şand Kurdistanê. **Li Gundê Çuwarqurneyê nêzîkî Ranyeyê bi Mela Mistefa re hevdîtin kir. Di civînê de proje hat gotûbêjkirin lê nêrînên wan dij hev bûn.**

Derbarê helwesta Sovyetiyan di wê qonaxê de pêwîst e bêjim: Kesek bi navê Zayîd Yûsif ji konsulxaneya Sovyetê li Hotêl Bexda serdana min kir û got:

“Berdewam bibin li ser danûstandinên bi hikûmetê re û mifayê ji têkiliyên bi Cemal Ebdul Nasir re werbigrin. Dûr jî bikevin ji şerê bi Beisiyan re.”

Wê hingê Sovyetê alîkariya me ya darayî dikir.

❖ Di wê qonaxê de Îranê çek didan we?

Nexêr, piştî bûyera 8’ê Sibatê û kuştina Ebdul Kerîm Qasim, Îraniyan têkiliyên xwe bi me re qut kirin û hikûmeta nû bi fermî nas kirin.

Fermandariyeke operasyonên hevpar ji aliyê Îraniyan ve, di navbera Îran, Iraq û Tirkiyeyê de hatibû avakirin ku **navenda wê li Kerkûkê bû. Armanca wan lêdana me bû, eger careke din şoreş dest pê bike.**

Di çarçoveya ahengên Newrozê de, wê salê mîtîngeke girseyî li Koyeyê hat lidarxistin. Partiya me, fermandarên leşkerî û piraniya eşîrên Kurd ji bo gengeşekirina têkiliyên me û hikûmetê tê de beşdar bûn. Di mîtîngê de 11 kes wek endamên şandeyê hatin destnîşankirin da ku serdana Bexdayê bikin, li ser pêşniyara Mela Mistefa, ez bûm serokê wê şandeyê[63].

Ji aliyê xwe ve hikûmetê şandeyek nefermî bi serokatiya Fayîq Samerayî pêk anî. Her du şandeyan dest bi gengeşekirina projeya xweseriyê û sînorê herêma xweser kirin.

Dema xwe, xwedê jê razî Fuad Rikabî wêneya nameyekê dabû min ku name ji aliyê hejmarek penaber û siyasiyên neteweçî, Beisî û Nasirî ve, hatibû îmzekirin ku li Qahireyê bûn û dabûn Cemal Ebdul Nasir, naveroka wê derbarê pirsa Kurd û sînorê Kurdistanê bû.

Di wê civînê de min ew wêne da Fayîq Samerayî. Me li hev kir, naveroka wê esas bigirin, Samerayî got: **"Bi vê wêneyê nakokî hat çareserkirin,"** lê bi vê hincetê ku ew name di rewşek nexwezayî de hatiye nivîsandin, endamên şandeya hikûmetê red kirin. Tevî ku em du rojan mijûlî danûstandinê bûn lê civîna me bê encam bû.

Wê hingê ez li Hotêla Semîr dimam, kesek hat û got: Du kes dixwazin te bibînin. Yek ji wan Sekreterê Tevgera Neteweyî ya Erebî li Iraqê bû. Yê din jî Nayîf Hewatme bû, her wisa kesekî din bi navê

……

[63] Mîtînga Koyeyê ji **18- 23'ê Adara 1963'yan** berdewam bû; di encamê de şandeyek **bi serokatiya Celal Talebanî** û endamtiya her yek ji Salih Yûsifî, Hebîb Mihemed Kerîm, Şaxewan Namîq, Ebdul Hisên Feylî, Semed Mihemed Bekir, Resûl Pişderî, Egîd Sidîq, Hisên Xaneqa, Mesûd Mihemed û Mistefa Ezîz hat pêkanîn, ku roja 30'ê Adara 1963'yan gihîşte Bexdayê.

Ebdulîla Nesrawî bal wan bû. Gotin em mijûlî amadekirina plana darbeyekê ne dijî hikûmeta niha ya Iraqê û xwestin em jî beşdar bibin.

Min pirsî: “Armanca we çi ye?” Gotin: “Jinavbirina Beis çimkî ew dijî yekîtiya Ereban in û girîngiyê nadin demokrasiyê.”

Min bersiv da û got: “Em pişta her tevgerekê digrin ku Beisiyan ji holê rake, lê şiyana me ya pişkdariyê nine.”

Ev jî di demekê de bû danûstandinên sêalî yên Sûriye, Iraq û Misrê derbarê hevgirtina her sê welatan di Nîsana wê salê de dest pê kiribû.

Ser navê şandeya Kurd, min daxuyaniyek nivîskî da civînê û tê de ragihand: **“Eger rewşa Iraqê wek niha bimîne, em her daxwaza xweseriyê dikin, lê eger yekîtiya her sê welatan pêk hat, wê demê li ser bingeha yekîtiya neteweyî, em ê daxwaza zêdetir ji mafê xweseriyê bikin. Eger yekîtî li ser bingeha herêman pêk hat, wê demê em razîne Kurdistan bibe herêma çarem.”**

Meha Gulanê ez çûm Qahireyê, dema dîtina Cemal Ebdul Nasir, min gotê: “Beisî bi navê we diaxivin.”

Wî got: **“Beisî rast nabêjin; xwazî bi we re rêkeftiban û peymana li-hevkirinê li Qahireyê me îmze bikira.”**

Wê demê ku ez li Qahireyê bûm, hewla darbeyekê li Iraqê hat eşkerekirin û serkirdeyên wê jî hatin girtin. Di nav girtiyan de navê Nayîf Hewatme û Selam Ehmed hebû, navê min jî digel wan hatibû. Ev jî dihat vê wateyê ku vegera min ya Bexdayê bi xeter e.

Lê ya girîng ev bû, di serdanê de min serok Ebdul Nasir dît, tevî ku bawer nekiribû, hewla darbeya li Iraqê hatiye pûçkirin, lê ji min xwest venegerim Iraqê, berevajî biçme Beyrûtê û di kongreyeke rojnamevanî de rabigihînim, em digel yekgirtinê ne di demekê de me dişibînin Îsraîla duyem[64].

Cemal Ebdul Nasir got: **"Şivandina we (Kurd) bi Îsraîlê şaş e, ji ber ku hûn misilman in û berevaniyê ji axa xwe dikin, ji navçeyeke din nehatine Filistînê, ne tenê dijî Ereban nînin, belkî dixwazin bi wan re di nav aşitiyê û çareseriya siyasî de bijîn, ne di şer de."**

Ez çûm Beyrûtê, li wê derê Hîşam Ebû Zeher û rojnamevanên Nasirî alîkariya min kirin ku venegerim Iraqê. Piştre çûme Ewropayê û di wê

heyamê de, ku ez li Ewropayê bûm, Beisiyan bi alîkariya Îran û Tirkiyeyê di 10'ê Hezîrana 1963'yan de dest bi şerê dijî navçeyên Kurdî kiribûn[65].

.....

[64] Di wê demê de, wekî **xalifandinekê** û **kişandina bala raya giştî** ya erebî û Iraq, Beisî û hevnêrînên wan hewl û daxwazên Kurd wek avakirina Îsraîla duyem bin nav dikirin.

[65] Di wê qonaxê de **Îran û Tirkiye û Iraq** li hev nêzî bibûn, Îranê berpirsekî xwe yê payebilind şandibû Kerkûkê ku rola hevahengiyê di navbera artêşa Îran û Iraqê de didît.
Tirkiyeyê jî berpirsekî xwe yê leşkerî şandibû **Mûsilê**, **armanca sereke çêkirina hevahengiyê bi artîşa Iraqê re bû ji bo serkutkirina şoreşa Kurd li Iraqê û rêgirîkirin ji hatina Kurdên Rojhilat û Rojava bi nav şoreşê.**
Cara dawiyê, navê "**Operasyona Dîcleyê"** li wê operasyona hevpar hat kirin ku **di Hezîrana 1963'yan de bi berfirehî êrişî navçeyên Kurdistanê kirin**; di encamê de **hejmarek berçav navçe kavil bûn û xelkekî zaf jî bûne qurbanî.**

Li Parîsê bûm, du name ji min re hatin; yek ji wan pelgek pêve bû û tê de Wezîrê Berevaniya Iraqê Salih Mehdî Emaş, ji ber piştevanîkirina Kurdan, rexne ji Misrê girtibû.

Nameya duyem gelek nihênî bû; ya Wezareta Berevaniya Iraqê bû ku tê de behsa hevkariya navbera Tirkiye, Îran û Iraqê dikir.

Min her du name dane Mihemed Hesenên Heykel ku wê demê li Parîsê bû. Piştre wî gotarek li ser wan her du babetan li Qahireyê weşand.

Rojekê min li Parîsê Kameran BedirXan dît, wî got: “Alîkarê Wezîrê Berevaniya Îsraîlê Şîmon Peres dixwaze te bibîne”, minî jî gotê: “Carê pêwîstiya min bi şêwrê di wê barê de heye.”

Hevdem Teha Mihêdîn Meirûf Cîgirê niha yê Serokkomarê Iraqê serdana min kir, wê demê ji karê xwe hatibû derxistin ku şêwirmendê yekem li konsulxaneya Iraqê li Brîtanyayê bû.

Got: “Şahê Urdinê Şah Hisên dixwaze te bibîne.” Bi heman awayî min gotê. “Mecalekê bide da ku şêwirekê bikim.”

Derbarê her du pêşniyaran, ez bi Sovyetiyan re şêwirîm ku rojane têkiliyên min bi wan re hebû. Sovyetiyan hez nekirin ez bi berpirsê Îsraîlî re hevdîtinê bikim; lê derbarê hevdîtina min bi şahê Urdinê re gotin: “Karekî baş e, eger pêre bicivî.”

Min daxwaza lêbihurînê Ji Dr. Kameran Bedirxan kir û gotê:

“Li gorî fermaneke navxwe ya welêt; ez nikarim wê hevdîtinê bikim û erka min tenê pêşxistina têkiliyên bi Ebdul Nasir û tevgerên erebî re ye.”

Li Hotêla **Crillon** a Parsê, bi hevrêtiya Teha Mihêdîn Meirûf me serdana şahê Urdinê Şah Hisên kir; min daxwaza alîkariyê kir; bersiva wî ev bû: **"Şiyana Urdinê sînordar e û em nikarin alîkariya we bikin."**

Lê got: **"Ez dikarim li ser wê mijarê bi şahê Îranê re biaxivim, da ku ew alîkariya we bike."**

❖ Yanî têkiliyên we bi Îranê re bi wî awayî dest pê kir?

Nexêr, berî wê yekê jî hebû, lê wê soza Şah Hisên, ew têkilî xurtir kirin.

❖ Şahê Îranê çawa alîkariya we dikir?

Bi hemî awayekî, ji wan alîkariya leşkerî bi taybet piştî êrişa artêşa Iraqê û anîna **Hêza Yermûk a Sûriyeyê** da ku şerê me bike.

Wê demê rewş xirab bû, min serdana Almanyayê kir û ji wê derê jî çûm Moskowê. Berê jî min nepenî serdan kiribû lê televîzyona Sovyetê hevpeyvîneke min weşand ku li Parîsê ew hevpeyvî hatibû kirin.

Ew hevpeyvîna min bi pêşniyara Komara Moxolistanê ji bo gotûbêjkirina pirsa kurd li Neteweyên Yekbûyî re hevdem bû[66]. Komara Çêkoslovakyayê jî bi heman awayî pirsa Kurd li Cenêvê anî arê lê nehat pejirandin.

Di wê serdemê de, Sovyetê bi coş pişta Kurdan digirt, peyamek da Sûriyeyê, Tirkiyeyê û Îranê û ji wan xwest dest li Karûbarên navxwe

……

[66] Di **3'ê Tîrmeha 1968'an** de **Komara Gel a Moxolistanê** bi piştevaniya Sovyetê bi fermî li baregeha Neteweyên Yekbûyî **xwset pirsa Kurd û kavilkirina Başûrê Kurdistanê û jenosîdkirina Kurdan bixe nav mijarên nû yên civînan.**

yê Iraqê wernedin û dev ji kuştina Kurdan berdin. **Sovyetê li ser wê qirkirina Kurdan helahelayek mezin çê kir. bi gotinek din, ya ku niha Amerîkî dikin, wê demê Yekîtiya Sovyetê gelek bi berfirehî dikir.**

❖ Prîmakov Wezîrê Derve yê niha yê Rûsyayê hevalê Mela Mistefa bû, wê demê çi roleke wî hebû?

Belê, hevalê Mela Mistefa, Kurd û Min jî bû. Li Adara 1970'yan, di navbera me û hikûmeta Iraqê de navbeynkarî dikir.

Sovyetiyan soza alîkariya leşkerî û darayî dane me, her wisa xwestin têkiliyên me bi Îran re hebin, bi taybet em têkiliyên xwe bi Cemal Ebdul Nasir re xurtir bikin, **lê xwestin em nêzîkî Îsraîlê nekevin.**

Sovyetiyan ez şandim Çêkoslovakyayê û wan jî soza alîkariya leşkerî dan, her wisa berpirsên Almanya Rojhilat jî amadebûna xwe ji bo alîkariyê nîşan dan; bi gotinek din tevahiya welatên pergala sosyalîst amade bûn alîkariya me bikin.

Wê demê Kongreya Heştan a Komeleya Xwendekarên Kurd li Ewropayê li bajarê Munîha (Munich) Almanyayê birêve diçû, ez bi merema beşdarkirinê vegeriyan ku Mihemed Mehdî Cewahîrî helbestvanê mezin te de beşdar bû.

Pêwsît bû biçim New Yorkê ji bo gengeşekirina pêşniyara Moxolistanê; lê ew ger serketî nebû; çimkî Moxolistan poşman bû û pêşniyara xwe vekişand.

Li Îranê min Şemsedîn Muftî dît ku hevalê min yê koleja yasayê bû; ji rêya wî ve min hinek rastî derbarê Kurdên Îran bi dest xistin.

Wî got: “Şandeyek partiya we ango PDK’ê serdana Îranê kirbû, tevî sozdayîna aliyê Îranî, lê tu tiştek bi dest nexistin.”

Vegeriyam Kurdistanê, rewş gelek dijwar û xirab bû, hikûmetê ji bo li hember derketina me, eşîrên Kurd û Ereb çekdar kiribûn.

Ya cihê heyrmayînê ev bû, tevî ku Salih Mehdî Emaş wezîrê berevaniyê ji Konseya Serokatiya Şoreşê re gotibû: **“Nabe şer li Kurdistanê serî hilde û em nikarin bi rêya leşkerî wê pirsê çareser bikin,”** lê dema biryara piraniyê hat dayîn, birgeha bi navê gerek ji bo bakurê Iraqê (Operasyona Bakur) hat bikaranîn.

Di 18’ê Mijdara 1963’yan de, tevgera Nasirî, Beasî ji desthilatê dûr xistin û kabineya nû bi serokatiya Tahir Yehya hat avakirin.

Pêştir li Qahireyê û her di wê salê de, min Tahîr dîtinbû, wî hetta alîkariya darayî jî pêşkêşî min kir, lê min red kir.

Piştre got: **“Tu diçî Qahireyê û Ebdul Nasir dibînî, rucayê dikim vî hevokê li ber bike û bêje serok, em li ser soza xwe mane û karê me berdewam dike, bi îzna Xwedê serketî dibin.”**

Dibû ku ew hevok kodeka nihênî ya navbera wan ba; min jî wek xwe gihand Ebdul Nasir.

❖ Ew yek li ser rola Misrê belge tê hesabkirin?

Tahîr Yehya endamê buroya leşkerî ya Partiya Beis bû lê hevkariya Nasiriyan dikir, piştî gurtinên Ebdul Selam Arif bû serokwezîr. Ehmed Hesen Bekir jî wek cîgir hat danîn lê wî qebûl nekir.

Paş darbeya 18’ê Mijadar 1963’yan aliyê desthilatê di nameyekê de ji min daxwaza rawestandina şer û vegera ji bo maseya danûstandinê kir. Di bersivê de min got:

“Em bi danûstandinê re ne û şer naxwazin û siyaseta partiya me li-hevhatin e, ji bo danûstandinê şandeyeke 10 kesiya me li Bexdayê ye.”

Danûstandinê dest pê kir û cara dawî Barzanî razî bû ku berdewam bibe li ser danûstandinan.

Sala 1964’an nakokiyên nav tevgera Kurd bi temamî teqiyan. Mi-jarên nakok gelek bû, ji wan:

1. **Gelo danûstandinê bi hikûmeta nû re bikin yan na?**
2. **Eger em razî bin, daxwaziyên me çi ne?**

Lê careke din em vegeriyan ser maseya danûstandinê. Şandeyek nû ya hikûmeta Iraqê hat Ranyeyê.

Şandeya hikûmetê berevajî carên berê ku ji aliyê serokwezîr an ser-okkomar bi xwe ve dihat serokatîkirin, vê carê di astek nizm û ji aliyê Parêzgarê Silêmaniyê, Serheng Ebdul Rezaq ve dihat serokatîkirin.

Şandeya me jî pêk hatibû ji Şêx Ehmed birayê mezin ê Barzanî, Me-la Mistefa, Nûrî Şaweys û min.

Şandeya hikûmetê **Quranek û Naveroka daxuyaniyeke îmzekirî**, bi xwe re anîbûn.

Me rexne ji xala daxuyaniyê ya bi navê (**Vedigerin ser karên azad û baş**) girt û qebûl nekir.

Her wisa di daxuyaniyê de **tu bal nehatibû kişandin ser maf û navê gelê Kurd**. Nûrî Şaweys wek endamê polîtburoyê yek ji neraziyan bû.

Daxuyanî, pêşkêşî polîtburoyê hat kitin lê razîbûna Sovyetê jî hatibû wergirtin, ji ber ku Nîkîta Xruşçev (serokê wê demê yê Sovyetê) peyameke pîrozbahiyê ji Ebdul Selam Arif re şandibû.

Polîtburoyê nerazîbûn li hember daxuyaniyê nîşanda, lê ya ku zêdetir nakokî kûr kirin, **daxuyanî û piştgiriya Mela Mistefa ji projeya tekane partî û helandina tevahiya partiyan di nav yekîtiya sosyalîstî de bû.**

Cara dawiyê, di daxuyaniyeke din de Mela Mistefa ji Ebdul Selam Arif re gotibû:

“Ez zilamekî misilman û Xwedênas im, ji bo pirsa gelê Kurd hatime erkdarkirin, Ebdul Sdelam jî dikare wan mafan garantî bike.”

Bi van cure daxuyaniyan nakokiyên navbera polîtburoyê û Mela Mistefa zêdetir kûr bûn. Paş hingê hikûmetê û Barzanî li ser hinek tiştên sade li hev kirin wek:

1. **Vegera karmendan, efseran, polîsan û pêşmergeyan li ser kar û şûna xwe.**
2. **vegera saziyên hikûmetê ji bo navçeyên bin desthilata me û damezrandina karmendên Kurd.**
   Lê tu daxwazên neteweyî û sereke di lihevkirinê de nebûn.

Polîtburoyê daxuyaniyeke bi navê “***Lihevkirina Barzanî; Lihevhatin an teslîmbûn*?”** weşand.

Ya rast di nivîsîna daxuyaniyê de ez beşdar nebûm; tevî ku dijî daxuyaniyê jî nebûm; her wisa digel daxuyaniyên Barzanî jî nebûm, ango **helwesteke min ya cihê hebû**.

Piştî têkçûna têkiliyên navbera wan; her yek ji baskê Barzanî û baskê Polîtburoyê ji bo komkirina alîgiran hewl didan.

Mela Mistefa hejmareke eşîr û efser li dora xwe kom kirin û biryara guhertina tevahiya fermandarên leşkerî da; ez jî wek fermandarê leşkerî diyar kirim lê min qebûl nekir, çimkî dijî kesên siyasî bû.

Piştî derxistina kesên siyasî, Mela Mistefa ji bo yekîneyên pêşmerge farmandarên nû destnîşan kirin.

Polîtburoyê jî li gundê Mawet nêzîkî Silêmaniyê kongreyek li dar xist û biryara jê standina desthlatên partiyê (PDK) ji Mela Mistefa da[67].

Ez di kongreyê de beşdar nebûm; hevdem min hewl jî da bi Mela Mistefa re biaxivim **da ku ji gotinên xwe poşman bibe û dawiyê bi şoreşê neyîne; berevajî rijd be li ser daxwaza mafê xweseriyê.**

Ji ber ku ez di vê baweriyê de bûm partî nabe dijî gel be, ber-jewendiya gel li ser partiyê re ye. Şaş e eger jiyana xelkê bikin qurbanî; divê em li bendê bin da ku tecrubeya Yekîtiya Sosyalîstî berhemê bide.

Heta Hezîrana 1964'an min di navbera aliyên partiyê de navcitî dikir da ku partî parçe nebe, lê di dawiyê de ji ber biryara piraniyê, ez jî tevlî baskê polîtburoyê bûm.

Ji koma 17 endamên komîteya navendî 15 endam dijî hilweşandina partiyê û dev berana ji mafê gelê Kurd bûn û Ebdul Selam Arif wek zilamekî berjewendîxwaz bi nav dikirin.

……

[67] Konferansa Mawetê ji 4 -9'ê Nîsana 1964'an li bajarokê Mawetê nêzîkî Silêmamiyê, ku wê demê gund bû hat lidarxistin.

Di hember de, Mela Mistefa di Tîrmeha 1964'an de daxwaza lidarlistina kongreyê û biryara derxitina tevahiya endamên komîteya navendî da[68].

Piştre komîteyeke navendî ya din pêk anî. Haşim Akreyî ku endamê komîteya kevin bû, dubare di ya nû de jî hat danîn. Ew jî sala 1973'yan cihê bû û têkilî bi hikûmeta Iraqê re danî.

Piraniya hêzên çekdar, eşîr û kadro û rêxistinên partiyê hatine aliyê baskê piraniyê ango baskê Polîtburoyê.

Wê demê Mela Mistefa nameyek bi destnivîsa xwe ji min re şand û bi ayeteke Quranê dest pê kiribû ku bi kurdî bi vî awayî ye: **"Kurê min gel me be û neçe li bal kafiran".**

Min bi rêz û hurmet bersiv wî da û got:

"Ez kesekî siyasî me û nikarim li hember binpêkirina prensîbên partîtiyê bêdeng bibim; gelekî daxwaza lêbihurînê dikim li ser wê cihêbûnê, paş salên dûr û dirê yên xebata di bin serkirdatiya cenabê te de. Çimkî nakokî zêdetir li ser prensîb û bihayên partîtiyê bûn ku nabe bên ji bîr kirin."

Paş hingê Barzanî bi hevkariya eşîran êrişî ser baskê polîtburoyê kir; ew jî neçar bûn vekişn axa Îranê[69]. Ez yek ji wan kesan bûm ku **min nedixwest baskê polîtburoyê ber bi Îranê ve biçe û min pêşniyara çûyîna bi navçeya Barzan û cem li ba Şêx Ehmed kir.**

……

[68] Kongre ji **1-7'ê Tîrmeha 1964'an** li Qeladizê hat lidarxistin ku tê de **639 endam** beşdar bûn.

[69] Di **17'ê Tîrmeha 1964'an** de di navbear Partiya Demokrat a Kurdstanê ango baskê Barzanî û baskê polîtburoyê de **şer dest pê kir.** Di encamê de **baskê polîtburoyê neçar bû derbasê nav axa Îranê bibe.**

Wê demê ango sala 1964’an, di navbera îstixbarata Îranê û Barzanî de hevkariyê dest pê kiribû; ji ber ku hikûmeta Iraqê alîgirê Cemal Ebdul Nasir bû. Di bin bandora vê rewşê de, du partî hebûn. Van her du baskan hev du tawanbar dikirin bi xiyanetkirinê.

Sala 1965’an, şer navbera Barzanî û hikûmeta Iraqê de dest pê kir; lewma **me bi rêya şandeyekê ji Barzanî xwest an me wek partiya duyem a şoreşê di bin serkirdatiya xwe de qebûl bike yan jî pirsgirêkên partiyê çareser bike; ew jî razî bû.**

Ew nûçe li ser daxwaza me, di wê radyoyê de hat weşandin ya ku Sovyetiyan ji bo şoreşa Kurd damezrandibûn.

❖ Hûn wek partiyekê vegeriyan?

Nexêr, wek pêşmerge û gotbêjkirina rêxistina partiyê, lê (Mela Mistefa) qebûl nekir û hinek berpirsên leşkerî danî û ji endamên polîtburoyê jî xwest di nav konekê de li navçeya “Dole Reqe” bin ku **Ebas Mamend Axa** serokê wan bû[70].

Çar meh derbas bûn, ew pirsgirêk her nehat çareserkirin û heta sala 1966’an rewş her bi wî awayî bû. Wê demê hevalekî me bi navê Elî Hemdî di girtîgeha wan de, hat bidarvekirin. Wê yekê jî tirs di nav me de çê kir.

……

[70] Di pirtûka Dîdarî Temen de, **Mam Celal** dibêje, şandeya baskê polîtburoyê pêkhatî ji Elî Eskerî, Omer Debabe û Hîlmî Elî Şerîf di Tîrmeha 1965’an de bi **Mistefa Barzanî** re civiyan û li ser sê xalan li hev kirin:

1. **Dema vegera endamên polîtburoyê kes ji wan neyên kuştin û girtin.**
2. **Piştî sê mehan, bi xwe biryarê bidin ku digel Barzanî dimînin an partiyeke nû ava dikin.**
3. **Pêşmergeyên vegeriyayî bi ser hêzan de bên parvekirin û li gorî şiyanê erk bi wan bê sipartin.**

Hevdem Mela Mistefa hejmarek çekdar şandibû da ku me veguhezin cihekî din; **lê Barzaniyekî gotibû Şehîd Elî Eskerî, Barzanî bi hinceta reviyanê di rê de we jinav dibe.**

Ji ber wê yekê me civînek li dar xist ku ez, Elî Eskerî, Hîlmî Elî Şerîf, Umer Mistefa, Nûrî Şaweys, Nûrî Ehmed Teha û Elî Ebdullah tê de beşdar bûn; me peyamek ji Mela Mistefa re şand da ku em hev bibînin, lê wî qebûl nekir û rijd bû li ser veguhestinê. Bi gotina Ebas Mamend Axa, Mela Mistefa bi taybet rijd bûye li ser veguhestina min û Hîlmî Elî Şerîf.

Her Ebas Mamend Axa nameyek jê re şand, xwest me di bin parêzvaniya wî de bihêle, lê dîsa Mela Misefa qebûl nekir, lewma em reviyan bajêr, ji bilî Elî Ebdullah û Nûrî Şaweys ku bi xwe xwestin bimînin.

Bi merema ragihandina agirbestê danûstandinê di navbera Barzanî û hikûmetî de, dest pê kiribû, dema ku ji me xwestin, beşdar bibin, me got: **“Divê em bi Cemal Ebdul Nasir re bişêwirin.”**

Ji bo wê yekê me Adara 1966’an Hîlmî Elî Şerîf şand Qahireyê. Ebdul Nasir di bersivê da, daxwaz kiribû ji ber van sê sedeman em tevlî danûstandinê bibin.

1. **Şer xirab e.**
2. **Bijartiya siyasî çareseriya herî baş e.**
3. **Têkilî bi Îranê re karekî xeter e.**

Cemal Ebdul Nasir gotibû: **“Şerkirin dibe sedema xurtbûna têkiliya bi Îranê re lê aşitî ne tenê wê têkiliyê nahêle, belkî dibe sedema xurtbûna pergala desthilatdariyê li Iraqê.”**

Ji bo dîtina hinek ji kestiyên nav tevgera sosyalîstî, ez çûme Bexdayê û min behsa rewşa me ji wan re kir; wan jî ya baş ev zanîn, em **li-hevkirina 19'ê Hezîrana 1966'an qebûl bikin**; ku di navbera Ebdul Rehman Bezaz û Barzanî de hatibû îmzekirin.

Baskê me piştgiriya rêkeftinê kir. Paş hingê Ebdul Rehman Bezaz hat neçar kirin da ku dest ji kar bikşîne û hikûmet ji aliyê Nacî Talîb ve hat pêkanîn.

Nacî Talîb efserekî rizgarîxwaz û gencekî nasirî bû; her wisa endame miclisa serokatiya navbera Misr û Iraqê bû.

Di wê kabîneyê de Receb Ebdul Mecîd hevalê me, wek cîgirê serokwezîr û wezîrê navxwe beşdar bû. Me bi coş pişta wê hikûmetê girt, bi vê baweriyê ku neteweyî û dijî dagirkeran e û ji aliyê efserên rizgarîxwaz ve tê serokatîkirin.

Wisa bizanim li vir, me du şaşiyên mezin kirin:

1. **Me pişta hikûmetê girt, lê dev ji xebata çekdarî ji bo Barzanî berda.**
2. **Bala me tenê li ser karê siyasî bû; di hember de Barzanî dest bi wergirtina alîkariya Îranê kir, di destê me de jî tenê hikûmeta Iraqê ma.**

Dawî ya Pirtûka

Vekirina Çend Rûpelên Dîrokê

Celal Talebanî di qonaxên jiyana xwe de gelek caran bi rojnamevanan re peyîviye û gelekî eşkere û vekirî ber-sivên wan daye. Yek ji wan hevpeyvîna Talebanî bi ro-jnamevanê Lubnanî Xesan Şirbil re ye ku di sala 1998'an de li Silêmaniyê hatiye kirin.

Naveroka hevpeyvînê ji çar beşan pêk tê ku di hejmara 355'an a 16'ê Mijdarê, 356'an a 23'ê Mijdarê, 357'an a 30'ê Mijdarê û 358'an a 7'ê Kanûna 1998'an di kovara "el-Weset"ê de hatiye weşandin.

Her çend di naveroka hevpeyvînê de li dû hev behsa bûyerên dîrokî nehatibe kirin jî, lê dîsa ew xwedî girîngiyeke dîrokî ya mezin in. Li gorî agahiyên ku di destê me de ne, heta sala 1998'an ku hevpeyvîn hatiye kirin, Celal Talebanî wekî vê hevpeyvînê li ser bûyerên dîrokî û eşkerekirina nepeniyan neaxiviye.

Prof. Dr. Ehmed Hemedemîn